

12 UKFF PRESENTS

GLOBAL  
KURDISH  
FILM  
FESTIVAL

16 - 27 APRIL 2021

ONLINE EDITION

MY KURDISTAN

بەنار  
فەلم  
كوردی

Festîvala  
Fîlmên Kurdî

 e-Kovara Hunerî ya Sînemayê  
**Temaşê**



Dosyaya Temaşeyê ya li ser

**Festîvala Fîlmên Kurdî**


دۆسیه‌ی گوۆقاری ته ماشه له بواری فستیقایلی جیهانی فیلمی کوردی

**ya Global**

SPONSORED BY



IN PARTNERSHIP WITH



# DOSYAYA TEMAŞEYÊ YA LI SER FESTÎVALA FÎLMÊN KURDÎ YA GLOBAL

## Edîtorên Temaşeyê

Mahmud Beyto • Cihan Ulus  
Amedhesen • Ridwan Xelîl

## Edîtor

Fatoş Stêrk • Armanç Dayan

## Rûpelsazî

Ridwan Xelîl

## Serrastkirin

Amedhesen

## Berg

Armanç Dayan

Nivîskar ji nivîsa xwe, xwendekar ji xwendina xwe berpirse!  
Dibe ku li ser nivîsan sererastkirin hatibin kirin.  
Nivîs li gor Komxebata Kurmanciyê ya Weqfa Mezopotamyayê hatine kontrolkirin.

## FESTÎVALA FÎLMÊN KURDÎ YA GLOBAL

16-27 NÎSAN 2021

K

SPONSORED BY



IN PARTNERSHIP WITH



12 LIKFF PRESENTS  
**GLOBAL  
KURDISH  
FILM  
FESTIVAL**  
16 - 27 APRIL 2021

ONLINE EDITION



MIY KURDISTAN



## Ji Editoryayê

Silav xwînerên ezîz,

Ji bo mirov ya xwe bibêje rêya herî maqul û bi hêz bêguman huner e. Hinek caran mirov hezar gotinan dike ji bo derbibire lê çênabe, wê çaxê xwe davêjî bextê hunerê ji bo ya dilê xwe bi alikariya wê bibêjî. Bo mînak carinan bi firçeya xwe, carinan bi çêkirina peykerekê û hwd. Hunera heftemîn sînema, dinyayeye efsûnî ye û di nava xwe da hemû rengan dihevine û bûye rêyeye gelekî xurt bo derbirîna wan rengên di wê dinyayê da hene. Herweha sînema, rêyên qet heya kesî jê tune peyda dike û berê me dide wan rêyan. Rêyên me û rêyên çandên din di festîvalên filman da rastî hevdu tên. Ev festîval mîna pirekê ne û me digihîne hevdu.

Dîroka sînemayê bi van festîvalan ra hê jî berdewam dike. Festîvala yekemîn di sala 1932an de li Îtalyayê li bajarê Venedîkê hatiye li dar xistin. Fîlmên ku wê dexma xwe li tarîxa sînemayê bixin jî di festîvalên wilo da diyar dibin. Her wiha festîvalên ji van çand û kulturên ji hev cuda re qadekê divekin û ji wan re ev qad dibe bazar. Ev festîval her wiha xwedî vîzyonekî ye jî. Vîzyona van festîvalan ev e: dixwazin di nava vê bazarê da di quncikekê da ji xwe ra dezgeyekê deyin. Ji bo xelkên ku dixwazin tiştên çandî biafirînin (em jî tê da) derfeteke baş e bêguman. Her çend me di warê vegotinê da ji xwe ra tarzek çênêkiribe jî ji bo sînemayê dibêjin- em ji hêza çîrokên xwe yê neteweyî bawer dikin, weha em ji xwe ra kulturekî ava dikin. Lewma Festîvala Fîlmên Kurdî ya Global rê dide du alternetîfan; yek rê dide ku em ya civakê vebêjin û ji wan qut nebin, ya duyan jî dixwazî bira

navê wê li dîroka cîhanê derbas bibe yan jî nebe ferq nake, bo hilberîneke kulturî dibe pir û me derbasî aliyê din yê deryayê/yan dike.

Wekî festîvalên din festîvala ku LKFFê koordine kirî jî bi awayekî online hat lidarxistin û fîlm online hatin nîşandan. Helbet ev ji ber nexweşîya Covid-19ê bû. Em hêvî dikin hûn hemû sax û silamet bin ji ber ku nexweşîya koronavirusê, jîyana me tevan serobino kir û rê li ber gelek tiştan girt ku sînema jî mîna hemû şaxên din yê hunerê, ket nava heman rewşê.

Ev dosya li ser Festîvala Fîlmên Kurdî ya Global hat amadekirin. Girîngiyeye mezin ya vê festîvalê heye: Hem asta festîvalên kurdî bilind kir hem jî bû nimûneyeke baş bo festîvalên paşerojê ku wê werin pêşkeşki-

rin. Kedkarên festîvalê bi deh hevkarên xwe ve li panzdeh bajarên xebitîn û kedeke bêhempa dan da ku karekî rêk û pêk û profesyonel pêk bînin. Ji ber ku fîlm online hatine nîşandan, her kesek li ku derê cîhanê dibe bila bibe dikaribû fîlm teşe bikira. Vê festîvalê rêyên cuda li ber kurdan vekir û dijîtalîzasyon hate astek bilind. Her weha ev festîval bû sedema sosyalîzasyonê di navbera derhêner, çêker û lîstikvanan da. Rêveberiya festîvalê pirsên xwe ji sînemageran re pirsî û ew jî bersivandin her wiha di dawîya vê festîvalê da xelatên cûrbicûr bo qadên ji hev cihê hatin dayîn. Ji xeynî van teşevanan rexneyên xwe kirin û gelek sînamahezan bi bernameyên li ser medyaya civakî dihatine çêkirin jî şîroveyan xwe kirin.

Koordinatorê festîvalê Ferhan Stêrkî di roportaja xwe ya li gel me kiribû da çend îstatîstîk bi me ra parve kir. Nêzîkê sed hezar kesî festîval şopandîye û van kesan yekî/ê herî kêrî fîlmek teşe kirîye. Ji van şopîneran sêzdeh hezar kesê wê bûne endamê platforma festîvalê. Temenê şopîneran di navbera 20î û 45î da bûye û van fîlmên ku hatine nîşandan li welatên ji derveyî Kurdistanê hatine teşe kirin. Di festîvalê da 50 fîlmên klasîk û 70 jî yên nû wekî fiction û documentary hebûn û platform 12 rojan vekirî ma.

Me wek edîtorên vê dosyayê li gel 132 kesan têkilî danî lê gelekî wan; akademîsyen, xwendekarên sînemayê, ronakbîr û nivîskar bûn, yan festîval qet ne şopandibûn yan jî li ser festîvalê fikrek wan tune bû, ji ber wê bersivên neyînî dane me.

Me li gel 5 sînemageran hevpeyvîn çêkir. Ev kes; lîstikvan, derhêner, çêker, pevbestîner û koordinatorê festîvalê bûn. Heft nivîskarên sînemayê li ser fîlman ku vê festîvalê de hatîye nîşandan, nivîs nivîsandin. 14 kesan ku ew ronakbîr, nivîskar, akademîsyen, rojnamevan, sînamahez û sînemager in nixrên xwe yên li ser vê festîvalê anîn zimên. Herweha pênc hevkar û yek jî ji lijneya vê festîvalê jî nêrînen xwe anîn zimên. Ji xeynî van me ji şeş kesan ra pirsên xwe şandin û wan jî pirsên me bersivandin.

Di pêvajoya amadekirina vê hejmarê da alikariya gelek kesan gêhişte me û van hevalan barê me li me sivik kirin. Ji ber wê em spasiya Bîlal Korkut, Serhed Serhedî, Bîlal Yildiz, Mekî Agdal, Yûsif Hêşetî, Rojîn Aslan Vesek û Tûbanûr Dumanli dikin. Mala wan ava be...

Hêvî dikim hûn tamedê ji xwendina wê bigirin, xêr û xweşî her para we be..

Edîtorên Dosyayê  
Fatoş Stêrk • Armanç Dayan





12 LKFF PRESENTS  
**GLOBAL  
 KURDISH  
 FILM  
 FESTIVAL**  
 16 - 27 APRIL 2021  
 ONLINE EDITION

## Naverok

**Ji Edîtoryayê ..... 03**  
 Fatoş Stêrk • Armanç Dayan

**Roportaj**  
 Ferhan Stêrk ..... 06  
 Rêber Doskî ..... 09  
 Şenay Orak ..... 12  
 Erhan Ors ..... 14  
 Kazim Oz ..... 17

**Nivîs**  
 Miradê Miradan ..... 21  
 Mistefa Dogan ..... 24  
 Omer Bextîyar ..... 26  
 Kûlîlk ..... 28  
 Wedat Ermîş ..... 30  
 Rojîn Aslan Vesek ..... 31  
 Bawer Marûfî ..... 33

**Nirxandin ..... 37**  
 Şener Ozmen • Shilan Saadi • Yilmaz Ozdîl  
 Hatîce Kamer • Selîm Temo • Zeynep Yaş  
 Murat Dildar • Aydin Rengîn • Keywan Fehîm  
 Jano Rosebiai • Zana Hema • Abdulsittar Ozmen  
 Halîme Îlter

**Pirs û Bersiv ..... 43**  
 Tofan Sunbul • Mewlûd Oguz • Berri Shemdin  
 Ekrem Yıldız • Înan Eroglu • Erdal Kaya

### Nêrînên Hevkar ên Festîvalê

Festîvala Fîlmên Kurdî ya Hamburgê  
*Yasîr Irmak* ..... 50  
 Festîvala Fîlman ya Mezopotamyayê  
*Taner Tan* ..... 50  
 Festîvala Fîlmên Kurdî ya Moskowê  
*Zînê Broyar* ..... 51  
 Festîvala Çand û Fîlmên Kurdî ya New Yorkê  
*Xeyal Qertel* ..... 51  
 Festîvala Fîlmên Nevneteweyî ya Slêmanî  
*Mîhraban Abdullah* ..... 51  
 Bilavkirina Fîlman ya Rêtaw  
*Zanyar Mihemmedînikû* ..... 52

### Fîlmên Festîvalê ..... 53

Fîlmên Klasîk ..... 54  
 Best of Directors  
 -Yilmaz Guney  
 -Kazim Oz  
 Fîlmên Din  
 Fîlmên Nû ..... 57  
 -Documentary  
 -Fiction  
 -Short-documentary  
 -Short-Fiction  
 Festîvala Fîlmên Kurdî ya Global  
 Bernameya Festîvalê ..... 59  
 Hevkarên Festîvalê ..... 60  
 Masterclassên Festîvalê ..... 65  
 Beşa Pirs û Bersivan ..... 66  
 Partenerî, Sponsorî û Spasdarî ..... 67





Ferhan Stêrk

“

zordarî, asîmîlasyon,  
koçberî mijarên fîlmên  
kurdî ne

...

## Festîvala Fîlmên Kurdî ya Londonê di bîst saliya xwe da festîvala xwe ya 12an pêşkêş kir. Di vê festîvala we da tema `Kurdistana Min` bû mebesta we ya ji vê temayê çi bû?

Dixwazim di serî da behsa fikra festîvala global ya online bikim. Ev fikir ji ber pandemiyê derket, ev du sal e, em li malê ne û hemû tiştek bi awayek online dimeşe. Di nav vê yekê da helbet festîvalên filman jî heye. Me jî xwest îsal festîvalek global çêbikin bi deh partnerên xwe ra. Herweha me xwest ev festîval ji bo her kesekê taybet bibe jî. Dirûşma îsal ya festîvalê “Kurdistana Min” e, em dixwazin bi vê yekê di navbera temaşevan û fîlmên tên nîşandan da peywendiyekê pêk bînin. Tevî hemû dram, krîzên siyasî, şer, koçberî, dersînorkirin, êş û zilmên li erdnîgariya Kurdistanê jî em dixwazin li gel Kurdistana ku em di xeyala xwe da zindî dikin, peywendiyekê pê ra pêk bînin. Em dixwazin bibin alîkar ku temaşevan bi sînemaya kurdî, fîlmên kurdî vê temasê bijîn. Peyama ku em dixwazin bidin, bi tamamî taybet e bi her kesî/ê, li her herêm û bajarekî temaşevan bi dîtina van filman dê temasê li gel Kurdistanê pêk bîne û ev dirûşm jî di vî warî da gelek girîng e.

“Kurdistana Min” di vî warî da ji bo me gelek girîng e, ji ber ku Festîvala Fîlmên Kurdî ya Londonê 20 salên xwe tijî kirin û 12emîn festîval pêk tê. Me jî bi çavê festîvaleke li Londonê, Kurdistan her tim yek dît û bi vî rengî me sînameyêke kurdî nimayîş kir.

Li gel rewşa civakî ya vê serdemê, psîkolojiya jiyane ya mirovan di vê qonaxê de, têkiliyê nêzîk ya dirûşm û temayên ku em berhem tînin heye, lewma ne temayeke ji rêzê ye. Li her dereke cîhanê kurd dikarin li gel vê yekê temasê pêk bînin

## We ligel deh hevkarên ev festîval pêk anî. Ev qas kes çima hatin cem hev, wateya vê festîvalê bo çand û hunera kurdî çi bû taybet bo sînemayê?

Em bi deh partnerên xwe ra bi armanceka sînemaya neteweyî hatin li gel hevdu. Wekî ku hûn jî dizanin, ev çend sal e em nîqaşa pênasekirina sînemaya kurdî dikin. Divê mirov çawa bi nav bike, sînemaya kurdî heye an na û hwd. Me ew ast derbas kir. Niha em dibejin sînemaya kurdî heye lê endustrîya me tune ye. Ji bo ku em endustîreyek ava bikin jî dive em sînemagerên ji her çar parçeyên Kurdistanê û diyasporeyê bînin cem hevdu. Me jî bangewazî li sazî û dezgeyên sînemagerên kurd kir û deh festîval bi erênî bersiva me da. Me dest bi civînên xwe kir û me festîval bi hevdu ra organîze kir. Mirov dikare hest û fikrên xwe bi wejeyê ra, bi muzîkê ra nîşan bide lê bi sînemayê ra hêj dikare baştir nîşan bide. Em wek sînemagerên kurd bi fîlmên xwe ra pir bi hesanî dikarin armancên xwe, nerîn û şeweyên xwe ravê bikin. Herweha sînema ji bo naskirina kurdan jî platformek gelek baş e yanî dema em dibejin kurd kî ne û li dinyayê da li ku ne em vê pirsê dikarin bi sînemaya xwe ra nîşan bidin. Bi festîvalekê mirov nikare bikevê bin barekî weha giran ji ber ku em qala sînemaya neteweyî dikin û li dinyayê da li cîh û welatên cuda da yên ku karên sînemaya kurdî dikin, em bi wan ra ketin tekîlye û ev festîval derket holê. Me bi hevdu ra kêmasî û nirxandinên xwe par ve kir, me nîqaşên dirêj kir û di dawiyê da me xebata xwe ya bi mehane derxist pêşberî temaşevanan.

**We fîlm kategorîze kiribûn; wek belgefîlm, kurtefîlm û fîlmên metrajdirêj û we li gor vê kategorîzekirinê xelat da. We xelatên xwe li gor çi da, şert û merc çi bûn?**

Bo krîterên xelatdayînê jî ez dikarim weha bibêjim. Me gelek beş veqetand ji bo xelatê. Di nav van beşan da anîmasyon, fiction, belgefîlm, kurtefîlm, metrajdirej hene. Wek kurd em ji alîyê xelatdayînê zêde neşarezane, çanda xelatê hêşta di nav me da baş ne rûneniştiye. Ez weha difikirim. Lê xelat meseleyek girîng e ji ber ku hem sînemageran motîve dike hem jî bala temaşevanan zêdetir dikşîne ser filman. Herî zêde jî bo ku fîlmên nû bê çekirin motîvasyonê gelek baş e. Ji ber we awayê me jî sîstema xwe ya xelatê gelek berfireh kir bi vê festîvalê re. Mînak xelata ya bi navê "Roja Zer" ji bo fîlma herî baş ya metrajdirêj em yekem car didin. Xelata herî baş ya actor û actress jî em yekem car didin. Dîsa di festîvala par da me xelata şanazîyê ya LKFFê dabû îsal jî me ew xelat da. Li gorî me divê temaşevan jî bi şiklekî daxîlî vê festîvalê bibe ji ber wê me xelata temaşevanan jî da. Lijneyên me ji bo her beşê bi krîterên cuda dinirxîne. Lê krîtera me ya serekê ev e; bi giştî dema fîlmekê dimêzenin, ew fîlm regekî sînemaya kurda ye an na? Mînak derhênerê bîyanî di derheqê kurdan da fîlmek gelek serkeftî çêkirîye lê şansê wî li gorî derhênerê kurd gelek kême. Divê hem fîlm hem jî derhêner sînemaya kurdî temsîl bike. Ji xeynî van tiştan peyama fîlm jî gelkî muhîm e. Herweha helbet li jîneyên me fîlmê li gorî sînematografîyê jî dinirxînin. Divê ev xelat hê zêdetir jî were dayîn. Li gorî min di her beşê da xelat hê zêdetir bibe ji derhênerê herî baş bigrin heya berhemhênerê herî baş divê xelatên wan jî bê dayîn. Dema fîlmek tê çekirin kedeke gelek mezin tê dayîn. Ji ber ve yekê divê heqê keda wan werê dayîn.

**Hûn jî wek her kesî neçar man û we her tişt kire online yanî we festîval online pêk anî. Ev avantajek bû bo temaşevanan her çend çanda çûna sînemayê di nav kurdan da rûneniştiye jî. Hûn çawa dinirxînin vê rewşê?**

Ev pirs gelek girîng e. Wekî ku hûn jî dizanin ev festîvala me ya online ya duyem e. Li gorî festîvala yekemîn me vê neqlê bi profesyonelîr û şarezatîr festîvala xwe lidarxist. Helbet festîvala online û ya fîzîkî jî hev cuda ne. Avantaj û dezavantaja festîvala online hene. Mînak dema festîval online be em nikarin teklîyêk înteraktîf di navbera temaşevanên xwe da çêbikin. Motîvasyonê fîzîkî û rûbirû pir cuda ye. Lê belê derfetên nîşandana fîlmên kurdî pir kême. Êdî li cîhanê festîvalên filman hem fîzîkî hem jî

bi awayek online tê çekirin. Gelek fîlmên kurdî qet nikarin derkevin li peşberî mirovan jî. Ji ber vê yekê festîvala online ji bo fîlmên kurdî avantajek gelek mezin e. Helbet em dixwazin ev festîval bidome. Di heman demê da her çiqas festîvalên online zêdetir bibe jî em naxwazin ya fîzîkî bi tevahî xelas bibe. Li cîhanê da platforma dijîtal roj bi roj pêş dikevê û ev festîvalên online jî ji bo me kurdan rêya dijîtal vedike. Di platforma dijîtal da fîlm çiqas were nîşandan ewqas xwe digîhîne temaşevanan.

Platformên dijîtal û festîvalên online ji bo sînemaya neteweyî jî gelek muhîm e. Her çar parçeyên kurdistanê fîlm tîn cem hevdu û hedî hedî ev platforma dijîtal dikarê bibe endustrîyêk jî. Hevî dikim bibe jî, ji ber ku gelekî pewîstîya me pê heye.

**Pirseke din girêdayê vê pirsê min. Heke hûn van fîlmên bidin ber hev hûn dikarin çi bibêjin bo van fîlmên ku her yek ji aliyekî (ji her aliyên Kurdîstanê) hatibû? Ferq û cudahiyan fîlmên van perçeyan ji hev çi bûn?**

Dema ez hemû filman dinêrim dibêjim Kurdistan ev e sînemaya kurdî ye. Ji Başûr, Rojava, Rojhilat û ji Bakur fîlmên cuda cuda hatin. Helbet di navbera wan da hin ferq û cudahî heye lê dema ji tabloyek mezin em lê dimêzênin ez dikarim bibêjim ku Kurdistan ev e. Zext, zordayî, asîmîlasyon, koçberî mijarên fîlmên kurdî ne. Lê li gorî her perçeyê Kurdistanê mijarek zêdetir tê bikaranîn. Mînak li Bakur derhêner zêde nikarin fîlmên polîtîk çêbikin heke çêbikin jî nikarin biweşînin ji ber ku ji alîyê dewletê ve gelek zext li ser wan heye.

Başûr jî alîyê vegotîna çîrokan û lîstîkvanîyê da gelek serkeftî ye. Dîsa rojhilatî di alîyê sînemayê da pir jêhatî ne ji xwe gelek xelat jî rojhilatîyan girt. Actorê herî baş, actresa herî baş, belgefîlma herî baş û kurtefîlma herî baş rojhilat girt. Dema em filman dinerîn di fîlmên Bakurîyan da car carna kurmancî carna jî zazakî tê axaftin û li dî fîlmên Başûr da jî dîsa bahdinî û soranî tê qisekirin. Em dibînin ku zaravayên kurdî bi hevdu ra tê bikaranîn û em carek din dewlemendîya zimanê kurdî dibînin.

**Di vê festîvalê da ji her dereke Kurdistanê fîlm hebûn. Mîsyona vê festîvalê çi bû di vir da, we ew çawa pêk anî?**

Di serî da dikarim bibêjim ku ji ber ku festîval online hat çekirin ji bo me hesantir bû. Ev festîvalêk global bû û divê ji her çar parçeyên Kurdistanê û diasporayê fîlm tê da heba û weha bû jî. Dikarim bibêjim sedî nod em di vî warî da serketin. Me xwe gihand derhêneran û hemû jî fîlmên xwe bi me ra

parve kirin. Taybet jî derhênerên fîlmên klasîk ew jî teqrîben dike 45 derhêner hemû jî carek fîlmên xwe ji bo me şandin. Her yek ji hev cuda bi dilxweşî tevgerîyan û me bo wan heqê telîfê jî neda. Dixwazim spasdarîya derhênerên ku tevî festîvalê bûn bikim, tevîbûna wan gelek girîng bû ji ber ku alîkarîya wan nêbûna me nedikarî vê festîvalê çêbikin. Li gorî min tevîbûna derhêneran û bi parvekirinên wan sînemaya neteweyî hat astekê bilind. Em jî ji wan gelek tişt fêr bûn pirsîgîrîyan wan, problemên sînemaya kurdî, zehmetîya çêkirina filman û hwd. Me ji wan guhdar kir û ew a jî me guhdar kirin û dawîyê da em ji hevdu gelek tişt fêr bûn. Festîval weha armanca xwe serî xist me yek bi yek xwe gihand filman û heya ji destên me hat me filman tevî bernamêyê kir, helbet me dikarî bû hin fîlmên din tevî festîvalê bikin lê me hin derhêner jî hebûn ku me nekarî peywendî bi wan ra deynin. Hin temaşevan dikarin bipirsin gelo çima fîlmê filan derhêner tunê bû ji ber ku me nekaribû xwe bighînin wêlî kesî. Çiqas ji destên me hat me hewl da peywendî bi derhêneran ra deynî û ji wan fîlm bigrin. Dawîya dawî bi min koma festîvalê di armanca xwe da serkeftî bû. Ev xebata sînemaya neteweyî ya kurdan bû û di vê warî da jî serket.

**Hûn dikarin îstatîstîkan bi me ra par ve bikin. Fîlm çi qas hatine temaşekirin? Li Kurdistanê çi qas bû li dîasporayê çi qas? Fîlmê ku zehf hat temaşê kirin kîjan bû? Kîjan cure bêhtir hat temaşekirin?**

Li Iranê ev platform hat qedexekirin ji ber vê yekê nikarim bibêjim sedî sed evqas kes temaşê kiriyê. Li wir bi awayek îllegal hat temaşekirin lê li rojhilata navîn û li dîasporayê sedî pencî hatîye terxankirin. Ji medyaya Rojhilat û ji peyamên xelkên wê derê em fêr dikin ku taybet li rojhilat da gelek kes bala xwe daye vê festîvalê. Teqrîben sed hezar kes temaşê kiriyê di nav wan da 13 hezar kes bûyê endamê platformê. Her kesek fîlmên cuda cuda temaşê kiriyê helbet di nav 12 rojan da kes nikare 120 heb fîlm temaşê bike lê taybet kesên ku eleqaya wan bi sînemayê ra heye gelek fîlm temaşê kirine. Fîlma Şêro Hindê ya bi navê “ Evîn di Rûyê Qirîkîrînê De” fîlma ku herî zêde hatîye temaşekirin û xelata LKFF ya taybet jî girt. Fîlma Kazim Oz ya bi navê “Zer” jî xelata temaşevanan girt. Fîlma Çayan Demirel ya bi navê “Bakur” jî xelata temaşevanan ya duyem girt. Îstatîstîkên temenê temaşevanan jî di navbera 20 û 45 da diguhere. Ev yek me keyfxweş kir ji ber ku em fêr dikin ku gelek ciwan em temaşê kirine. Ji bo sînemaya kurdî em ji nîfşên nû gelek bi hevî ne. Li diasporayê da taybet li Amerîkayê da gelek hatîye temaşê kirin. Lê di welatên cuda cuda da jî hatîye temaşê kirin. Japonya, Amerîkaya Latin, Çîn, Avustralya û hwd. Armanca me festîvalek global bû û weha jî bû. Em di 15 welatên cuda da teqrîbên pencî kes ji bo festîvalê xebitîn. Hejmarên temaşevanan bi me kême lê bele me hê nû destpê kir û di nav 12 rojan da ev hejmarên ku min da ne xerab in. Hevîya mezin e em ê karên xwe berferehtir bikin û ji bo festîvalên peşîya me em ê bixebitin.








Rêber Doskî

“

gava me dîmenên xwe dikişandin, em hemû digirîn bes me ew girîya xwe nekir nav dramaya filma xwe

...



**Mamoste di serî em te pîroz dikin ku te bi du fîlmên xwe yê bi navên Radio Kobanî û Sidik û Piling di vê festîvalê (LKFF) da cih girtiye ku ji bo hemû sînemahezên kurd giringîyeke vê festîvalê hebû. Tu vê festîvalê çawa dinirxînî?**

Spas. Rastî jî bo festîvaleke wiha mirov dikare bêje, daxwazî bo çand û hunera kurdî da ku pêş bikeve, kêfa mirov jê ra tê. Festîvala Fîlmên kurdî ya Londonê vê carê global bû ku hemû fîlmên Kurdistanê bi xwe ve girêda bûn. Li gor fikra min ev tişteke gelekî baş e. Festîvalê baş hene wek London, Duhok, Kobanî... Kîşk festîval hebe kêfa min jê ra tê. Bes daxwaza min wek derhêner, ew festîval wek çandekê li Kurdistanê bên çêkirin û bibin festîvalên Kurdistanî. Da ku Kurdistan xwe geş bike, pêş da bibe. Ev festîval çand û hunera xwe bi rêya fîlmê ve li Ewropayê da xuyakirin û ev jî tişteke baş e. Ez dibêjim divê êdî berê me li xelkê me yê Kurdistanê be. Yanî wek derhêner daxwazîya min ev e, em festîvalê xwe li Kurdistanê çêbikin. Festîvaleke Kurdistanî ku li Kurdistanê be û hemû fîlmên kurdî li wir bên nîşandayîn wê baş be. Da ku em bikarin xortên wek we ku dixwazin fêrî hin tiştan bibin, fêrî filmsazîyê bikin. Dîsa dubare dikim gelek kêfa min ji vê festîvalê hat û ez wan pîroz dikim. Korona hebû û li gel nebeşdarbûna fîzîkî gelek xweş bû.

**Gelek kesan belgefilma te ya bi navê Radîo Kobanî eciband û li ser medyaya civakî gelek caran hat parvekirin. Ji bo te giringîya vê çîrokê çi bû ku te kişand?**

Giringîya vê çîrokê rastî jî piştî 2014an DAÎŞê bi awayeke hovanî li ser bajarên Kurdistanê zextên xwe girtibûn. Ji Şengalê destpêkirin heta Kobanî hatin. Qetlîameke mezin li ser serê kurdan kirin. Wek derhênerê kurd mejîyê min, rihê min qebûl nekir ku rûniştîyî bimînim, ji xwe ra çîrokên evîni çêbikim. Min ji xwe ra pêwîst didît ku ev çîrok were daxuyakirin. Pêşîya wan salan min navê Kobanî jî nebihîstibû û min nedizanî ka xelkê Kobanî çawa diaxivin, çawa hereket dikin, edetên wan, çanda wan çi ne. Dema şerî da ez çûme Kobanî. Dema ez yekem car çûme wir, tiştê herî li ser min bandor kirî ew bû ku jinên kurd sîleh danîbûn ser mil û pêşberî wan hovan, şerek gelek bi kelecana dikirin. Min digot ku fîlmekê li ser Kobanî çêkim divê ne li ser şerê Kobanî be, divê ne fîlmekê propagandîf be, divê ne fîlmekê bi ajitasyon be an jî fîlmekê xemgînî be. Em kurd li Kobanî çîrokekê çêkin bivê nevwê em bi evîni bi vê çîrokê ve girêdayîne. Piştî ez pêşberî Dilovanê hatim û çîrok mejîyê min da avabû, min got, çi ji vê çêtir nîne ku bi rêya Dilovanê, çîroka wî bajarî, çîroka vî gelî vebêjim. Dilovan jî jêhatî ye ku di nav wî şerî de li gel mirovan roportaj dikir. Gotina Erdogan ya 'Ha dê Kobanî bikeve' ez hişyar kirim. Ev axaftina 'ha îro ha sibe dê bikeve' li ser biryara min ya fîlmçêkirinê bandor kir. Min got, dê îlleh biçim Kobanîyê, fîlmekê çêkim. Û hezjêkirina gelê me jî ji wê derê tê ku bi min dramaya vê fîlmê gelek baş hatîye montajkirin. Fîlm li ser hêviye ye. Li ser însanekê ye ku jîyana xwe qut nake. Dilovanê hezê dide mirovan. Kesên li gel Dilovan derdikevin pêşberî kamerayê jî dîsa eynî hezê didin. Ji ber vê tu kî derê bî, gava te berê xwe da vê fîlmê tu pê ve tê girêdayîn. Ji ber ku ew hez, hezeke mirovahîyê ye.

**Radîo Kobanî xwe ji ajîstasyonê xilas kirîye û di nav civakê de çî hebe ew anîye zimên. Gelek belgefilmên kurdî ne wek vê dimeşin û mijarê her dramatîze dikin. We çawa xwe ji vê kemînê dûr xist?**

Belê wekî min gotî ev der Kobanî be, Nagazakî be, Koln be, Hîroşîma be, Kolombîya be kî der be bila bibe şer bivê nevê bandorîyek mezin li ser serê însanan dike. Niha here Ermenîstanê, Karabagê xanîyeke xerab bigre, dengê vîyolînekê, kemanekê bixe nav wan dîmenan da dê xemgînîyeke mezin li ser serê te çêke. Ji ber ku tu dizanî di vê xanîyê ku hatiye xerabkirin da mirovekî jîyan kirîye. Amedê li Sûrê gava xanîyên me hatin xerabkirin em dizanin ku wan malan da jîyanekê berdewam bû heta wî şerî. Bes wek derhêner, filmsazker divê tu vê çarçovê baş tefkîr (texeyul) bikî. Tefkîrkirîya wê jî çî ye? Dîmenê te yê şerî da xelk penaber be ev bi serê xwe ajîstasyon e. Ku tiştêkî lê zêde bikî tu dixî nav propagandayê. Divê tu wan sînoran baş dîyar bikî. Dramaya herî baş çî ye? Ew e ku tu pê neleyîzî. Ez ji telebeyên xwe ra jî dibêjim, divê Kurd xwe ji sêhwanê TRTyê xilas bikin. Çîrok û belgefilmên ku TRTyê çêkirine divê em xwe ji wê sêhwanê xilas bikin. Em berê xwe bidin fîlmên cîhanî. Divê dramaya me kesê Kolombîyî jî xemgîn bike. Her wiha yê Rûsî jî. Ev tişt muhîm in di dramayê da. Derhênerên me ji çîroka xwe ve hinek xemgî ne, ez tê digehim. Ji ber ku kurd e. Bûyer diqewimin. Çîroka xwe ve girêdayîne. Wek derhêner divê tu vê xemgînîya xwe nekî nav fîlmê xwe. Gava me dîmenên xwe dikişandin, em hemû digirîn bes me ew girîya xwe nekir nav dramaya filma xwe. Heger ku wisa be fîlm dişibe fîlmê TRTê. Divê tu ji xwe ra vekirî bî, şûna temaşevan tiştan nekî.

**Te heta niha gelek fîlmên belgefilm kêşandine, te ji bo çî ew tarz hilbijartîye û tu difikirî bi cûreyeke dî jî filman bikêşî?**

Belê planên min hene. Niha li ser du fictionan em kar dikin. Yek li ser evînîya navbera du mirovan da ye. Çîrok li Kurdistanê ye. Ewil mirov li ser xwe filman çêdike. Ez kî me, kî derê hatîme, li ser wan tiştan çêdike. Bo min fîlm çî ye? Bîranînên min in. Hin însan hene pêşerojê tefkîr dikin ez bi paşerojê ve girêdayî me. Mînak Matrix çîrokeke pêşerojê ye, derhênerê wê, senarîstê wê fikrên xwe yên deh sal, sed sal paşê tefkîr kirîye. Ya min paşeroj e, bandorîya paşerojê heye li ser min. Zarokatiya min, kolanên zarokatiya min, dozbinî, hevaltî, hezkirinên ne binecîh, çiyayên Kurdistanê... Mînak Sidiq û Piling çîroka min bixwe ye. Bes min bi rêya karakterê M. Sidiq daye xuyakirin. Yanî ez sibe fictionan jî çêbikin

dê ne li wan belgefilmên dûr bin. Ha, ma ez nikarim cureyên din jî bikêşim, dikarim. Lê ez wek derhêner çî li min nêzîk e ez wê dikêşim. Ez berê xwe nadem popûlîzmê. Ez berê xwe didim xwe. Wekî ku min got planên min hene, butçe jî heye bes niha ber destê min belgefilmek heye ku li ser keçikên Êzdî yên destê DAÎŞê xilas bûne, hatine nav gelê xwe ne.

**Te di filma Sidiq û Pilingê da her çar demsalên salê jî nîşandane. Te bi vê yekê xwest tenê sirûştê Kurdistanê nîşan bidî yan armancekê te ya dî hebû?**

Karakterên sereke yên çîroka Sidiq û Pilingê çiyayên Kurdistanê ne. Ji ber ku bes dostên kurdan çiyayên kurdan e. Em penaber bin berê xwe bidin çiyayên xwe çiyayên me li me pirsan nakin û her car jî me diparêzin. Bi her awayî çiyayên Kurdistanê şahîdbûna tiştên hatine serê kurdan kirîye. Bi vê hişmendîyê ez derketim rê ku çiyayê Kurdistanê bikim karakterên sereke, fîlmekê bikêşim. Dema em berê xwe dideynê M. Sidiq bîst û pênc salan pilingan digerît. Daxwazîyeke gelek mezin heye. Tabî ji xeynî Sidiq tekiîfîyên karakterên din jî bi çiyayên Kurdistanê ra heye. Yanî fîlm ne li ser sirûştê Kurdistanê ye bes beşeke fîlmê ye. Me dixwast hemû rengan fîlmê da bidin xuyakirin. Zivistan, bihar, payîz, havîn, her yekî maneya xwe heye. Çîrok, çîroka çiyayên Kurdistanê ye. Belkî nikare biaxive, şahîdbûnîya xwe bîne ziman lê Sidiq dibe ezmanê wan çiyayan ku ka çî hatîye serê kurdan, dibêje. Gerîna bîst û pênc salan ya pilingan bo min hêvî ye. Heger mirov hêvîya xwe li ser însanan qut bike li ser heyvanekê girêde ev tişteke xemgîn e, bes hêvîyeke mezin e. Fîlmê da pîçek tê xuyakirin ku ev çîrok ya min e. Bapîrê min li çiyayên Kurdistanê şehît ketîye. Ji ber ku çîrok gelekî nêzîkê min bû ez pîçek xemgîn bûm û ez hêvîdarim ku em ê xweşiya xwe jî bi vê rêyê be bînin ziman. Û fîlmên xwe yên nû da em ê bajarê xwe yên xweşik û çîrokên xweştir bînin ziman.

**Piştî filma “Sidiq û Piling”ê çî pêngavek hat avêtin ji bo pilingên Kurdistanê yên mayî?**

Belê. Hana di nav fîlmê da keçeke ciwan, akademîsyen e. Kareke gelek mezin kir bo Kurdistanê. Projeyên wê yên gelek baş hene. Dê wê mintîqa Silêmanî da biparêzin. Têkiliyên wê li gel sazîyên Ewropî hene. Niha jî projeyên wan li Kurdistanê berdewam in. Piştî vê fîlmê hikûmeta Hollandayê bi rêya konsolosxaneyê li ser sirûştê disekin, li gel M. Sidiq têkiliyên xwe çêdikin. Heta niha heft piling hatine dîtin. Ew mintiqên ku piling lê hatîye dîtin tê parêzin. Em hemû hej sirûştê dikin û hikûme-

ta kurdan jî ev fîlm dît. Bawerim ew jî pêngavekê diavêjin bes bêhtîrî sazîyên Ewropî li Kurdistanê aktîf in. Çi pêwîst be dê wê bikin. Hikûmeta Hollandayê 10 milyon Ewro amade kirîye bo Kurdistanê. Ew fîlm bû sedema tişteke wiha.

**Endûstrîyek an jî sektorek sînemaya kurdî tune ye ku fîlmên alternatîf bên pêşkêşkirin. Her wiha zor û zehmetî jî li ber derhênerên kurd hene ku filman çêbikin. Gelo ji xeynî van kêmasîyan dê çawan belgefilmên bêajîte derkevin holê? Pêvajoya çêkirina filman çawa be dê fîlmên serkeftî çêbibin?**

Pirseke di cîyê xwe da ye. Rastî jî divê derhêner bizane maneya belgefilmê çi ye. Ez belgefilman çêdikim, dikarin li ser karê xwe biaxivim. Ji bo her belgefilmekê ez di navbeyna sê, çar salan kar dikim. Sala yekê heta du salîyê karê min bes lêkolîn e. Heger min karakterekî peyda kiribe ku kanî bibim ku çîroka wî çîroka min e, çîroka cîhanê ye, diçim lêkolîn dikim. Divê tu bizanî ka karakterê te çi dixwe-naxwe, çawa radizê, bêhna devê wî çawan e. Û merhela herî hêsan jî nivîsandin û dîmen kişandin e. Em dibêjin belgefilm yanî heqîqeta jîyanê.. Tarza min observation e ez bes berê xwe didemê. Ez tu car roportajê nakim. Ez wekî temaşevanekî rabûn û rûniştina karakterê temaşe dikim. Ev tişt muhîm in. Wekî min gotî em kurd bi evîni çîrokên xwe ve girêdayî ne, xemgîn in. Dema me yekem car Radio Kobanî da nîşandayîn xelkê me yên li Ewropayê dijîn xemgîn dibûn lê Ewropî jîyana Dîlovan (karakterê sereke yê fîlmê) dipirsin. Divê em xwe merhela xemgîniyê derbas bikin. Di şerê Kobanî da min temaşevan ji heqîqeta berçav parêst. Min ew kes şehîd kiriba nav fîlmê da dê filmekê dî derkeftiba. Ev hidûdek e, divê tu vê hidûde baş biparêzî. Heger tu baş neparêzî dibe ajitasyon. Tişteki lê zêde bikî dibe propaganda.

**Tu dikarî wek belgefilm çend favoriyên xwe ji me ra bibêjî an jî ji bo te filmografiya kêfî balkêş tê?**

Te behsa belgefilmên min kirin ku îlla ku civakê ve girêdayî ne. Bes xeteka wî ya sor heye. Ew jî sîyaset e. Li wê dûr e. Vêca favoriyên min jî nêzîkê çîrokên min in. Hubert Sauper – Darwins Nightmare (2004). Li Efrîkayê hatîye çêkirin, çîroka behrekî ye. Ewropî çawa wan însanan kolonîze dikin, li ser jîyana wan e. Vê fîlmê gelek bandorek mezin li ser min kirîye. Derhênerê fîlmê bixwe nas dikim. Gava min akademî dixwend carna dihat ders dida me. Karê wî rastî jî kareke pîroz e. Favoriya min ya dî jî li ser şerê cîhanê ye duyem e. Li ser kampên Nazîyan.

Claude Lanzmann – Shoah (1985). Xelkên di kampên da mayîn, yên ji destê Nazîyan xilas bûyî, yên Ewropayê dijîn û yên çûne Îsraîlê... Keçîkek Almanî diçe dev wan însanan, gel wan diaxive. Rastî jî di hin sehneyan da mirov bêdeng dimîne. Ya sêyê Werner e ku îsaneke mejîyê xwe da akademîk e. Werner Herzog – Lessons of Darkness (1992). Li ser şerê xelîce (Korfez) ye ku di navbera Îraq û Kuweytê da çêbû ye. Ya çaran Janus Metz Pedersen – Armadillo (2010). Eskerên Danîmarkayê diçin Afganîstanê. Ya pêncan Jiska Rickels – 4 Elements (2006). Yanî agir, ax, av û hewa. Belgefilmeke observation e. Ya şeşan Joshua Oppenheimer – The Act of Killing (2012). Û derhênerê min yê herî kevin jî Hollandî ye. Johan van der Keuken e. Documentarîst Rojên Belgefilman yên Stenbolê da li ser navê wî xelatek jî tete dayîn.

**Wek dawî tu dikarî çi bibêjî? Bangewazîyek te ji derhênerên Kurd ra heye mamoste?**

Derhêner kurd be an nebe, daxwazî û bangewazîya min ew e ku wek derhêner ku nebêjin bes ez her tişteki dizanim. Divê tu yên li pişt te tîn, wan ji xwe zanatir bibînî. Divê derhêner cevhera mirovan bibîne û vê bi bawerîyê ve bikar bîne. Derdora derhêner kî hebe, divê derhêner rê li ber wan veke. Da ku ew jî karibin kar bikin. Lê derhêner dibêjin bes ez, tu kes dî ne. Nexêr!

Duyem jî bangewazîya xwe li derhênerên kurd dikim. Her çîrok li gor xwe sazmendîya xwe heye û her kesek nikare çîrokekê bêje. Divê derhêner xwe fêrî çîrokbêjîyê bike. Ji ber ku formuleka çêkirina fîlmê heye. Li her derê cîhanê, di akademyan da ew formul tê bikaranîn. Em di senaryoyê da pênc qebzan pêk tînin. Daxwaziya min li derhênerên Kurd ew e ku vê formulê kar bînin. Fîlm li ser çi ye, karakterê fîlmê kî ye, pirsgirêkên wî/ê çi ne, pirsgirêk çawa çareser dibe û xilasbûna fîlmê.

Ez hêvîdarim ku sedan fîlm dê werin çêkirin, li Kurdistanê. Ji ber ku roj ne roja sîlahê ye. Rast e sîlah temînatek e, garantîyek e bes divê îro pêda em wek civak û millet berê xwe bidene rêyên nû. Televîzyon, medya, sînema... Em dikarin gelek hedefên mezin bi rêya sînemayê ve pêk bînin. Bila rojê deh fîlm bên çêkirin, salê sedan fîlm bên çêkirin. Bila pazdeh ji wan baş bin, li cîhanê bên belavkirin.



Şenay Orak

“

welatîyên biyanî bi rêya sînemayê tevî hestên me dibin

...

**Piştî filma Miraz Bezar ya bi navê ‘Min Dît’ de, te di Festîvala Fîlmên Stenbolê ya navteyê de wekî listîkvanê herî baş xelat girt. Tu dikarî hinekî behsa çîroka xwe ya li ser filma ‘Min Dît’ê bikî?**

Ez beriya fîlmê ‘Min Dît’ê li dibistanê ji bo lîstika Azîz Nesîn a “Pirtlantan Bal” hatim hilbijartin û di nav wê lîstikê de min cih girt. Piştî pêşandana wê lîstikê mamosteyê min ê hêja pêşniyariyek li min kir û ji min xwest ku ez tevî “Yerel Gündem 21”ê bibim. Wekî ku hûn jî dizanin ew sazî di wan deman de dersên drama, şano û mûzîkê didan û herwiha mamosteyên wan jî bi dildarî ew kar dikirin. Ez di wê sazîyê de tevî perwerdehîya şanoya zarokan bûm û min mamoste Mîraz Bezar jî li wê derê nas kir. Dema ku hilbijartina lîstikvanên “Min Dît”ê hat, min ji hevalên xwe re got:

–“Gulistanê ez dê bilîzim”.

Ew hevoka min bala mamoste Mîrazî kişand. Piştî demeke kurt kişandina fîlmê destpê kir. Pêvajoya kişandina fîlmê ji bo min gelek xweş derbas bû. Ez bi mirovên gelek hêja re li dora çîrokekê kom bûbûm. Piştî fîlmê min gelek peyamên hestîyar girtin û yên ku peyam dişandin bi gelemperî çîroka wan jî wek çîroka Gulistanê bû. Wan jî êş û elemên xwe di keseyeta Gulistanê de dîtibû û Gulistan ji wan re bûbû hêvî bo pêşerojê. Ji ber ku keseyeta Gulistanê bûbû şahîdê zordestîya dewletê ya salên 90î bi taybetî jî ya li ser zarokan.

**Piştî derketina fîlmê, gelek kesan behsa te kir û ji bo te digotin ew dê bibe aktrîseke gelek baş. Ji bilî vê fîlmê tu weke listîkvanekê xebitî an te berê xwe da beşeke din?**

Ez ji fakulteya perwerdehîyê mezûn bûm û di heman demê de jî xebatên min ên şanoyê jî berdewam dikirin. Ez tevî atolyeyên cûrbicûr bûm û min di gelek lîstikan de cih girt. Li welêt zarokên ku qet şano temaşe nekiribûn hebûn. Em bi koma xwe re axivîn, em fikirîn û me got heke ew nikaribin werin, em dê biçin cem zarokan û em bi rê ketin. Min di çavên zarokan de kêfxweşî û coşa wan dît ku ew yek ji bo min hesteke gelek giranbuha bû. Hêvî dikim ku zarokên me rojên xweş bibînin.

**Dema te filma “Min Dît” de dilîst tu 13 salî bûyî. Lê wekî ku te bi salane perwerdehîya listikvanîyê girtîye tevdişî. Meriv ji liv û tevgerên te, digot qey ev çîroka te bi xwe ye tu wisa dilîstî. Lehenga bi navê Gulistan, gelek zarokên kurd yên ku di nav atmosfereke wiha sîyasî de ne, temsîl dikir. Gelo te di jîyana xwe de jî atmosfereke wisa dît an jî Şenay û Gulistanê bûyerên hevpar dîtine ku listikvanîyêke wiha derketîye holê?**

Di kişandina fîlmê de ez 11-12 salî bûm. Ji ber temenê xwe ez di serdema çîroka “Min Dît”ê de nedijîyam, lê bavê min dijîya, dayîka min dijîya, cîranên min jî. Min gava ku filma girt destê xwe, pir baş tê bîra min. Min di carekê re xwend û ew çîrok ji min re qet xerîb nehatibû. Ez jî wekî her zarokên ku li welêt bi wan çîrokan mezin dibûn mezin bibûm. Çîrokên ku min guhdarî kirin di hişê min de cih digirt û wan ramanan xwe anîn asta zarokeke tund. Ew jî bûn sedama afirandina lehenga Gulistanê.

**Tu dikarî hinekî behsa zehmetî û hestên xwe yên listikvanîyê bikî? Di fîlmê de tu 13 salî yî. Çi zehmetîyên vî emrî hene, çiqas tesîr li te kir? Ji alîyê çêkirina fîlmê, ji alîyê kolanên Amedê, ji alîyê zarokbûnê?**

Çawa ku di her karî de heye di listîkvanîyê de jî zehmetî û xweşî hene. Lê heke tu karê xwe bi dildarî û bi hezkirinî bikî ew zehmetî ewqas nayên ber çav. Min di temeneke biçûk de ji xwe re karek peyda kir û jê hez kir. Piştî demekê min xwe di vî karî de pêşve bir. Ew jî bo min şanseki mezin bû û derfetên nû ji min re vekirin. Perwerdehî, prova û kişandina filmê bi hefteyan berde-wam dikirin, lê ez qet eciz nedibûm. Min bi çoseke me-zin û bi kêfxweşî karê xwe dikir. Di kişandina “Min Dît”ê de jî qet zor neda min ji ber ku ez ne xerîbê çîrokê bûm. Bajarê min li cem min bû ekîbeke gelek jêhatî û dildar li cem min bû. Ma ez hîn çî bixwazim!

**Wekî tu jî dizanî filma ku tu têda lîstikvan bûyî (Min Dît) di Festivala Filmên Kurdî ya Global de hat nîşandan. Te festîval şopand an jî te çiqas şopand?**

Min filmên pir bi bandor teşe kir. Dîtina pêşketina filmên Kurdî kelecانىyeke mezin da min.

**Festîval bi awayekî online hat pêşkêşkirin ku li her devereke cîhanê hat teşekirin û filmên klasîk ên kurdî jî hebûn tê de. Min Dît jî yek ji wan filmên klasîk bû. Platformeke wekî vê festîvalê ji bo arşîveke filmên kurdî bê amadekirin bi ya te dê çawa be?**

Çanda kurdî çandekê devkî ye û wisa jîyaye. Çîrok, mûzîk û dîroka me wisa heta vê rojê hatiye û dibe ku gelek ji wan jî di nav dîrokê de winda bûbin. Çandekê bi nivîskî, bikaranîna amûrên dîtbarî û arşîv kirin ji bo nîşên pêşeroja me dê pir baş bibe.

**Ji bilî Kurdîstanê festîvalên filmên kurdî li gelek bajarên cîhanê yê navdar tî lidarxistin. Bi saya wan festîvalan jî sînemaya kurdî hîn bêhtir der-dikeve pêş. Hûn bi giştî li festîvalên filmên kurdî çawa dinihêrin?**

Di festîvalan de pêşkêşkirina çîrok, jîyan û nîrxên me rewşeke gelek girîng e. Welatîyên biyanî bi rêya sînemayê tevî hestên me dibin. Ez jî di wê bawerîya hestên wan de me ku ev yeke me nêzî hev dike. Piştî “Min Dît”ê welatîyek ji Koreya Başûr ji min re peyame-ke hestdar şand. Ev yek jî mînakeke nêzîkbûna gelan e.

**Tu dikarî behsa karên xwe yê pêşerojê yê ku dîyar in bikî?**

Niha ez projeyên ku ji min re tî dinixînim. Min bala xwe da ye ser perwerdeya xwe. Hînbûn, pêşketin û avakirin ji bo min motîvasyoneke mezin e.

Hêvîdar im ku huner di welatê me de qet kême nebe. Bi rêzdarî û hezkirin.



Hamburg Film Festival  
YOUNG TALENT AWARD

Ghent Film Festival  
SPECIAL JURY AWARD

San Sebastian Film Festival  
GAZTEA YOUTH AWARD

AN AYAZ, FAHRİYE ÇELİK, ALIŞAN ÖNLÜ, BERIVAN EMİNOĞLU, ÇEKDAR KORKUSUZ  
SANAT YÖNETMENİ PINAR SOYDİNCİ, SES GARİP ÖZDEMİR, SES MIXAJ FLORIAN BECK  
İHA KUTLAY, FLAMÍNIO ZADRA, LINE PRODÜKTÖR CORAZÓN, CHRISTIAN SPRINGER  
AKIN ÖYKÜ, MİRAZ BEZAR, EVRİM ALATAŞ, SENARYO VE YÖNETMEN MİRAZ BEZAR

FFA  
Der Beauftragte der Bundesregierung  
für Kultur und Medien  
DOLBY  
DIGITAL  
THE MATCH FACTORY  
In-Studio Theatre



Erhan Ors

“

di qedandina pevbestîna da an jî di berdewamîya pevajooya wê da tekîldarbûna ew kesê ku deng û muzîkê dê çêke pêşwendî û avantajekê bi xwe ra tîne

...

**Ji bo çêkirina filman sê pêngav hene ku yek ji wan jî pevbestîna e. Pevbestîner vê pêngavê çawan diavêje ku çîrok xwe di nav atmosfera sînemayî bihewîne?**

Ez bawer im ku di her sê pêvajoyan da jî li ser têgeha demê neqebeyeke efsunî heye. Dema vegotina senaryoyê, dema di nav sehneyê da û dema di nav pevbestîna da xwe dide hîskirin. wexta ku çîrokê tê bihevvekirin û li wateyê digere, tiştê ku atmosfera sînamayê herî zêde dide hîskirin û mirov dikişîne nav vê lêgerînê jî quncifandin û bi şikleke veguherînê ya demê ye.

**Têkiliya pevbestîner û setê heye gelo? Pevbestîner bi tenê di setê da cih digire yan piştî filmê li dîmenan dinêre?**

Pevbestîna setê ya ku em qal dikin bi giştî pêvajoyeke pevbestîna ye ku mirov lê dinêre û dibêje bê ka tê da planeke kêma an jî çewt heye an na. An jî ji bo hin dîmenên taybet, em dikarin bibêjin dîmenên ku pevbestîner jî tê da cih digirin çêdibin. Lê dîsa jî heke pevbestîner ne di nav atmosfera setê da be, ji bo ku bikaribe piştî demekê bi çavekî bêalî li kêşanan binêre dê baştir bibe. Ez vê yekê jî wekî pêşwendî û avantaj dibînim.

**Dema tu dest bi montajê dikî senaryo jî li ber destê te ye lê carna dibe ku piştî montajê senaryo û film sedî sed li hev nakin. Tu qet bi tiştêkî weha re rûbirû mayî û ev yek dibe problem?**

Çawa ku di kêşanan da bi piranî em ji sedî sed nikarin girêdayî senaryoyê bimînin; çawa ku em vê yekê nakin, bi heman rengî di pêvajoya pevbestîna da jî em dixwazin hemû alternatîfên ku dikarin xwe bigihînin hestên filmê bifikirin û biceribînin.

Di nav filmên ku ez tê da xebitîme da, xebateke min a ku bi tevahî, ez xwe girêdayî senaryoyê bikim çênebû. Her wiha ez dikarim bibêjim ku karên ku ji senaryoyê pir cudatir û karên ku şeweya wan a dramatîk pir guherîna jî çêbûn. Ev ne pisgirêk e û heta em dikarin bibêjin ku hîseke rewîtîyê ye ku kelecanyê dide jî derdixê holê. Helbet di vê derê da çavdêriya derhêner jî di çî astê da ye ew jî girîng e.

**Têkiliya pevbestîner li gel derhêner çawa ye û çawa dixebitin?**

Pêvajoya pevbestîna ji bo derketina filmê rawestgeha dawî ye. Di vê rewîtîyê da derhêner heta vê derê ji gelek rê û pêvajoyan derbas bûye û ew li pişt xwe hiştine. Di rewîtîya filmê da dibe ku qada xebatê ya herî zelal û vekirî û di heman demê da ya herî veşartî jî di navbera derhêner û pevbestîner da pêk tê. Carinan pevajooyeke ku tê da şeweyên dîtîna û nêrîna li hev nekin dibe ku çêbin. Carinan pêvajoyên ku ego xwe pêş dixin çêdibin û ev li gorî pêvajoyên din ên filmê jî pêvajoyeke xebatê ya demdirêjtir e. Dema ku derhêner û pevbestîner van pevçûnan bi hev ra di nav mekanîzmeyeke bihevberîyê da bi rê ve bibin û kontrol bikin, bêguman ji bo filmê fêdeya vê yekê çêdibe.

Li gorî derhêner diguhere lê dema montaja yekem tê kirin, tu dixwazî bi tena serê xwe bikî an bi derhêner ra bikî? Ji ber ku carinan ji bo derhêner zehmete hin dîmenan ji filmê derxe.

Bi gelemperî derhêner dixwazin ku çawa pevbestîna dest pê dike “li wir bin” di nav da bin û li wir cih bigirin. Rêbaza xebatê ya ku ez tercîh dikim, ne ev e. Heke mirov demek şûn da bi derhêner ra hîn nû dest bi

xebatê bike, ev xebat karekî serkeftî derdixe holê.

Gelek caran di pêvajoya ku em jê ra dibêjin “montaja gir” da dema ez bi tenê dixetibim û hemû tiştên ku hatine kişandin rêz û tasnîf dikim, ez hewil didim ku bibim xwedî fikr û ramanên nû.

Derhêner hê di serî da dema ku planê dişopîne dikare wê şîrove bike û di hîlbijartina plana rast da dikare pevbestîner manîpule bike. Ev rewş ji ber germahîya set û senaryoyê pêk tê.

**Gelek caran di nav sektorê da dema fîlm tê kişandin derhêner dibêjin “problem nîne em ê di montajê da çareser bikin” tu vê yekê çawa dibînî?**

Di kişandina fîlmê da carinan bi dehan pirsgirêk derdikevin holê. Her çiqas ev pirsgirêk cur bi cur ji hev cuda bin jî, ji bo herikbarîya setê neyê xirabkirin derhêner çareserkirina pirsgirêkan ji dawîyê ra ji pevbestîner ra dihêle. Ya rast pirsgirêk di pevbestîner da nayên çareserkirin, di pêvajoya pevbestîner da ji pisgirêkbûnê derdikevin. Lê helbet em nikarin vê yekê ji bo plan û sehneyên ku efektên taybet dixwazin bibêjin. Carinan qesta me ya ji hin serrastkirin û efektan ne pevbestîner e, plan e. Qesta me ew efekt û serrastkirin ku di nav planê da cih digirin.

**Dema montaj tê çekirin pevbestîner û yên ku karên dengî dikin di tekilîyê da ne? Tesîra pevbestîner di muzîkê da çêdibe gelo?**

Pirseke pir xweş e. Ez jihevqetandina deng û muzîkê ya ji hev tercih nakim. Carinan dengê bixwe pêwendîya navbera du planên cuda ava dike. Carinan jî di nav planê da bêyî qutkirinekê bi rêya deng ra wekî ku hîseke qutkirinê heye mirov dikare hîsekê bide avakirin. Ev di hin deman da hîsî, di hin deman da jî ji ber elimandinekê çêdibe.

Di qedandina pevbestîner da an jî di berdewamîya pevajoya wê da tekildarbûna ew kesê ku deng û muzîkê dê çêke pêşwendî û avantajekê bi xwe ra tîne. Ez bawer dikim ku pevbestîner jî wekî muzîk û deng xwedî rîtmekê ye. Hin pêwbestînerên ku ez karên wan diecibînim, ez dibînim ku bi muzîkê ra eleqedar in. Ev ne rasthatinek e. Ez jî dibêjim pevbestînerêkî/e baş divê bi muzîkê ra jî eleqedar bibe û pêwendîyekê di navbera xwe û muzîkê da ava bike.

**Gelek derhêner montaja xwe bi xwe dikin taybet ji bo fîlmên metrajdirej dibêjin. Tu derheqê vê yekê da çi difikirî?**

Bi pêşketinên teknolojîk ra, materyal û hewcedarîyên teknîkî yên ku di pêvajoya pevbestîner da

hewce ne bi nisbet erzan bûn. Plan û kişandin zêde bûn. Bi dijitalîzasyonê re, êdî her derhêner qet nebe hakimê programên pevbestîner ne. Yanî em dikarin bibêjin ku ev rewşeke wisa ye ku bi xwezayî veguherî û pêş ket.

Pevbestînkirina derhêneran an jî di vê mijarê da kûrkirina fikran ji bo min girîng e. Li gorî min ev rewş bi qasî ku nivîsandina senaryoyên xwe xwezayî û normal in. Heta ez dikarim bibêjim ku ew qonaxeke ku têgeha pevbestîner pêş dixê û girîngiya xwe digihîne xalek cuda.

**Wek pevbestînerê Kurd di çêkirina fîlmên kurdî da rol û mîsyona we çî ye?**

Ya rastî pirseke pir zor e lê di heman demê da jî pirseke pir xweş e. Di sînemaya kurdî û nasnameya kurdî da pênasêkirin û teşegirtina ji nû ve ya têgeha pêwbestînerê, mijareke ku em hîn jî li serê nîqaşê dikin û difikirin. Ez dibêjim ku nasnameya kurdî di nav pevbestîner da ji hêla têgehî ve xwedî cihêkî taybet e.

Bêjeyên wekî perçebûn, lêgerîn, û hewildana pêkvebûnê têgehên teknîkî ne ku em hema hema her gav di pêvajoya pevbestînerê lêpîrsînê li ser vê yekê dikin an jî bi kar tînin.

Ji bo niha, heye ku dijwar be mirov bibêje ku pevbestîner rolek an jî mîsyoneke çalak digire ser xwe, lê ez difikirim ku ew dikare di avakirina vê nasnameyê û rêberîya wê ya entelektuelî da gelek alîkar be. Ev rewşeke ku bi hilberîn û nîqaşên zêdetir dikare mezînbibe, û dê bikaribe cihê xwe bibîne.

Dîsa, ji nû ve nixandina pevbestînera di belgefîlmê da û vekirina wê ji nîqaşa li ser rastîyê jî pevbestîner ji derhêner û senarîst diqetîne û pevbestîner digihîne xaleke cuda.

**Te gelek caran xelata pevbestîner yê herî baş girt. Pevbestînerê kareke teknîkî ye. Bi te ew li-jneyên festîvalên filman ji hela teknîkê ve dikarin we binirxînin? Li gor çî xelat didin we?**

Hin fîlmên ku ez tê da me, dikarin di festîvalan da serkeftin û xelatan bistînin. Herweha min di çend kurtefilman da jî xelatên pevbestînerê hildan. Bi rastî jî berçavbûna vê tiştê mirovan bextewar dike.

Eger em werin li ser xuyanîtiyê; li ser vê mijarê jî nîqaşên baş hene. Hin festîval an ramanwerên sînemayê, girîngiyê didin halê pevbestînera ku nayê dîtin an jî birîna nayê hîskirin. Ez dibêjim hin ji wan jî ji peyva ‘trîck’ê ku ji birînen ku bi awayekî zelal nayê hîskirin û pêwendîyên wê yên ku wateyê rave dike, hez dike.

Heke em li gorî temaşevanan bifikirin, dibe ku nîqaşeke pir cuda çêbe.

Paradoks ev e ku tu her çiqas pevbestî-nerekî/e baş bî jî dema ku karekî baş dernekeve holê rewşa nîqaşkirina pevbestî-nê jî kêm û xirab dibe. Lê em nikarin vê yekê ji bo dîmen, muzîk, deng an jî ji bo gelek qadên din ewqas zelal qal bikin. Qalkirina vê yekê zehmet e.

Ez dibêjim ku çîrok xwedî pêwendîyeke wisa ye ku xwedî hest û wateyên efsûnî ye û ev pêwendî ji hev naqete û nayê dîtin.

### Rol û mîsyona pevbestîneran di festîvalan da çi ye?

Bi ya min sedemek tune ye ku pevbestîner ji aliyê rol û mîsyonên xwe di festîvalan da ji qadên xwe bînin cudakirin.

**Festîval Filmên Kurdî ya Global bi awayeke online hat pêşkêşkirin ku li her deverêke cîhanê hat temaşekirin. Di vê festîvalê da çend film hebûn ku te pevbestina wan kiriye? Tu ji aliyê pevbestîneriyê da rewşa filmên kurdî çawa dibînî?**

Berîya her tiştî, pêvajoyeke festîvalê ya pir hêja pêk hat. Pêwîst e kesên ku ked dane bînin pîrozkerin. Ji gelek perçeyan film hebûn û gihîştina van filman ji her dere gengaz in.

Filmên kurdî bi xwezayî di bin bandora mercên siyasî û civakî yê erdnîgariya xwe da ne. Dema ku em vê yekê bi perçebûnê ve bifikirin, em dikarin bandora wê ya li ser nasnameya afirandî bi zelalî bibînin. Nasnameya ku li diasporayê hatîye avakirin û şewaza ku hatîye afirandin ji Kurdistanê cuda nayê fikirin. Li gorî fikrên min têkiliya ku kurda bi "rastiyê" ra saz kirîye li gorî civakên din pir cudatir e. Dîtin rastiyê wekî derbirînek, amûrek hunerî û hewildana ji nû ve pevbestî-na wê, dikare bibe sedema karên baş. Ev di hin filman da jî tê dîtin.

### Pevbestînerên ku tu ji karên wan gelek hez dikî û di ecibînî kî/ê?

Ji aliyê Rojhilat bi taybetî ez xebatên kesên wekî Ebrahim Saeedi û ji bakur jî Naim Kanat û Osman Bayraktaroglu yê diecibînim. Helbet dibe ku ne rast e mirov di vir da cih bide vê yekê lê ez xebatên gelek pevbestîneran ku bixwe pevbestînen xwe çêdikin diecibînim.







Kazim Oz

“

Gava min filmek nivîsî û her tişteke filmê çêker çêbike hingî mirov dikare bêje em kurd wek sînemaya kurdî di aliyê çêkeriyê da pêşve çûne.”

...

### **Ew hest û hîsa ku te got ez dê karê çêkeriyê bigirim li ser xwe çi bû, motîvasyona wê ya bingeîn çi ye?**

Motîvasyona çêkeriyê belkî jî wekî tiştek ji bêîmkaniyê tê. Yanî heger hûn li cîhanê sînemaya serbixwe çêbikin yan jî sînemayekî alternatîf çêbikin gerekî hûn wek joker bixebitin. Ev rêyêke bêçaretîyê ye bo sînemaya serbixwe. Yanî heger sîstemek piştgiriyê nede karê we yanî hûn di nav sîstemek giştî de nebin gerekî hûn bixwe sîstemekî ava bikin. Dema hûn wê sîstemê çêdikin jî ji ber ku kar gelek e divê gelek kes li gel we bixebite. Car caran ev rêbaza, metoda kolektîf heye lê di van karên hunerî da divê yek kes hebe ku di hemû qadan da profesyonel bixebite. Gava min sînema çêdikir, çêkerên ku filma min çêdikirin hebûya birastî jî min bixwe nedixwest bibim çêker. Min dixwest tenê bibim derhêner. Belkî min senaryo jî nenivîsîba. Min dixwest edîtoriyê jî nekim. Lê mixabin di jîyana me de şertên me yên wisa tunin. Ji ber vê yekê ez bi mecbûrî vî karî dikim. Ez ji vî karî hez jî dikim. Nekû bi zorî çêdikim. Min bixwe muhendîsî xwandîye. Karê matematîkê, îktîsat û reqeman dizanim. Ji ber vê ez vî ji dil dikim.

### **Dema tu ji bo filmekê, bûdçekê danî li ber xwe herî zêde ji bo kîjan beş û qadê vediqitî?**

Gava hûn film çêdikin bo her tiştî pare lazim e. Ji bo pre-produksîyon, ji bo lêkolînê pare lazim e. Ji ber ku hûn derdikevin rê, hûn diçin cihêkî û hûn wek lêkolînerêkî li wir dixebitin. Mesela, hûn bi rojan bajarekî dimînin, ji bo pêşxistina produksîyon hûn dixebitin. Herwiha dema hûn film çêdikin ji bo produksîyon heger pare nebe hûn nikarin cihê xwe de bilivin. Dîsa gava we film kişand, ji ber ku bo post-produksîyonê gelek pare diçe, divê hûn bûtçeyekî eyar bikin. Yanî ji aliyê teknîkê ve divê hûn hind tiştan bikin ku ew jî pare dixwaze. Wekî kompîtir. Ez dikarim bêjim herî zêde bo produksîyonê û kirêkirina teknîkî diçe. Hûn çend kes tên cem hev, xwarin û vexwarin, rabûn û razan, pare dixwaze. Kamera, şaryo, cîhazên dengî û hrw dîsa para dixwaze.

Ji bo lîstikvanan jî ez zêde pare nadim. Hem yên profesyonel hem jî yên amator dixwazin fîlmên min da bilîzin. Bo wan jî tişteki baş e, pêşerojê da ji ber ku filmekê wisa hunerî û alternatîf da cih girtine dikarin gelek filman da bilîzin.

### **Di sînemaya kurdî de kêr derhêner hene pereyan bo lîstikvanan jî didin aliyekê. Heke mirov vê rêyê ji bo wan veke û pereyan bo wan bide aliyekê dê karibin debara xwe bikin lê derhêner vê nekin evan kesên lîstikvanîyê dikin wê çawa debara xwe bikin? Tu di derheq vê de çawa difikirî?**

Ev tişteke rast e û divê wek rexne jî bê girtin. Ez bixwe li gorî butçeya ku destê min da ye hereket dikim. Nekû ez qet tişteki nadim wan. Li gor butçeyê didim. Divê wek stratejîyek rast ez pere bidim wan. Heger em qet nedin ew tişteke ne rast e. Lê rast e ev mesele, meseleyeke mezin e di sînemaya kurdî de. Yanî ji bo lîstikvanan gereke beşek aborî hebe.

Belkî jî di sînemaya kurdî de ev pirsgirêk girêdayî nebûna gîşeyê be. Fîlmên kurdî gerekê bèn firotin, gereke bazara sînemaya kurdî hebe, fireh bibe û asteng nebe. Ku wisa bû ew ê çareser bibe. Heger me filmek çêkir û pare qezenç kir wê gavê mesele dê çareser bibe.

**Çêkirina filmekê her çend karekî teknîkî xûya bike jî baş dîyar e ku afirandinê jî di xwe da dihundirîne. Li gor vê bo kesên bi sînemayê ra eleqedar in pêşbinî û hîs çi qas girîng in? Tu bixwe bi hîs û pêşbiniyan tevgeriyayî ango hîsên te di warê biryargirtinê da çi qas bandor li te kirine heke kiribin çi ne ev biryar?**

Afirandin li gor min destpêka hevokê ye ku destpêkirina filmê heta dawîya montajê dewam dike. Ji ku derê tê afirandin? Ji jîyana me tê? Çima biryargirtin? Em li ser dinyayê difikirin û biryaran didin. Ji bo dîroka mirovahiyê, bo pêşerojê mirovahiyê yan jî ji bo xwezayê em çi bifikirin hez û hêst ji wê derê tê. Ew hîsên me jî li ser biryargirtinê bandor dike. Gava em karê sînemayê çêdikin car caran pênuş e, dîmen e, deng, hêstên weşartî, bûyer û karakterên mezin in ku em pê biryar didin. Karakterên ku di nav jîyana me de ne û li ser me tesîr kirine ji bo biryargirtinê pêwîst in. Yanî çavkaniyên biryargirtinê dibe pêvajoya afirandinê.

**Ji bo îro dipirsim, gelo em dikarin bibêjin sînema şewazeke nû ya hîskirinê ye û îro bûye ew amûr ku wateyê dide jîyanê? Bo nimûne li kêleka me şerek biqewime û çîrokekek wî şerî hebe û ew bûbe filmeke sînemayî tesîra wê dê ji nûçeyekê di derheq wî şerî da hatibe çêkirin xurtir be. Tesîra wê zehftir e û kûrtir e tu bi wê filmê baştir bi rûxandinê/tahrîpa wê dihisî. Ev hêza sînemayê ji kû tê? Birêz Oz, bi ya te mirovek dikare bibêje min filmek temaşe kir û nêrîna min a li ser jîyanê pê guherî?**

Gotineke Tarkovski heye dibêje, 'sînema mohirkirina demê ye'. Ev hevok birastî jî hevokê bi hêz e. Yanî sînema demê tîne cem hev. Ewil vê parçe dike paşê berhev dike û dawî dike. Berhevkirina wê pir bi hêz e. Felsefeyeke ku sed salan dewam dike, sînema dikare vê felsefê saet û nîvan da bi awayeke bi hêz û di demek wiha kurt da mohir bike. Rast e sînema hunereke ciwan e lê em lê dinêrin şoreşeke gelekî mezin e.

Rast e wekî teknîkî nêzîka sed û sih sale heye lê dîroka sînemayê digehije dîroka mirovahiyê û hemû qadên hunerê di nav xwe da dihevin. Sînema gorî hunerên din pir bi rehetî digehije milyonan. Têkiliya ku sînema bi mirovan ra çêdike tu qadên din yê hunerê nikarin çêbike. Hêza wê jî ji dîtin û guhdarkirinê tê. Her du jî di jîyana mirovan da tiştên taybetin. Sînema bi wan amûran ve pêk tê. Û heger felsefe û edebîyat jî tê da hebe hingî li ser nêrînan bandor dike û diguherîne.

**Robert Bresson di pirtûka xwe ya bi navê "Nîşeyên li ser Sînematografîyê" de dibêje 'pêşeroja sînematografîyê di destên ciwanên nû yê ku li pey madîyata rûtîn neçin û panotê xwe yê dawî ya di bêrîkên xwe de jî ji bo filmên xwe xerc bikin de ne'. Erk û girîngîya ciwanan a li ser sînemayê çi ne? Heman mesele bo sînemaya kurdî çawa ne?**

Robert Bresson bi rastî jî di dîroka sînemayê de mamosteyeke gelekî mezin e. Min jî gelekî li ser wî lêkolîn kir. Yanî nêzîkbûna wî ya hunerî, lîstikvaniyê, sînemaya tîcarî bi rastî jî bo me weke dersin. Gereke ew tiştên ku ew dibêje em gelek car li ser wan bifikirin û ew hevoka wî ya te gotî pir bi qîmet e. Wekî ku mifteyekî dide destê me. Paşeroja sînemayê ne girêdayî prodûksiyonên mezin in, pare û teknîkên mezin in. Girêdayî rihên ciwanên ku nû dest bi sînemayê kirîne, dixwazin tiştêkî bikin. Wekî karekî îdeal, wekî armanceke mezin yê ku dibezin ew dê di sînemayê da guherîn çêbikin. Nekû yê traditional difikirin, yê ku wekî fabrîqeyekî lê dinêrin çêdikin. Tiştê derdikeve holê berhemeke fabrîqê nîne.

Di Elewîtîyê da gotinek heye, dibêje, Hirka û Lokma yanî felsefeyeke ku jîyana Alevîtan tê da ye. Di sînemayê da jî nekû armanca derhêneran qezençkirina pareyan e. Armanca wan huner e ew yek sînemayê pêşve dibe. Ez di vê bawerîyê da me.

Ji bo sînemaya Kurdî jî ez dikarim bêjim, ew derhênerên ku ji bo hunera sînemayê hemû pareyan xwe xerç dikin ew heman demê da çêkerên mezin in ku ji çêkerên Hollywoodê çêtir in. Ji bo piştgiriya me tu sazî, dewlet, şîrket tune ne û em bêpare ne. Lê yê Hollywoodê ne şibî me ne û çêkerîya me li wê derê girîng e.

Ew derhênerên Kurd ku ji bo sînemayê her tiştê xwe didin, rêyekê vedikin. Di dîrokê da jî rêvekirin tiştê girîng e ku em di vê rê da diçin. Bo me Kurdan ew metod gelek mihîm e. Gerekî em rê vekin. Ji ber ku tu welat, dewlet, sazî, şîrket bo me rê neçêkirîye û divê em bixwe çêbikin. Jixwe ew jî ji alîyekî avantajê. Çi ye ew? Em ê bixwe filmên xwe çêbikin. Ew jî dê me nêzîkê me bike. Wekî din belkî jî em ji nasnameya xwe, ji dîroka xwe, ji paşxane û pêşeroja xwe dûr bikevin. Belkî jî em bibin biyanîyên xwe. Ji ber vê yekê divê em vê metodê pêşve bibin.

**Bi ya te sînemaya serbixwe tê çi wateyê? Tu derheqê rewşa sînemaya Kurdi ya Bakur çî difikirî?**

Li dinyayê sînemaya serbixwe bi rêya aborîyê

ve tê nixandin. Ez vê pir rast nabînim. Sînemaya serbixwe berîya her tiştî ji aliyê fikr û raman, ji aliyê hişmendîyê ve divê serbixwe bibe. Aliyê aborî pên-gava duyem e. Divê tu berîya her tiştî jîyanê cuda binixînî. Jîyan çawa ye? Bo te çawa ye? Têkiliyên mirovan, jin û mêran, ajalan, xwezayê... Ji aliyê îdeolojîyê ve ku qet fikrek me tune be wê çaxê sîne-mayeke serbixwe jî nabe. Divê sînemaya serbixwe ji sîstemê veqete. Çawa ji aliyê fikr vediqete divê ji aliyê aborî jî veqete. Divê tu bi serê xwe vê fîlmê çêbikî û bi serê xwe belav bikî. Sînemaya serbixwe divê bînerên xwe bixwe peyda bike.

Ji bo sînemaya Kurdî ya aliyê Bakur dikarim bêjim ev nêzîkê bîst û sê sale kar û xebatên hêja hatine kirin. Êdî gelek kes li ser sînemayê dixebite, keda xwe dide vê qadê. Êdî lîstikvan, derhêner, temaşevan hene. Êdî temaşevan dixwazin fîlmên Kurdî bibînin.

Heta çend sal berê jî me bigota sînemaya Kurdî heye dê her kesek rewîyaba û bawer nedikirin. Lê niha êdî em dikarin bêjin sînemaya Kurdî heye. Li dinyayê jî ev sînemaye hêdî hêdî pêşve diçe. Lê gelekî pirsgerêkên sînemaya Kurdî hebe. Ji aliyê aborî, teknîkî, temaşevan û belavkirinê da pirsgerêk hene. Dîsa jî sînemaya Kurdî ya Bakur heye, dimeşe û pêşve diçe. Ez wisa bawer dikim.

**Ji bo te girîngtirîn Festîvalên filman kîjan in? Ji xeynî Kurdîstanê festîvalên fîlmên kurdî gelek bajarên cîhanê yên navdar tînin li dar xistin. Bi saya wan festîvalan jî sînemaya kurdî bêhtir tê pêşçav. Tu bi giştî li festîvalên fîlmên kurdî çawan dinihêrî? Di pêşketina sînemaya kurdan de cih û rolên van festîvalan çi ne?**

Hemû festîval jî girîng in bi rastî jî. Rast e hind festîval bo bazara sînemaya dinyayê girîngtir in. Festîvala Cannesê, ya Venedîkê, ya Rotherdamê, ya Torontoyê...

Ji bo Kurdan jî festîvalê ku tînin organîze kirin li gorî neteweyên din girîngtirin. Divê heta niha festîvalên fîlmên kurdî mezintir bûna. Gerekî bêhtir bîner gehiştiba wan festîvalan. Gerekî ew festîval gehiştiban bînerên neteweyên din jî. Ji ber ku pêşketina sînemaya Kurdî da meseleya bazarê gelekî girîng e. Em filman çêdikin lê nikarin bifiroşin. Vîzyona da zêde nahên rawestin. Di pêşîya belavkirina filman da astengîya sîyasî heye. Bo vê gerekî me rolên festîvalên fîlmên Kurdî behtirî dîtiba. Divê gel bajar û welatan hatiba lidarxistin.

Nêzîkê bîst sal in gelek festîval tînin lidarxistin lê hinek ji wan tenê du-sê salan dewam kirin û sekinîn.

Hinek ji wan dewam kirin lê mezin nebûn. Hinek ji wan ji aliyê teknîkê ve qet ne baş in.

Divê em dubare bikin ku festîvalên tînin lidarxistin hewceyî alîkarîya gelê Kurd heye.

Meseleyên sîyasî astengî derdixe. Mesela, dema min Bahoz kişand, min dixwast bikeve hemû vîzyonên Ewropayê. Lê meseleyên sîyasî rê li ber me girt û ev yek rêya fongirtinê jî li ber me digire. Festîvalên di vê hêlê da girîng in, divê bîner domandin û ji bo me ji Cannesê girîngtir in.

Festîvalên me ji bo bazar, fikr û ramanan girîng in. Nekû em wan tenê wek bazar dibînin. Heman demê da divê ew festîval ji bo nixandina sînemaya Kurdî bibin platform. Em kîjan rê da ne, çi astê da ne? Divê em xwe bibînin wan platforman da.

**Tu bixwe jî di Festîvala Fîlmên Kurdî ya Global da derhênerê herî baş bûyî û filma te ya bi navê Zer jî xelata hilbijartina temaşevanan a yekem hilgirt. Tu di derheqê vê festîvalê da çi difikirî?**

Ew festîval di nav festîvalên kurdan da festîvala herî mezin e. Ew hevalên ku vê festîvalê çêdikin bi rastî jî ked didin û nesekinîn jî. Gelek festîval heman demê da destpê kirin lê wan hevalan berxwe da û festîval pêşve birin. Ev tişteke gelekî bi qîmet e. Bi hêz û bi rêz e. Rola vê festîvalê jî berîya her tiştî ji bo festîvalê din gereke bibe mînakek. Yanî wekî Londonê divê li New Yorkê jî, li Parîsê û li Berlînê jî em festîvala çêbikin. Li gor neteweyên din gelê kurd bêhtir festîvalên wiha heq dikin ji ber ku kurd li gelek deverên dinyayê belav bûne.

Ya duyem îsal tişteki girîng çêbû. Festîval online hat çêkirin. Êdî ev tê vê maneyê ku ev pandemîye xilas bibe, nebe gereke em hêza xwe bidin onlineê. Hemû aliyên Kurdîstanê hatin cem hev. Mesela ji gelek deverên dinyayê ji bo Zerê şîrove hatin. Ev tişteke nû ye û gereke em vê jî pêşve bibin.

**Me li gel koordînorê vê festîvalê Ferhan Stêrkî roportajek çêkir. Stêrk digot ku 'Divê êdî em festîvalên xwe bi awayek hîbrît çêbikin.' Yanî hem rûbirû hem jî online. Fikrên we yên li ser vê meseleyê çi ne?**

Heta niha jî pirsgerêkên me yên herî mezin belavkarî ye. Êdî teknîka şoreşî ya li dinyayê wan kêmasîya jî ji holê radike. Gereke em vê bibînin. Niha li berîya me der vekirîye û em dikarin derkevin derwa. Êdî ev e şerteke ku divê em hêza xwe nîvî bidin onlineê nîvî bidin tarza rûbirûyê. Ev yek bo pêşveçûna me pêwîst e û şert e. Gelek kes jî wekî min difikirin û em ê pêşve biçin.



**Festîval bi awayeke online hat pêşkêşkirin ku her devereke cîhanê hat temase kirin û filmên klasîk ên kurdî jî hebûn tê de. Filmên te jî hebûn tê da. Platformeke wekî vê festîvalê jî bo arşîveke filmên kurdî bê amadekirin biya te dê çawan be?**

Projeyek wisa pêk bê dê gelek xweş be. Em niha ev saetke li ser sînemaya Kurdî diaxivin. Gava ku platformeke wiha çêbibe em ê bêhtir biaxivin û metodek pêşveçûnêye jî ev. Weke Netflix, Blu TV... Çima yên Kurdan jî çinebin! Kurdên li Ewropayê dijîn belkî bikarin tiştekî wisa çêbikin. Ji ber vê dîsan dubare dikin nûnerên sînemaya Kurdî ne tenê gelê kurd e. Çîrokên me çîrokên navteweyî ne. Çîrokên me çîrokên hemû gelên din diwartir in. Ev tê vê manayê ku yekî Arjantînî jî dê ji filmê me hez bike. Divê em li gor naveroka sînemaya xwe tevbigerin û li gor vê sazîyekê ava bikin. Sazîyek hebe filmên me bi rêya platformeke wiha li dinyayê belav bike wê pir baş be.

**Tu dikarî çêker û derhênerên biyanî yên ku tu herî zêde wan dicibînî ji me ra bibêjî, kêfa te herî zêde ji kîjan derhêneran tê û çima?**

Em nikarin bêjin çêkerên kurd yên hêja hene. Hêj derneketine. Di nav hinek filman da xwe xuya dikin lê di rolên da kêmasî hene. Du-sê kes hene xwe bellî dikin. Lê vê demê çêkerên filmên Kurdî gelê Kurd e. An jî gelek caran derhêner bixwe çêker e. Mînak, gava min filmek nivîsî û her tiştekî filmê çêker çêbike hingî mirov dikare bêje em kurd wek sînemaya Kurdî di aliyê çêkerê yê da pêşve çûne.

Yên biyanî jî mirov dikare bêje sedan hene. Çêkerîya biyanîya gelek pêşve çûye. Mînak, Hollywood, hema bêje sînemaya çêkerîyê ye. Hemû biryarên tîn girtin ji aliyê çêker ve tîn girtin. Belkî balanseke ne rast jî be. Lê di sînemaya Ewropayê da balanseke xweş heye. Çêker jî, derhêner jî rolên xwe baş dilîzin.


Wekî derhêner jî gelek kes hene ku diçin xweşiya min. Ez naxwazim yekî bikim pêşîya yekî din lê vê demê di nav van şertan da yê ku filmên kurdî çêdike ev ji bo min derhênerêke pir bi qîmet e. Nekû filma wî baş e an ne baş e. Demeke diwar heye û ew dixebite. Ev yêk têra min dike. Ew ên wisa bo min derhênerên herî bi qîmet in.

**Em bîna li ser filma te ya dawî. Post-prodûksiyon didome û em jî mereq dikin ku ka dê filmeke çawan bê ber destê me. Wekî filmên te yên din de karakter dîsa her vedigerin Kurdîstanê an na? Dîsa em bêjin tu zarokan qet bikar naînî, tê da zarok hene an na? Tu dikarî hinek behsa filma xwe ya bi navê 'Emrê Kêlîyêke Berfê' bikî?**

Nêzîkê saleke ez li ser vê filmê dixebitim. Heta doh şevê saet pîncan jî em dixebitîn. Wekî ku tu jî dizanî me dê ev hevpeyvînê zûtir çêkiriba lê ber karê vê filmê me hevpeyvîn da paş. Heqeten em di nav tempoyeke mezin da didomînin. Xebata wê jî baş diçe. Ew pirsgirêkên me heta niha axiftin ez bixwe niha wan pirsgirêka di çêkirina vê filmê da dibînim, dijîm. Lê em gelekî berxwe didin û bawerîya min bi vê filmê heye. Hêdî hêdî derdikeve. Çawa me berê wênayek dikişand, me ew fikir nav avê, ew hêdî hêdî zelal dibû, niha jî hêdî hêdî film derdikeve. Navê filmê 'Emrê Kêlîyêke Berfê' ye. Di filmê da ciwan hene. Evînî heye. Çand heye. Ez hêvî dikim dê di demek nêz da em ê bi vê filmê derkevin pêşîya we.

**Mamoste, bangewazîyek ji sînemagerên Kurd heye?**

Bangewaziya min ji bînerên Kurd heye. Ez bang li wan dikim ku bila filmên me li ser platformên online temase bikin, binirxînin, ji me tiştekî bixwazin û tiştekî bidin me.





**Miradê Miradan**  
mirademiradan@gmail.com

### JANEKE ZIRAV: ZER (2017)

“Wextek ji wextan li gundekî Dêrsîmê şivanek dil dikeve qîzeke bedew ku navê wê Zer e. Zer jî dil dikeve şivên. Lê Zer qîza axayê gund e û li gor bavê wê, ew ne layiqî şivanekî ye lewra axa bi darê zorê qîza xwe dide yekîdin. Tevî hemû xedariya zistanê jî Zer û Şivan biryarê didin ku şeva dawetê hevdu birevînin. Şeva dawetê Zer li ser soza xwe dimîne û direve lê ji ber berf û morana zistanê rîya xwe dixelîtîne û ji sermê dimire. Şivanê ku bi mirina Zerê dihise hiş û aqil diavêje. Heya dawîya ‘emrê xwe gund bi gund digere û strana Zerê dibêje.”

Kazim Oz, piştî fîlmên xwe yên wek *Fotograf* (2001), *Dûr* (2005) *Bahoz* (2008), *Hebû Tûnebû* (2014) û hwd, herî dawî bi fîlmê xwe yê *Zer* (2017) derketibû pêşberî temaşavanan. Zer, promiyera xwe di 36. Festivala Fîlman ya Stenbolê da kiribû û paşê li gelek festîvalên navnetewî hatibû nîşandan û rastî eleqeyeke mezin hatibû. Fîlmê Zer ji ber sansûra ku lê hate kirin jî gelekî bal kişande ser xwe. Nêzî çar deqeyên fîlm ji aliyê Gerînendetiya Giştî ya Sînemayê ve hate sansûr kirin lê Kazim Oz beyî ku sehneyan ji fîlm bibe, ew bi awayekî *reşkîrî* di fîlm da bi cih kirin, û bi vî awayî rûyêreş yê sansûrê bi bîneran ra parvekir. Zer li Almanya di Festivala Fîlman ya Mannheim-Heidelberg da *Xelata FIBRESCI* û *Xelata Fîlmê Herî Baş ya Temaşevan* girt. herweha dîsa di Festivala Fîlmên Kurdî ya Londonê (2021) da -ku vê paşê bi awayekî online hate lidarxistin- hêjayî *Xelata Fîlmê Herî Baş ya Bijareya Temaşevanan* hat dîtin..

**Fîlmê Zer, rêwîtiya xortekî ye ku berev rastiyan wî yê çandî û dîrokî diçe; rêwîtiya stranekê ye ku deng û newaya wê ji esmanên gundekî xalî bilind dibe. Çîroka fîlm li New Yorkê di binê avê da dest pê dike û li Dêrsîmê di binê avê da diqede.**

Serlehengê fîlm Jan, xortek e ku ligel malbata xwe li New Yorkê dijî. Di beşa mûzîkê da perwerdehiyê dibîne. Bi xuy û xisletê xwe kesekî bêxem e, li pey kêf û zewqa xwe ye nola ku hişê wî pûç û vala ye. Piştî rojê ku dergistiya Jan terka wî dike- *ev veqetîn dibe sebeb bo ku Jan nêzî dapîra xwe bibe*- pê dihise ku dapîra wî Zarîfe ji ber nexweşiyê giran hatiye New Yorkê û dive herê pê ve. Heta hingê jî dapîra xwe nas nekiriye. Tevî ku zêde ne bi dilê Jan e jî diçe balafirgehê, dapîra xwe digire û wê dibe nexweşxanê. Rojê ji rojan, Jan tê serdana dapîrê, jê dixwaze ku stranekê bixwîne. Dapîra wî strana Zerê dixwîne û Jan gelekî di têsîra vê stranê da dîmîne, dikeve pey pirsan. Gava pêdihise ku stran bi kurmanciye yekcar matmayî dimîne lê hingê jî dapîra wî rastiyan jê vedişêre, bersivên xelet dide wî. Li nexweşxaneyê di navbera Jan û dapîrê da hêdika têkiliyêke gêş çêdibe, yekcar meyla xwe didin hev. Lê her ku diçe rewşa dapîrê xedartir dibe. Jan, dibe şahidê xewnerêşkên ku dibîne û hingê dapîra wî behsa rabirdûya xwe jê ra dike. Êdî hino hino em hîs dikin ku Jan di nava veguherînekê da ye. Jan dike û nake strana ku dapîra wî jê ra xwendî ji ser zimanê wî naçe. Dengê dapîra xwe, çîrokên ku jê ra xwendine li ba xwe qeyd dike û seraqet li wan guhdarî dike. Gava ku dapîra wî dimire Jan bi hişekî tevîhev li holê dimîne weku rabirdûyek wî nîne. Lê êdî Jan ne ew Janê berê ye... dê li xwe li bîranînen dapîra xwe li civat û erdnîgariya xwe vegere.

Tiştêkî ku wî li New Yorkê bihêle nemaye. Bo ku dapîrê veşêrin ligel bavî berê xwe dide Tirkîyeyê. Dema piştî cenazeyê agahiyên hîn zelaltir di derheqî rabirdûya dapîra xwe da ji metika xwe hîn dibe, wî çaxî rêwîtiya Jan ya ber bi kokên wî ve, ber bi Dêrsîmê ve dest pê dike. Nola Dêrsîmê Jan jî tekabûlî tu nasnameyekê nake. Jan ne karekterek radîkal e, li dij bavê xwe derdikeve, cihana ku pêşkeşî wî dike red dike û berê xwe dide rêyêke ku nizanê dawî li ku ye. Jan, seranserî rêwîtiyê de, kultur û kevneşopîyên Dêrsîmê nas dike û di jiyana xwe ya hundirîn da jî dest bi lêgerînekê dike. Di rojên ku li Dêrsîmê derbas dike de, ne têdigihijê kokên xwe ne jî kêmasiyên xwe tamam dike. Bes trajediya ku ew di nav da ye dike ku hay ji tengezariya hebûna xwe çê bibe û yekcar têtbigihijê êş û janên jiyane ku jê dûr maye. Lê ji hêla lîstikvaniya Jan ve




dema em li fîlm dinerin, tevî ew qas tiştên ku diqewimin jî, em wê êş û jana zêde di tevgerên wî de, di sûretê wî da nabînin.

Jan, her ku dide pey şopa çîroka strana Zer, ligel şûnên komkujîya 1937an ku hemû qedera xelkên Dêrsîmê guherandiye, rastî rabirdûya dapîra xwe tê. Bûyerên di fîlmê de, wek çîroka qaqlîbaz ku di trêne da ji aliyê zilamekî navsere ve jê re tê vegotin, diqewimin. Jan jî nola qalîbaz ji dest û pîyan ve girtiye, her ku dide pey pîrsan, bersiv berê wî didin ciyekîdin û di dawiyê da jî li xwe, li kokên xwe vedigere. Lê heger jan kareterek xwedî hişmend bûya dê dest bi rêwîtiyeke weha nekira. Her ku fîlm berev dawî diçe, em fam dikin ku lêgerîna di fîlm da ne lêgerîna stranekê ye lê lêgerîna gundekî wêran e, trajediya mezin ya xelkê herêmê ye.. Ji gundekî diçe gundekî, di rêyan da tikîtenê dimeşe. Di dawiyê da rastî gundê lksorê (Gundê ku kilama Zerê jê belav bûye ) tê ku wêran e, di bin avê da maye û fîlm vedigerê serî. Jan ji nişka ve xwe bera avê dide. Di binê avê da gund li ber çavê wî berceste dibe û xwe di nava çîroka Zer û Şivanî dibîne. Halûsînasyonên ku di binê avê da dibîne ji hêla teknîka fîlm ve gelekî serkeftiyê û bo sînemaya kurdî

ceribandinek cîyawaz e. Ew sehneyên dawî li gel strana Zerê, nola helbestekê xweş diherikin û dibin pûxteya lêgerînên Janî.

Fîlm li Dêrsîm, Afyon, Stenbol, Uşak, Elezîz û New Yorkê derbas dibe. Kazim Oz dibaje ku: *“Zehmetiya herî mezin şertên aborî bûn û nexasim li New Yorkê me zehmetî dîtî”*. Lewra dema em bala xwe didin fîlm, di beşa pêşî da ku li New Yorkê hatiye kişandin, çîrok zû diherike û zûzûka dixwaze berê xwe bide Dêrsîmê. Dema min li fîlm temaşe kir, ev yek wek kêmasiyekê min hîs kir, di eslê xwe da ji fîlm dixwe; lê ji hêla din ve bo ku em karekterê Jan, nas bikin û jiyana wî ya berê bibînin ev yek hewce bû. Li New Yorkê sehne zû diherikin avahiyên bilind, xirecira jîyanê, têkiliyên jîhevketî û atmosferek xumamî heye ku ruhê însên ditengijîne lê dema fîlm derbasî Dêrsîmê dibe xwezaya wê, mîna dîmenek ji bihûştê ye ligel sînematografîyeke zehf serkeftî ku ji hêla derhêner ya dokumanteriyê hêza xwe digire. Têkiliyên însanan jî dil in û bexşende ne. Bi min derhêner ne ku civaka rojhilat baş û civaka rojava xof nîşan dide lew tiştên heyî li ber çavan radixe. Li New Yorkê êsîriya mirovên ku li bajarên mezin di nav avahiyên bilind da dijîn bi rîya kadrajên cîyawaz vêdibêje. Ligel vê dema Jan di dersê da ye behsa mûzîka bluesê tê kirin ku: *ji êşa mirovên reşîk afiriye û dijmetînger e lewra mûzîk kodên veguherînên civakî dihebîne*. Nola strana Zerê ku ji êşa civakekê afiriye. Asoxî, êş malê gerdûnê ye...

Çîroka Zerê ya di fîlm da herçiqas perçeyêke senaryoyê be jî, ji gelek varyantên çîrokên herêmê sûd girtiye. Derhêner bo fîlm ev stran/ çîrok nivîsiye û gelekî serkeftiyê, xweş honaye; bo ku peyamên xwe ragihîne berê kameraya xwe dide peykeran (Peykerê Seyîd Riza û





Peykerê Şerê Yewnan û Tirkan li Afyonê), nivîsên li ser dîwaran (*Her devlet teröristtir*) ...wêneyên Ahmet Kaya, Mûsa Anter... rist-eyek ji Cemal Sûreya (*tarih öncesi köpekler havlıyordu*) ...wesayîten eskeriyê... dengên azanê... portreya Atatürk.. wêneyên '38 Komkujiya Dêrsîmê,, li îstasyonê û li daristanê flashbackên ku Jan dibîne û metafora herî xurt ya di fîlm de: Du gwîz. Piştî ku bapîra Jan dimire du gwîz li şûnê dimînîn ku wê ji zarokatiya xwe ve di nava çenteyekî da ew veşartine. Metika Jan, gwîzan dide wî û her ku Jan di nava hizrek yan jî biryarekê da ye wan di kefa destê xwe da dibe û tîne. Ev herdû gwîz bo Jan ji wateya xwe ya heyberî dûr dikevin û weku rihê dapîra wî bin ango rabirdûya wî di wan da veşartîbe li wan dinere.

Axira dawîn bi xêr û gunehên xwe fîlmê Zer yê Kazim Oz hêjanî gotinên bedew e û bo dahatûya sînemaya kurdî hêviyên gelek bedew dide temaşevan û dildarên sînemayê. Lewra bi min derhêner bi fîlmê Zer, berhema herî serkeftî ya fîlmografiya xwe daye û klasman guherandiye. Fîlmê Zer, carna bi vegotinên lîrik carna bi dramaturjiyeye nazik carna jî bi komediyeke di hedê xwe de bo temaşevanan dibe ciyê azmûneke baş. Kazim Oz bi fîlmê Zer nîşanî me da ku edî derhênerên Kurd bi qasî naverokê ji hêla teşe û sînematografîyê ve jî bi ser dikevin. Li hember hemû şertên xerab û sansûrê jî roj îro Kazim Oz bi fîlm û belgefilmên xwe berxwedana bo sînemayeke azad û serbixwe didomîne.

### ÇAVKANÎ

Kazim Öz ile Zer üzerine söyleşi / Fırat Yücel (Altyazi Sinema Dergisi)

<https://eefb.org/interviews/kazim-oz-on-zer>





**Mistefa Dogan**  
mistefadogann@gmail.com

## STADEK BO JIYANÊ “KICK OFF KIRKUK” (2009)- ŞEWKET EMÎN KORKÎ

Sînema bi xwe jî zimanek wê û wekî hemû zimanan struktureke wê jî heye. Di zimanê sînemayê da jî sentaks û semantîk du hêmanên sereke ne. Sînemaya Şewket Emîn Korkî ji bilî sentaksê dixwaze bergehên vê semantîkê jî mezintir û berfirehtir bike.

“Kick Off”, duyem filma metraj-dirêj ya derhêner Şewket Emîn Korkî ye. Fîlm li stada Kerkûkê hatiye kişandin ku ev stadyûm ji bo penaberên ku ji şer û aloziyên nav Iraqê reviyane, bûye wargeh. Penaberên kurd, ereb, tirkmen û aşûrî ev stadyûm ji xwe ra kirine star û jiyana xwe li wir didomînin. “Kick off” tê meneya destpêka misabaqaya futbolê. Fîlm bi term û mekanên futbolê, jiyana di bin şert û mercên şerî da problematîze dike. Dîmenên jiyana rojane ya însanan ya di nava stadyûma futbolê de, di destpêkê da wekî parodiyekê tê ber çavê mirov lê bi daxilbûna nava fîlmê ra mirov xerkî çîrokeke an jî çîrokên tehil dibe. Tam di vir da ew nuansa di navbera mîzansen û mîzanşatê da xwe dide der. Mîzanşat, termeke aydê çêkerê filman yê sovyet, Sergei Eisenstein e. Li gorî wî; mîzansen ew set yê ku berî fîlmê haziriya wê tê kirin –deng, reng, sahne û lîstikvan hwd- lê ev mîzansen çawa dibe fîlm? Bersiva vê, mîzanşat e. Ango mîzanşat ew proseya veguheştina mîzansenê ya bo fîlmê ye (Buckland, 2015). Li stadyûma Kerkûkê ew “mîzansen” jixwe heye û bi rastî jî li wê stadê penaber dijîn. Korkî ew “mîzansen” a heyî bi mîzanşateke gelek baş veguheştiye fîlmê.

### Iraqek li Dinyayê, li Kerkûkê Dinyayek

Li vê jiyana nav stadyûmê, Aso (Şivan Atûf) kesê xwende ye û temsîla zanatî, pêşverûtî û qencyê ye. Hevalekî wî jî heye bi navê Sako (Govar Enwer). Sako ne wekî wî zana ye lê dilrehm û dilovan e. Aso dixwaze ji bo zarokan tiştan bike. Aso û Sako ji bo zarok karibin li maça Iraq û Erebestana Siûdî ya Kupaya Cîhanê temaşe bikin, li nav stadê televizyonekê datînin. Tîma Millî ya Iraqê di kûpaya cîhanê de dilîze. Aso û Sako jî tenê bo 90 deqeyan be jî “cîhanek”ê tînin û bo zarokan li orta stadyûma Kerkûkê datînin.

### Daxwaza Daxilbûna Dinyayê

Aso ji bo di navbera zarokên kurd, ereb, tirkmen û aşûrî da olîmpiyatek an jî turnuvayêke futbolê li dar bixe, hewleke mezin dide. Ji dam û dezgehên ra nameyan dişîne, pereyan dibîne û axir vê pêk tine jî. Ji zarokan ra forme, gog û amûrên futbolê berhev dike û li orta stada kerkûkê “meşaleya olîmpiyatê” pê dikeve. Piştî deşpêka misabeqeyê Aso û Sako ferq dikin ku wan ji bîr kiriye bo şampiyonê vê turnuvayê kûpayek bikin û berê xwe didin sûka Kerkûkê da ku kûpayê bikin. Li wir bombeyek diteqe û Aso dimire. Ew dimire lê kûpa digihîje stadyûmê û li ser destê zarokên biçûk bilind dibe. Olîmpiyat, organîzasyonêke cîhanî ye. Tertîbkirina wê ya mînyaturî ya li nava stada Kerkûkê, daxwaza daxilbûna dinyayê ya zarokên Kerkûkê an jî Kerkûkan e.

Di ber herikîna fîlmê ra em ji jiyana “normal” ya xelkê ku li nav stadyûmê dijîn, dîmenan dibînin. Bexên ku dibezin, kal û pîrên ku bi dameyê dilîzin, jinên ku ber malên xwe paqij dikin...

### Ji aliyê semiyotîk ve “Kick Off Kirkuk”

Gava em ji hêla semiyotîk ve li fîlmê “Kick off Kirkuk”ê mêze dikin em dibînin ku di serî da bijartina mekanî bi xwe jî, ji bo derbirîna çîrokê



têra xwe xwedî mene ye. Kerkûk, wekî minyatureke Rojhilata Navîn e û bi pêkhatayên xwe yên cuda tê zanîn ku ev pêkhate hemû li wir dewa serdestiyê dikin. Korkî bi rewşeke mînimâl, berê me dide problemên mezintir yên piraniya welatên şerqî.

Wekî me di jor da jî got, fîlm berê xwe dide jiyana di bin şert û mercên şerî de. Helbet tesîreke mezin ya hebûna petrolê di van şer û pevçûn û aloziyên li welatên Rojhilata Navîn da heye. Korkî bi vê sehneya ku zarokan û rafîneya petrolê xistiye heman kadrajê, ji aliyê semiyotik ve derseke sînemayê dide. Li jêr zarokên ku jiyana wan ji ber şerî tîk diçe, li jor yek ji sedema bingehîn ya van şeran..

Ji layê semiyotik ve hûrgiliyêke din jî heye di fîlmê da ku lazim yê mirov behsê bike. Li turnuvaya ku Aso û Sako tertîb dikin, zarokên her miletî bi tîma xwe tevî dibin; Kurd, Ereb, Tirkmen û Aşûrî... Hakemê musabaqê Aso ye lê ji ber ku Aso Kurd e, tîma Ereb hakemtiya wî qebûl nake û dibêje "Tu yê layengiriyê/alîgiriyê bikî." Axir li hev nakin û rojnamegerekî biyanî ku bi tesadufî ji bo wênekîşandinê hatiye wir, dibe hakemên wan. Korkî bi vê îşaretê me bi wê problematîka miletên şerqî dide hisandin ku kêşeyên

xwe nikarin bi xwe hal bikin û ev yek dibe sedema alozî û tîkçûnên mezin.

### Ji jiyânê reş û spî, filmeke rengîn çênedibû

Feqîrî, toz û topax, bêavî, helîkopterên ku di ser bajêr ve difirin, bombeyên ku dengên wan êdî ne xerîb in... Dema mirov xerkî nava fîlmê dibe, fêm dike ku jixwe ev fîlm divê ne bi awayekî rengîn lê reş û spî bihata kişandin. Nedibû ku jiyaneke wisa perîşan bi filmeke rengîn were kêşan.

### Ceribandinên xerab yên melodramê

Di fîlmê da tişta herî xerab stranên ku di nav da dihatin gotin bûn. Derhêner di hin sehneyan da xwestiyê bi melodramekê ew hisiyat, xurttir bike lê bi ya min di stranên da tercîhên gelek xerab kiriye ("Ez evdal im", "Lawikê Metînî", "Mîro"). Hemû li cihekî, lê li filmeke ku piraniya wê bi zaravayê soranî ye, ew stranên "giran" yên kurmançî qet rûnenîştîye û bi ya min zerareke mezin daye kompozîsyona fîlmê.

"Kick off Kirkuk" a Şewket Emîn Korkî, ji hêla tematîk ve nîn be jî di hêla derbirînê da filmeke nimûne ye. Min jî xwest bi kurtahî li vir behsa wê bikim lê lazim yê ez bêjim ku fîlm, hêjayî krîtîkên berfiretir e.





**Omer Bextiyar**  
sonmezomer21@gmail.com

## TRAJEDÎYEKE ROJHILATA NAVÎN: FÎLMÊ 'QIJIKA REŞ'

*"bê welat jî mirov dikare bijî  
mîna kûçikan  
mîna kûçikên bêxwedî jî  
dinya welatê min e  
mîrov dikare bêje  
mîna utopîstan  
mîna kuçikên utopîst"*  
Ferîd Xan - Çîroka Kûçikên Birçî  
\*\*\*

### Kunyeya Fîlmê

**Navê Fîlmê:** Siyah Karga (Qijika Reş-Black Crow)

**Derhêner:** M. Tayfur Aydın

**Senaryo:** M. Tayfur Aydın

**Lîstikvan:** Şebnem Hassani-soughi, Aziz Çapkurt, Mehmet Ünal, Murat Toprak, Sedat Culum, Aydın Orak

**Sal:** 2016

**Cure:** Drama

**Dem:** 1 saet û 38 deqîqe

**Ziman:** Kurdî, Tirkî, Farisî, Îngilîzî

**Puana IMDb:** 5.1

Bi saya Festivala Fîlmên Kurdî ya Global (LKFF), min fîlmê 'Qijika Reş' (Navê orijînal bi tirkî: Siyah Karga - 2016) temaşe kir. 'Qijika Reş' duyem fîlmêdirêj a M. Tayfur Aydın e. Fîlm, bi piştgirîya TRT û Wezaretê Çand û Turîzmê ya Tirkîyê di sala 2015an da; li Parîs, Stenbol, Batman, Heskîf, Bedlîs, Sêrt û Wanê hatîye kişandin û bi çar zimanî ye (kurdî, tirkî, farisî û îngilîzî). Fîlm di bin şert û mercên zor û zehmet da, di nava 6 mehan da hatîye kişandin û di sala 2016an da jî ketîye vîzyonê. Lê helbet wek hemû fîlmên kurdî û fîlmên serbixwe û hunerî pir kêr hatîye temaşekirin lê di hin festîvalan da rastî eleqeyê mezin hatîye û gelek xelat girtine.

### "Qijika Reş" bi çîrokekê dest pê dike

Fîlm, bi kurtasî behsa rêwîtiya vegera lîstikvanê jin ji Ewropayê bo welatê xwe Îranê dike. Derhêner vê vegeerê bi metafora qijika reş bi me dide ravekirin. Te dî, destpêk û dawîya her tiştî muhîm e. Hêjayî gotinê ye ku destpêka fîlmê gelekî xweş û çîrokî ye. Jixwe fîlm bi çîrokeke farisî dest pê dike. Di ekrana reş da, em dengê mêrikekî dibihîsin. Mêrik ji qîza xwe ra behsa çîroka qijika reş dike. Qijika reş, hêlîna xwe û malbata xwe diterikîne û ber bi welatê xerîbî û xurbetê ve diçe û li vir ji xwe ra dinyayê nû ava dike. Wek çîroka Samed Behrengî ya "Masîreşa Biçûk". Lê çîroka me di nîvî da dimîne, lewra Sara di xew ra diçe. Piştî çîroka nîvcomayî, li dewsa ekrana reş dîmenên rengîn xuya dibin û fîlm dest pê dike.

### Ya herî zor vegeer e

Sara Azadî (Şebnem Hassani-soughi) jineke 27 salî ye û li Parîsa paytexta Fransayê lîstikvanîya sînemayê dike. Li kafeyekê bi hevalên xwe ra rûniştîye, bi kêf û eşq in. Em dizanin, wê ev kêf zêde neajo û wê ken û kêf bibe girî û keder. Jixwe di dawîya fîlmê da jî em ê berovajê vê sehneyê bibînin. Sara li ber derê mala xwe rastî nameyekê tê. Malbata wê jê ra name şandîye. Bi tirs û endîşe nameyê vedike û dixwîne. Pê dihesse ku bavê wê nexweşê giran e. Di salona malê da afîşa filmeke Sara heye. Sara piştî nameyê dixwîne qirar dide, biçê Îrana ku berîya 10 salan ji bo xatirê xewn û xeyalên xwe yê sînemayê, ew terikandîye. Lewra Sara ji ber fîlmên rût û mistehcen ku tê da lîstîye nikare biçê Îranê. Sara li Stenbolê bi saya hevalekî xwe, Yilmazê (Aziz Çapkurt) ku rêberîya turîstan dike, dinase da wê bi rîya qaçax ji sînorê Bakur derbasî Îranê bike.

### Rêwîtiya vegeerê ya Sara û Yilmaz dest pê dike

Sara û Yilmaz ber bi Colemêrgê ve diçin. Em hîn dibin ku Yilmaz kurdekî ji Colemêrgê ye û ew jî wek Sara ji axa xwe dûr ketiye. Yilmaz ji hevalê xwe Mehmet Selim alîkarî dixwaze. Em dibînin ku Yilmaz jî wek bi hezaran kurd, kurdî fêr dibe lê nikare biaxeve. Mehmet Selim wan li gundê xwe dihewîne û wan bi qaçaxçîyan dide nasîn. Serê sibehê Sara, Yilmaz û Mehmet Selim bi qifleyê qaçaxcî û qantiran ra bi çîya û banîyên asê û talûke dikevin. Piştî rêwîtiyekê zor û zehmet ku car caran ji aliyê leşkerên tirk ve tîne gulebarankirin; axirê karwan digihîje nuqtaya qaçaxçîyan. Ji vir û şûnde karwan vedigere lê Sara bi rêhev-altîya Yilmaz û Mehmet Selim ber bi gundê xwe yê li Îranê diçe.

**Trajedîya Rojhilata Navîn: Hemû vegeer bi mirin û xemê bidawî dibin**

Dema Sara li gel rêhevalên xwe digihîje ser çîyayê gundê xwe bi farisî zêmareke dilşewat dilorîne. Fîlmê ku ji Ewropayê bi kêf û şahî dest pê kiribû, dema tê Rojhilata Navîn û rastê sînoren çêkirî û qedexeyên rejîmên totaliter tê; xwe li şîn, mirin, koçberî, feqîrî, belengazî, qaçaxçîtî û rastiya coxrafyayê dipêçe û me jî daxilê nav dike.

Êdî Saraya ku di 17 salîya xwe da terka mala xwe kirîye piştî 10 salan ji mecbûrî bi qaçaxî vege-rîyaye mala bavê xwe. Lê bavê xwe bi saxî nabîne. Xwişka wê ji ber mirina bavî, Sarayê sûcdar dike û laçikeke reş ya şînê dirêjî Sara dike. Sara diçe ser gora bavê xwe, şîna xwe digre. Dûra qijika reş ku di dema rêwîtiyê da car caran xuya dibe derdikeve û fîlm bi vî awayî bi dawî dibe.

### Çend gotinên dawî

Berî her tiştî ji hêla sînematoğrafik û estetîka hunerî ve fîlmekê baş û serkeftî ye. Lê tercîha zimanê îngilîzî û tirkî hinekê mesafe dixe navbera fîlm û temaşevanên kurd. Her wiha ji ber ku der-hêner zêde bi bayê dîmenên xwezayê ketîye û xwestîye nişan bide, çîroka xwe tam bi me nade hîskirin. Erê em daxilê nav atmosfera fîlmê dibin lê em ji çîroka karakteran bi zelafî zêde tişt hîn nabin.

Her wiha derhênerê fîlmê Tayfur Aydin wek di fîlmêxwe ya ewil ya “Rêç” (îz-2012) da dîsa li derdora mefhûmên “veger, mirin, xerîbî, bîyanîbûn û sînor” çîrok û fîlmê xwe saz kiriye û ji heqê der-hênerîyê hatiye. Ji aliyê van hêmanan ve fîlm hin klîşe û kodên sinemaya kurdî dihewîne û zêde nika-re jê rizgar bibe. Ji aliyekê ve temaşevanên kurd xwe di nav çîrokê da dibînin ji aliyekê ve jî çîrok ji wan ra xerîbî tê û ji derve lê dinêrin. Lê ez bi xwe jî êdi dixwazim di sînemaya kurdî da tiştên nû bibînim; mijar, karakter û çîrokên cuda temaşe bikim.

Li aliyê din di fîlmê da mirov rastî tesîra fîlmê Hiner Selîm ya ‘My Sweet Pepper Land’ (Welatê Min yê ji Îsota Şêrîntir - 2013) tê. Ev tiştêkî normal e. Herweha derhêner bi kuştina qantirekê silavekê dide nemir Yılmaz Guney û atîfê fîlmê wî yê “Yo” (Rê - 1982) dike.

Ezcumle, xuya ye derhênerê kurd Tayfur Aydin wê bi qabilîyeta xwe ya sînemayê fîlmên xweş û serkeftî bikşîne lê dibe ku ji sedî sed temaşevanên kurd tetmîn neke. Derhêner di hevpeyvînan xwe da bi me dide zanîn ku ew tim li pey çîrokên rê, xerîbî, bê welatîbûn, sînor û vege-re ye. Sînemaya kurdî yan jî sinemaya kurdan bi saya nifşê nû û nêrîna wan a li dinyayê wê kirasekê nû li xwe bike û zêdetir bikemile. Divê mirov hêvîdar be.



### Çavkanî:

- 1-[https://www.imdb.com/title/tt5588328/?ref\\_=ttfc\\_fc\\_tt](https://www.imdb.com/title/tt5588328/?ref_=ttfc_fc_tt)
- 2-Teasera fîlmê; [https://www.youtube.com/watch?v=Bc9g2o\\_TgtI](https://www.youtube.com/watch?v=Bc9g2o_TgtI)
- 3-Kurtevideoyeke li ser pişt kameraya fîlmê; <https://www.youtube.com/watch?v=tBQsYmmsJ0o> (Malpera Youtube ya bi navê Siyah Karga Fîlm)
- 4-<http://komplikedergi.org/tayfur-aydin-ile-sinemanin-izinde/>
- 5-<http://www.insanhaber.com/kultur-sanat/siyah-karga-yasak-lara-karsi-bir-film-h82886.html>



**Kûlîk**

[kulilksen@gmail.com](mailto:kulilksen@gmail.com)

## SIDIQ Û PILING/ 2019 RÊBER DOSKÎ

Fîlma *Rêber Doskî, Sidiq û Piling (Sidik and the Panther)* jî yek ji wan fîlmên Festîvala Fîlmên Kurdî ya Londrayê (London Kurdish Film Festival) bû ku li ser platforma Global Kurdish Film Festival hat nîşan dayîn. Ev fîlm ji sê belgefilmên *Rêber Doskî* ye ku di sala 2019an da hatiye temam kirin û di heman salê da li *Festîvala Belgefîlmên Amsterdamê ya Navneteweyî (International Documentary Film Festival Amsterdam)* xelata “belgefîlma herî baş” hilgirtibû. Fîlm li ser lêgerîna serlehengê fîlmê Sidiq ya pilingekî ye ku tê zanîn wextekê li Çiyayên Kurdistanê hejmara wan pilingan zêde bûne. Temamê fîlmê jî xeynî çend sahnayên kurt, li sirûştê hatiye kêşandin. Em di fîlmê da çend çîroka Sidiq ya şexsî bibînin jî, di eslê xwe da ew çîroka têt vegotin tenê sîtavek e ji rastiya ‘gelekî’.

**“Hebûna Pilingê Parastina Welatê Me Ye.”**

Sidiq bi gotina bavê xwe ya hêj wextê ew zarok bû, jê re gotîye, bawer dike ku li çiyayên Kurdistanê piling dijîn. 25 sal e hizra wî ew e, pilinga têt zanîn ku koka wê ber bi qelînê ye, bibîne. Ew ne tenê li dûv pilingekê ye, di heman demê da sirûştê Kurdistanê jî diparêze. Di fikra da dibêje: “Em wek mirov dikarin hêj gelek tiştan ji sirûştê fêr bibin”. Car caran rastî nêçîrvanekî têt destûr nadetê zerarê bide heywanên kûvî. Ji nêçîrvan re dibêje: “Ev cih bapîrên me parastine û dijminên me xirab kirine, divê em dîsa biparêzin.” Carcaran jî rastî kesên êzingvan têt û ji wan ra qala giringiya daran dike. Sidiq, di derheqê sirûştê da serwext û zanyar e. Bilindayî, cûreyên heywanên kûvî û giyayên li derdorê baş nas dike. Li gor wî heger hebûna pilingekê li Kurdistanê bêt piştrastkirin hingî dê li ciyên piling lê dijîn, hilgirin bin parastinê û li Kurdistanê jî dê “National Park” (Parka Neteweyî) hebe û bi vî awayî êdî dijminên Kurdistanê nikarin Kurdistanê bombebaran bikin, şer bikin û dê li Kurdistanê şer xelas bibe. Rastî kî tê pîrsa pilingê lê dike lê herkes tenê bi galegotan agahiyan didin wî.

**“Dostên Kurdan Tenê Çiyayên Kurdistanê Ne.”**

Gotineke pêşyan ya kurdan e, ji ber rabirdûya wan ya bêdewlet û ji bo jiyana wan ya bê hevbendên dilsoz ya li Rohhilata Navîn hatiye gotin. Ev gotin ji bo Kurdan hestên xiyaretê, terikandin û tenêtiyê îfade dike. Çi tiştê aîdê Kurdan be yan hatiye wêrankirin yan jî hatiye guherandin. Di vî gotinê da “çiya” him metafor e, em dikarin bibêjin dîsa kurd bi xwe ne. Him jî rastiyeke ku bi zehmetî têt xirabkirin. Kurdan her tim xwe spartine çiyayên xwe, her tim baweriya xwe bi çiyayên xwe anîne. Bi vî



awayî em dikarin pilingan ku êdî li ber qirbûnê ne, çendekê ji wan li çiyayê Kurdistanê mayîne, bişibînin kurdan; ew jî ji zulmê reviyane, ewan jî xwe spartine çiyayên Kurdistanê.

**“Heger mirov rêzê li sirûşt û heywanan bigire dê çêtir bikare rêzê bo mirovan jî bigire.”**

Ji destpêka filmê heta dawiya filmê hêviya Sidiqê ya dîtina pilingekî qet xelas nabe. Ji aliyekî din ve li derdorê tunebûna kesekî wekî Sidiq, em bi bêhêviyê dihesin. Di sehneyekê da Sidiq û du zarokên wî di erebê da ne. Sidiq erebê diajo, ji aliyekê ve jî li derdorê dinêre û behsa xweşiya sirûştê ji zarokên xwe re dike. Di destên her du zarokên wî da telefon, lîstik dilîzin û hay ji gotinên bavê xwe nabin. Tenêtiya Sidiqê ya di her derê filmê da heyî, em herî zêde di vê derê da dibînin. Her du zarokên wî girîngî bi gotinên bavê xwe nadin. Tenêtiya Sidiqê ne ku ji ber tenê haya wî ji pilingê heye û tenê ew li dûv pilingê ye, ew herî zêde ji ber pirsên xwe yên bêbersîv, gotinên xwe yên bertek lê nayê nîşan-dayîn tenê ye. Rêber Doskî hêviya lehengê xwe ewqas xurt nîşan daye ku haya mirov zûbizû ji tenêtiya wî nabe.

Derhêner Rêber Doskî, bi çîroka yek kesî him bîra gelekî him jî mirazên gelekî yên salan, nîşanê me bîneran dide. Rêber Doskî bi dîmenên filmê yên bêhempa û bi diyalogên rasteqîn yên serlehengê filmê li gel lehengên ku rastî wî tên dike, rê li ber gotinên weha digire: “Çendî ji wan tiştan hatîne jiyîn, çendî ji wan rast e?” Ji aliyekî din ve em bi dîtina sirûştê Kurdistanê ya nûwaze ya ku li kêma ciyan mirov dikare bi hev re bibîne pîrsa “Çawa dibe ku li ciheke wisa şer çêbûne?” dikin yan jî ihtîmala “wextekî şerek li wî derê bûye” zûbizû nayê hişê me. Ji ber ku behsa şerekî têt kirin, mirov dizane şerek li wan deran bûye lê em ne dîmenekî şerê dibînin ne jî rastî tesîrekê şerê tên. Derhêner, rastiya jîyanê ya em zêdetir ji aliyê wê yê gûherbar bi rastbûna wê ewle dibin, bi vî awayî nîşan dide.



Em bîner hînî bûne, divê em trajediyê ji dîmenên trajîk bibînin ku em bi zor bawerîya xwe bi vî tiştê bînin. Di filmên trajîk da yan bûyer bixwe di nav herka filmê da rasterast trajediyê nîşanê dide, yan jî wek ku di rabirdûyê da bûyereke trajîk bibe wek sahneyeke xeyalî têt nîşan dayîn. Di vê filmê da tenê di sahnayekê da çend jinên kurd cilên reş li xwe kirine, mirov dizane li ser goristana kesên di Komkujiya Enfalê da hatîne qetilkirin dilorînin. (Em di filmên Rojhilatê Kurdistanê û di filmên Başûrê Kurdistanê da gelekî rastî “lorandinda li ser goristana miriyên di komkujiyan da hatîne qetilkirin” tên.) Kêma film hene ku trajediyê bêyî dîmenên rasterast trajîk lê bi peyamên watedar bikaribe behs bikin. Ev film jî ji wan filmên biserketî ye, li dûrî ajîstasyonê ye. Bêyî ku bûyerekî rasterast nîşanê bide û behsa wê bike, çîroka xwe digihîne me.

Nîşe: Jîndenasa Kurd Hana Raza, di sala 2011an da bi dîmena pilingekî nîşan da ku li Çiyayên Kurdistanê piling heye, ji wê demê ye ji bo dîtina alîkariya fonê hewil dide. Yekîtiya Navneteweyî ya Parastina Xwezayê (IUCN), di Lîsteya Sor da piling (panthera pardus saxicolor) wekî nîşana wan qeliyayî nîşan kiriye. Li gorî Yekîtiya Navneteweyî ya Parastina Xwezayê (IUCN) piling (panthera pardus saxicolor) wek bêparêzî têt hesibandin û hejmara wan li ser rûyê cîhanê kêma dibe. Yekîtiya Navneteweyî ya Parastina Xwezayê (IUCN) di derbarê Başûra Kurdistanê da, “li gorî dîmenên hatine tomarkirin hejmara pilingan ya kêma, bi warê koyistana Kurdistanê sînordar e.”



**Wedat Ermîş**  
wedatermish@gmail.com

## HEZAR Û YEK ŞEV

FÎLM:  
KURDÎ/ÇEKIRÎ/17'/2020

DERHÊNER Û SENARYO  
**MAHSUM TAŞKIN**

DERHÊNERÊ DÎMENÊ  
**SEMIH YILDIZ**

MUZÎK  
**İLAYDA ÜRKMEZ, BERFU ÇETİNKAYA**

DENG  
**İLBEY KAYA**

LÎSTÎKVAN  
**BARTU OSMAN TUĞRAL, HATICE TAŞKIN,  
RIDVAN SEVİM, ÇERKES KARADAĞ,  
DENİZ BİLİR**

Fîlm di ser cihana zarokê ra bi awayekî nûjen, *Çîrokên Hezar û Yek Şevê* dixê kadraja xwe. Çîroka dîrokî, karaktere fîlm Seyidxan diqê nava xwe û ji ser van çîrokan çîroka wî dest pê dike. Ji xwendîna rezêpirtûkan bi yekê Seyidxan dikeve rêwîtiyê û êdî çîrok jiyana wî ronî dikin. Dikeve pey çîrokên din û derî bi derî ji bo pirtûkên din bi dest bixe li hevalên xwe digere.


Di nava atmosfereke çîrokî da fîlm bi pêş dikeve. Mekanên fîlm û ronahiya fîlm vê atmosfera çîrokî bi sînematografiyê serkeftî xurt dike. Karakterên fîlm bi piranî zarok in û ew zarok di nava halê xwe yê xwezayî da hatine dayîn.

Ev xweza ji aliyekî tevgerên zarokan ji aliyekî din pêvajoyek psîkolojîk îfade dike. Zarokên di gund da dijîn bi axaftin û pevçûnên xwe li gor taybetiya xwezaya xwe û jiyana gund tevdigerin. Tekiliya zarokan ya bi hev ra û ya bi malbatan re, acizî û kêfa wan bi zelalî û ji çavê zarokan tê dayîn. Ev nêrîn karakterên gelekî xurt, derdixê pêş me.

Pêvajoya psîkolojîk pirtir xwe li ser Seyidxan dide der. Seyidxan ji ber mekteba wî girtiye di mal da ye. Di nava şertên gund da tiştêkî pê dakeve tun e. Pirtûka ku dixwîne jî, di destpêkê da ji aciziyê dikeve destê wî. Piştî xwendina pirtûkê êdî tiştêkî din nafikire. Ne denge girî, ne xeyda diya wî ne li ser bala wî ye. Li derdora wî hayê tu kesî ji wî tune ye. Ji bilî Seyidxan her kes ji serî heya dawî weke xwe dimînin. Guhertin û tevger li ser Seyidxan pêşdikeve. Aciziyê wî ya li gund bi vê riya çîrokî bi meraqêkê pêş dikeve û rêyekê jê ra vedike. Zarokê û sînore xeyalkirina wî û bandora vê xeyalkirinê ji hêla rastiye û bi awayê xwe yî psîkolojîk gelekî serkeftî hatiye dayîn.

Dawiya fîlm dîsa weke sahneyêkê ji çîrokan e û temaşevan di vir dibe guhdarvanek. Tevgera karakter bi tevgera fîlm ra dibe yek û Seyidxan di heman demê da dibe wek karakterekî çîroka Hezar û Yek Şevê û êdî hûn ji kîjan çîrokê bixwazin ji wir deng dide: "Ez bixwînim jî ez newxînim jî ez ê bimrim."

Ev kêfî çîroka rastiye, rastiya çîroke, çîrok û rastiye tevlihev dike û dide fikirîn...





Rojîn Aslan Vesek  
rojinke@gmail.com

## XEWNÊN BÊRENG HEWNO BÊRENG (2018)

“Hewno Bêreng” bi derhêneriya Mehmet Ali Konar di sala 2018an de di gelek mîhrîcanan de xelat standîye. Bûyerên ku di salên 90î de li Amedê qewimîne, bi çavên zarokêkî, bi zimanekî nerm, bi rêya xewnan, bi şêwazeke hunerî vedibêje. Nivîskarê senaryoyê jî Konar e. Weke gelek filmên kurdan, di nav derfetên dijwar de û bi pereyekî kêr hatîye çêkirin. Lê ya rastî Konar ji bedêla slogan û ajîstasyonê, bedêla qîr û hawarê, bi awayekî estetîk, bi bêdengî, êşa di nav civaka kurdan de anîye zimên.

Çîroka Mîrza, ji gelek kesên ku di wê serdemê de jîyane û zarokatiya xwe di nav şer de winda kirine re, dê nas be. Dîya Mîrza hatîye kuştin û hê jî Mîrza di bin bandora mirina dîya xwe de ye. Xewnerêkan dibîne, bêdeng e, bi tenê maye û dêrîyên dilê xwe ji tu kesî re venake. Heta ku Mîr Ehmed tê û çend rojan li mala wan dimîne. Ew dixwaze hevaltiya Mîrza bike û

dike jî. Lê Mîrza di tîrsa xwe ve derdikeve û Mîr Ehmed jî tê kuştin.

G. C. Spivak, di gotareke xwe ya bi navê “Ma bindest dikarin bipeyivin?” de wisa dibêje; “Yên bindest di rewşeke wisa de ne, ewqasî hatina paşguhkirin ku êdî nikarin bipeyivin.” Yên ku pirsgirêkên bindestan bi lêv dikin, bêhtir yên ku ew trawma ne jiyane, lê tenê guhdariya wan kirine. Ji ber vê yekê yên li ser bindestan hatine gotin, wan ne li ser navê xwe û ne bi dengên xwe gotine. Ew, bi dengê dewletan, desthilatdar û rewşenbîran tîn bihîstin. Wextê em di sînemayê de temsîlkirina bindestan dibînin, ev rewş di gelek filîman de tê dîtin. Derhêner Konar jî, di nav rewşa bindestiyê de mezin bûye. Ew jî yek mexdûrê wê demê ye. Di hevpeyvîneke xwe de wisa dibêje; “Xala destpêkirina film bîranînên zarokatiya min a polîtîk û tarî ne. Ya ku min dît, ya ku min bihîst, ya ku hat axaftin. Piştî ev bîranîn, her çiqas sal di ser re derbas bibin jî, wek baranekê bi ser we de dibarin”. Em dikarin bibêjin çîroka filîm, ne ji aliyê kesên din ve hatîye vegotin, ev dengekî yê bindest bi xwe ye.

Ji ber ku sînema bideng e, bi bêdengiyê jî dîkare wateyekê biafirîne. Li gor Bela Balazs, ti hûnerên din nikarin bêdengiyê hilberînin. Hûnerên wekî wêne, resîm, heykel û herwekî din ji hebûna xwe ve bêdeng in. Ji ber vê yekê wateya bêdengbûna wan jî tune ye. Lê di sînemayê de bêdengî, carinan ji dangan bêhtir bandorê li ser temaşevanan dike. Michel Chion di pîrtûka xwe ya bi navê “Audio-Vision: Sound on Screen” de dîyar dike ku bêdengî tu carî ne valahiyeke bêalî ye. Ew dibê sedema xurtkirina wateyê. Di filîma Konar de jî bêdengî ji bo avakirina wateyê hatîye bikaranîn û bandora wê jî ji dangan bêhtir e. Derhêner bi bikaranîna bêdengiyê xwestîye ku cîhana hundirîn a zarokêkî ku maxdurê kuştineke polîtîk e nîşan bike. Di film de bêdengî, ne “tunebûna deng” e, hebûna bêdengiyê, temsîla travma û windabûnê dike. Ji me re qadekê vedike ku em leheng fam bikin. Bêdengî di ravekirina travma, windahî û şînê de wekî nêzîkatiyeke estetîk hatîye pejirandin û bûye beşek ji şêwaza vegotinê.

Ji aliyê şêwaziyê ve plana kamerayê ya herî nêzîk (Extreme Close Up), ku ruyê Mîrza gelek caran tevahîya çarçoveya ekranê tijî dike û bi vî rengî dixwaze her kêlîya dubarekirina travmaya di hişê wî de, êş û tîrsên di dilê wî de, bêewlehî û parçebûna di jîyana wî ya rojane de, tenêtî û bêçaretîya wî derbixe pêş. Em dikarin bibêjin ku her çiqas tecrubeya wî ya yekem a lîstikvanîyê bê jî Civan Guney Tunç, rihek daye karakterê Mîrza. Em di rûyê Mîrza de, cîhana wî ya hundirîn, hestên wî yên veşartî, tenêtî û tîrsên wî “dibînin”.






Di fîlm de bikaranîna nivîştan jî xaleke balkêş e. Mîrza ji bo ji xewnên tirsna xwe rizgar bike, çend caran diçe cem Seyda û nivîştan didê girêdan. Lê xewnên wî bi dawî nabin. Rojekî dibîne ku nivîstek bi stuyê her zarokê ve ye. Em fam dikin ku ev ne tenê xewn û tîrsa Mîrza ye û di dilê hemû zarokan de heye. Nivîşt, her çiqas semboleka olî ya di nav civatê de bê jî, di fîlmî de tîrsa dilê zarokan û hêvîya rizgarbûna ji xewnên reş temsîl dike. Bi rîya sembolkirinê çîroka şexsekî, dibe çîrokeke kollektîf.

Ger Dîya Mîrza ji sedemên asayî miribûna (wek nexweşî, qeza, bi emrê Xwedê û her wekî din) dê Mîrza şîna diya xwe kiriba û piştî demekê êşa wî ber bi sivikbûnê ve dê biçûya. Lê ji ber ku mirina dîya wî ji sedemên polîtîk, di nava hawîrdorê tundîyê de û ji sebebên ku bi nêrîna zarokê dê neyê famkirin qewimîye, hestên Mîrza ber bi xerabîyê ve çûne. Em di karakterê Mîrza de ji şîngirêdanê bêhtir, nîşaneyên pîştî travmayê dibînin. Wek bêxewî, dîtina kabûsan, bîranînên bûyerê, tîrsa ku dê bûyer dîsa biqewime, zûhêrsbûn, nekarîna plansazkirina pêşerojê, biyanbûn (hesta ku kes min fam nake), rewşên ku bûyerê tînin bîrê, nerehetbûn û dûrketina ji van rewşan û hwd 1. Derhêner û senarîst Konar, di avakirina şexsîyeta Mîrza de, vê bûyerê bi awayekî pêşketî dihûne. Di fîlmî de, ev bêdawîbûna nîşaneyên travmatîk, bi kêmasîya şexsîyetên jinan ve jî giredayî ye. Behsa şeş xwuşkên wî tê kirin lê em tenê yekê ji wan di dîmeneke kin de dibînin. Ne birayê Mîrza, ne mamosteya wî, ne cîranek, ne hevalek, ne jî nasekî wan serê xwe jê naêşîne. Lê em dibînin ku Mîrza, bi kedekê biçûk, dilê xwe ji Mîr Ehmed re vedike. Ew jî li benda eleqeyek û xwedîderketinekê ye. Li gor birayê xwe divê mezin bibe û li gor bavê xwe piştî demekê dê êşa xwe ji bîr bike. Lî derdora Mîrza de, tu kes tune ye ku wî bi hezkirina dayikekê biparêze û wî di ber singa xwe de haş bike. Em di fîlmî de ji xeynî dibistanê, bi du cihan rastî jinan tînin. Yek ji wan xwuşka Mîrza ye ku li ser gora dîya xwe yasîne dixwîne û ya din jî piştî kuştina Mîr Ehmed, jin kom dibin û bi hev re dua dikin. Di her du kêliyan de jî jin napeyivin û şîne dikin. Jin û şîngirtin, bihevre hatiye giredan. Belkî senarîst bi zanebûn cih nedabê lehengên jin lê ya rastî di fîlmî de kêmasîya şexsîyetên jin gelek tê hîskirin.


Di dawîya fîlm de tu pîrsgirêk nayên çareserkerin, bi ser de trawmaya leheng dubare dibe. Di dîmena dawî de, wek dîmenên xewnê, dengên derdorê qut dibin, dîmên hêdîka diherikê, em tenê dengê bêhna Mîrza dibihîsin, lê Mîrza ne di xew de ye. Em weke temaşevan dizanin ku

çîrok li vê derê bi dawî nabe û bi vê rastiyê re rûbirû dimînin. Derhêner bi zanebûn, dawîya çîrokê nade û dixwaze temaşevan li serê bifikirê. Ji ber ku dawîya çîrokê nehatiye dan, heke em ji aliyê şeweyî(formal) ve li fîlm binêrin, avahiya vegotina klasîk û ji ber xewnan jî, vegotina lîneer ya demê hatiye şikenandin. Di fîlmî de her çiqas di dîyaloga xwe ya yekem de Mîr Ehmed ji Mîrza re dibêje “biqîre” jî, Mîrza heta dawîya fîlmî bêdeng dimîne. Fîlm bi bêdengîyê dest pê dike û ji ber ku sedemên bêdengîyê hê jî li holê ne, bi bêdengîyê diqede.

Di tevahîya fîlmî de re-wşeka tarî û kaotîk berbîçav e. Kuçeyên teng yê Amedê, “lîstika Qertelan”, mêrên rûnuxwumandî û cilreş, nivîşt, xewn û kabusên Mîrza, dengê teyareyan ku ji ezmanên Amadê kêm nabin, mamosteya dilbikîn, perwerdeya zimanekî biyanî, kilamên şîne û hwd. atmosfereka dîstopîk ava dikin. Bikaranîna kameraya mila û çarçoweyên lerizî, ronahî û cîhên xwezayî, jiyana rojane ya mirovên asayî, cil û bergên sade, li dijî vê atmosfera dîstopîk, têgihîştina rastiyê li fîlm zêde kiriye. Ji ber ku derhêner derdê xwe ji dîyalogan bêhtir bi dîmenên nîşanî me dike. “Hewno Bêreng”, zimanekî gerdûnî afirandiye ku yê ji xeynî Kurdan jî dikarin çîroka Mîrza fam bikin.







**Bawer Marûfî**  
[ezbawerim@protonmail.com](mailto:ezbawerim@protonmail.com)

## KÎ DIKARE MAR RIZGAR BIKE? REXNEYEK LI SER FÎLMÊ “HÊVÎ” (1970) YA YILMAZ GUNEYÎ

Nivîskar  
 Behmen Xalidî

Wergera ji Farisî  
 Bawer Marûfî

[ezbawerim@protonmail.com](mailto:ezbawerim@protonmail.com)

Çavkanîya nivîsê:  
 Malpera edebî-çandî ya Amaje  
<https://amazhe.com>  
 October 11, 2018

*Hêvî* (1970), çîroka jîyana faytonvanekî bi navê Cebare ku ew bi zehmetî debara xwe dike û li malbata xwe dinêre. Ev film ji sînemaya neorealîstîyê tê û bi şewaza fîlmê Dizên Duçerxeyê (Vittorio da Sica) ye ku behsa rastîyên jîyanê ya çîna hejar ya civakê dike. Lêbelê di *Hêvî* da kurê Cebare nikare ji zarokên dewlemend duçerxeyê bistîne û duçerxe diçe alîyekê. Cebare betal û bêkar dimîne, her karî dike da ku bibe xwedî pere. Çavên wî li çend hêvîyan in: Hêvîya qezençkirina di piyangoyê da hêvîya bi 2.5 lîra pereya siwarkirina rêwîyan, hêvîya bi hebûna xwedayan ku di dawîyê da di bin erdê da dê xezîneyekê bidin wî.

Kurê Cebare dixawaze li duçerxeyê siwar bibe lê ji bo kirêkirina wê divê pereyê wî hebe. Fayton Kevin bûye û êdî tu kes li wê siwar nabe. Dewlet çûn û hatina faytonên Kevin qedexeyê kirine. Ji ber vê yekê, dema ku erebeyek li hespê faytona Cebare dixê, polîsan dilê xwedîyê erebeyê yê dewlemend naşikîne û faytonvanî davêje derve û polîs dibêje: ya rast te êrişî wî kirîye. Tu kes naxwaze deynekê bide Cebare ji bo stendina hespekî nû. Yên din jî ji bo stendina deynên xwe yên berê jê ra dem destnîşan dikin. Yên deyndayî faytona wî difiroşin. Lê belê Cebare her roj di piyangoyê da pey nesîb û şansê xwe diçe; û her roj di rojnameyê da li hejmara bîlêta xwe digere da ku bikaribe rojek ji rojan malbata xwe bextewar bike.

Dema ku vedigere malê, pereyê xwe dide jina xwe da ku bi wê pereyê, rewşa malê îdare bike. Pereyê berîkê jî dide keç û kurên xwe. Dema ku jina wî jê ra dibêje: tu qet wekî mêrekî li zarokên xwe naxî. Ew jî li hemûyan dixê da ku dilê tu kesî neşike. Zarokên wî dibêjin; yadê êdî nikare li me bixê, çimkî ew jî li dayika wan dixê. Lê belê Cebare tenê diwêre yê ji xwe bêhêztir; li dizekî ku dixwaze pereyê wî bidize dixê. Lê dema ku ew bi xwe çekê radike û diçe dizîyê, direve da ku lê nexin. Cebare di malê da xwedî bawerîyên xeyalî ye jî. Ji jina xwe ra dibêje; çêr û sixêfan li zarên me neke, li şûna wan tu yê bimirî. Jina wî dibêje; 16 sal in ku min rojêke xweş nedîtîye. Cebare dibêje; rojêkê em dê dewlemend bibin. Em dê xwarinên xweş bixwin û cilên xweşik li xwe bikin.

Hesen ango hevalê Cebare dibêje; xezîneyek di bin erdê da ye, em pereyekî bidin Mele da ku cihê wê ji me ra bibêje. Cebare di dawîyê da carek jî dil dide hêvîya Hesenê. Mele neynikekê datîne ber kurê biçûk yê Cebare yê bi navê Mihemed Emîn, û jê dipirse, dibêje; tu çî dibînî? Zarok, wêneyê xwe di avê da dibîne û digirî. Cara duyem keça wî li neynikê dinêre û tişt û miştên nav xanîyê di nava ava wekî neynikê dibîne: hesinek, sîrek, pêlava zarokan, nalek. Hemû tişt û mişt rastî




niha dibin ku hêmayên cihê xezîneyeke xeyalî ne. Fîlmê realîstî rêya xwe dide xewn û xeyalan. Wêneyê hundirê neynikê di rastî da reng vedide û Cebar nîvê şevê erda nav mala xwe vedikole. Xewn û xeyal ewqas tîn nav rastîyê ku ew her tişt wekî seraba xezîneyê dibînin.

Dema ku karê wan nameşe ji xewna xweş ya xezîneyê vedigerin rastîya tehl ya jîyanê, dibêjin; şeytan hişê me (xewna me) tevlihev kirîye. Cebar 40 lîreyan dide jina xwe da ku heta 10 rojan, jîyana xwe bimeşînin. Û sê kes diçin cihekî qaşo ji bo medîtasyonê: Robarê Cîhanê, cihekî di navbera du piran da li rex dareke ziwa, di bin kevirekî spî û kevirekî reş de. Cihekî ku di nav robarî da paqij bibin, Mele duayek dixwîne û dibêje heger xezîne heft qat di bin erdê da be jî, em dê wê peyda bikin. Cebar bîreke mezin dikole û dema ku kevirekî mezin di nav da dibîne, wisa dihizire ku ew xezîne ye. Heta dema ku Mele dibêje; agahdar bin belkî xezîne xwe biguherîne ser şikla gêrîk, balinde yan jî marekî lê bixin, ew dê piştê bibe zêr û bikeve erdê. Cebar goreke fireh dikole û piştê, marek dibîne û zû bi zû wê dukuje da ku bibe zêr. Dema ku film diqede Cebar bi çavên girêdayî li derdora xwe dizîvire; yanî hê dev jê bernedaye.

Cebar û hevalên wî sefer dikin hundirê wêneya di nava avê de. Dîmenek ji rewşa xefetbar ku kapîtalîzm pêşkeşî me dike, wêranşarek di dahatûyê da cihek ku Fredric Jameson jê ra dibêje, piştî neynikê (1). Neynik, pêşandera kareke demî ye û dewama wê tune ye. Weke wê demê ku heger mirov çavên xwe nêzîkî neynikê bigire, feza dê sînordar be, mirov dê tu asoyekê nebîne (2). Sergei Eisenstein digot: Her derhênerê ku bixwaze filmeke karkeran çêke di pêngava yekemîn da divê rengvedanên sûdbexş yên mercdar ku bi armancên civakî yên diyarkirî yên pola karkerî ra hevaheng in, bide nasandin. (3) Belkî dema ku Cebar û hevalên wî ji rê veşeriyên, bikaribin rengvedana vê fezayê ji karkerên din ra vebêjin: kuştina marê (cinawira lîstikê) dê dîsa te bîne destpêka çîrokê, tu kes nikare mar rizgar bike, xîncî mar. Lêbelê mar, heke dar nexî nava hêlîna wê, dê te rizgar bike. (4). Hêlîn weke birîn nikare li hemberî merhema weke mar gelek ber xwe bide. Araste li vir girîng e, ew yê ku hetanî bîrê diçe, dê riya veşerê jî bibîne. Ne girîng e ku kesek heta kengê li piştî neynikê bimîne ya bi kuştina marê ra mijûl be. Ne girîng e, çi qas xwe mijûlî lîstikê sermayedariyê be, di encamê da rojek dê biweste. Lêbelê rojek ku êdî derfeta şaşkirinê nemaye; belkî niha êdî malbata Cebar ji birçîtiyê miribin (5).

Di hêmayên di destpêka fîlmê da em tabloya bankayekê dibînin ku Cebar ber bi wê diçe (û mîz dike). Her roj serê sibehê ku Cebar ji xewê radibe, li hejmarên piyangoyê dinêre da ku bibîne gelo di nav çend milyon kesan da tiştek qezenckirîye. Lîstik hertim bîletên xwe erzan difiroşe ji bo ku agirê hêvî di dilê beşdaran da ronî bihêle. Lîstik îmkana qezenckirinê derdixîne holê ne girîng e ku bi milyonan kes ne serkeftî bin, girîng ew e ku kê dê qezenc bike. Kesê/a ku li derveyî lîstikê ye, qezenc dike. Lîstik weke qulek, dawîya wê heye, lêbelê ne ji pêxwasan ra ku hertişt bê serên wan jî, dîsa ew yê bibêjin: di rastî da qezenckerê rastî em bûn çimkî me bi qedera pedivî lîxist. Pirsgirêk qet ne qul e, lêbelê qul bi wate 75 0,3, ya cihê vala ya tiştekî ye. Tiştek ku ne di cihê xwe da ye. Tişteke hatîye dizîn ku divê li ciheke din bê dîtin.

Weke ku Cebar di nava hejmarên milyonî yên piyangoyê da winda bûye. Ev civak ne hevgirtî ne. Ev civaka milyonî bi hev re pêşbirî û şer



dikin. Lê dîsa hêviyê xeyalî wan razî dike ku her yek ji wan bi yê din ra cuda ye, weke Antonio di fîlmê *Dizên Dûçerxeyê* da ku li du xewnên xwe yê takekesî ye (6). Di navbera fîlmê *Hêvîyê* da Cebar ala tirkî xistiye ser milê xwe û diçê nav xwepêşandaneke li dijî bêkarîyê û bi yek xwepêşandaran ra dibêje ku ew yê tevli wana nebe ji ber ku hespa wî mirîye, lê bi wê alê ra hevgirtin kirîye. Ew tiştmiştên mala xwe difiroşe da ku bikaribe peryê Mele bide, lê çeka xwe nafiroşe, û em di berdewama fîlmê da dibînin ku wê tije dike û bi hin keran ra diçe şerê cinawir û perîyan.

Belkî dîtina xezîneyê hêncet- eke nû be da ku di navbera cîranan da şerekî nû çêkin. Weke wê koma sê kesî di fîlmê *Xezîneyên Sîramadre* (John Huston, 1948) ku piştî vedîtina zêrê ew li hev û du dixin. Himahîma di hemû berhemên Guey da helperistiya cîranan dibînin. Ew her karî dikin da ku xisarê bigihêjînin cîrana xwe. Di nav vê fîlmê da yek ji cîranên Cebarî dibêje: heke peryê deynê nede, em dê çi bikin? Yê li rex wî dibêje: Em yê keçika wî bistînin. Güney, tometa nezaniyê li wana dide. Di dîmenekî da em, Cemîleyê,

keçika Cebar di pola îngilîziyê da dibînin ku dersa xwe baş nizane. Û mamoste dîsa jî bi zimanê îngilîzî jê dipirse ku çima îngilîzî nizane. Ev îngilîzîaxivîna di nav filmê da hevsengiyê wê heye: dema ku Cebar û Hesên dixwazin bi sîlaheke boş êrişî mêrekî biyanî dikin ku pereyên wî bidizin. Mêrê biyanî dipirse hûn çi dixwazin û ew nikarin bersiv bidinê. Mixabin wisa dixuye ku zêdetir ji her tiştî bawerîya wî bi hebûna pereyê ra heye, û wisa hizir dike berîka wî qul e (7). Ev pol dizan nabîne û nizane çawa bi wan ra biaxive: berîka vala yanî berîka tije di ciheke din de.

### Çavkanî û baldarî

Binêrine

Jameson, Fredric (2005), *Archaeologies of the future*, Verso press, p. 73.

Binêrine

Lacan, Jacques (2017), *Ezterab*, Wergerandina Seba Restigar. *Weşana Taban*, Rû, 102.

Eisenstein, Sergei (1981), *Pejûhêşî der Tarîxê Sînemayê Şûrevî*, Wergerandin û Berhevkarîya Ehmed Zabitî Cehrumî, *Weşana Gosterde*, Rû, 228.


Em rewşeke din ku dişobe vê rewşê di çîroka "Di Yasayê de" ya Kafka da dibînin: Mêrik ewqas li ber derî li bendê dimîne ku kêzik tên bal wî. Parêzerê derî di dawiyê da dibêje ev derî ji ber wê yekê hatibû çêkirin da ku destûra hatine hinurê nedin te.



Heneka Churchill hat bîra min ku digot "Amerîka hertim karê baş dike, lê mixabin dema ku êdî tu bijadeyeke din li holê nemabe".

Ji bo gotareke têrûtije derbara fantaziya takxwazî di sînemaya neorealîstî da binêrine:

McGowan, Todd (2015), *Negahê Vaqeyî: Nezeriyeyê film piştî Lacan*, Beşa 15: Xwasta siyasî di neorealîsma îtalî da Wergerandina Behmen Xalidî, *Weşana Merkez*.

Peyva Pocket him wataya berîkê dide him jî gel û xelk.






# NIRXANDIN



**Yilmaz Ozdil**  
yilmazozdil@gmail.com

Wekî akademisyenêkî şarezayê sînemaya kurdî, ez gelekî pê kêfxweş û serbilind im ku ji bo nasîn û berbelavbûna sînemaya kurdî karekî wisa berfireh û rêk û pêk hatiye kirin. Bi taybet di vê merheleya dijîtalîzasyona sînemayê da ev karê îsal LKFFê (Festivala Filmên Kurdî ya Londonê) kirî, nîşan dide ku sînemaya kurdî jî dikare li ser platformên dijîtal, cih û bazara xwe peyda bike, çinku bikir û hezkiriyên filmên kurdî gelek in. Bes wekî derhênerêkî kurd, hinek rexneyên min hene. Berî her tiştî, ez bawer dikim ku pêwîst e LKFF û festîvalên din yên kurdî li ser xeta û kêmasiyên xwe bêhtir bifikirin. Bo nimûne di mijara hîlbijartina endamên juriyê da û nirxandina filmên beşdar da lazim e bi taybet LKFF politikaya xwe şefaftir bike. Bi gotineke din pêwîst e ku LKFF hinek krîterên estetîk destnîşan bike û wan pîvanan di rêzîknameya xwe da jî eşkere bike. Çinku xuya ye ku hinek endamên juriyê yên ku di wan salên dawî da "li ser navê LKFFê" filmên kurdî dinirxînîn nikarin xwe ji îxtîras û hevrikiyên takekesî bişon û bi çavekî hunerî û bêteref li filman binêrin. Ez di wê baweriyê da me ku şertê yekem yê amadekirina festîvaleke global ji bo sînemaya kurdî, pîvan

û nirxandina filmên kurdî li gorî krîterên estetîk yên beynelminel e; ne li gorî vizyon û hesabên şexsî yên hinek endamên juriyê. Bes li gel wan hemî kêmasiyan jî ez destxweşiya kedkarên wê festîvalê û hemî festîvalên din yên kurdî dikim.



**Selim Temo**  
selimtemo@gmail.com

Filmên me tune ne, bel-gefilmên me hene...



**Keywan Fahîmî**  
keywanfahimi57@gmail.com

Wîprayê destxweşî le beprîobeharîni fîstîwaly nawnetewîyî fîlmî kurdî leneden (f k l). Dîyare (f k l) wek yek le kewterîni fîstîwale sînehemîyehî kurdîstan bîxw û grîngî tîyehî hîyeh. Behşdar boon

leho fîstîwale bo zûrîyehî sînehemîkaranî kurdî şanazîyehî wê behşerkewetîkî mehîzî dadehîni. Tîstîpash 12xwîly behîrîyehî çoon le mahîy 20saldî kâtî nehewehatwewehendîk laiyehî grîngî le (f k l) leber çaw bîgrîni. Kâtî nehewehatwewefîstîwaly karyîgerî bîxatehergehîshî kowalîty sînehemî kurdîstan. Lemahîy xwlehîkânî pîstîwoda (f k l) behînerm wîniyanî hewêstîkewetî kurdwewehêgêl fîlmehîkânî kurdîstan, tîstî bashî wîkwalîty fîlmehîkânî behşdar zûr leiyek jîawazn. Behîdaxeweh behîgêmen fîlmî bash dewîbîniyan, zûrîyehî fîlmehîkânî tîstîkî nîzîmîyan hîyeh wîberhewemîkî sînehemîyehî behîçawî nîyan wîrastewexwî karyîgerî dewênehewehî kowalîty fîstîwaly. Pîstîstewefîstîwaly nehewehî nîyanîyehî wîlanî wîlehewêlîzardîni fîlmehîkânî zûrî tînd wîsehîxtîgrî bî, tînanet nehewehî fîstîwaly behî7 ya 8 fîlm behîrîyehî bîçît kîshewîyehî. Behîdaxeweh nehewehî wîwanîgîyehî hîyehîkâm lehewîstîwalekânî kurdîstan nîyanewî kurdî kowetîyehî pîyehewî "zûrî bît wîbîrît" hewêstîkewet dewêkî, wîtî radehîyehî zûrî fîlmî kehewêrîyehîyan tîstî hewehîrîyehî wîsînehemîyanî nîzme pîsîndewêkî wîdewehewî behşdar boon lehewîstîwalyîkî jîehîyanî bo zûrîyehî dewêxîstîyehî wîrastewexwî karyîgerî dewênehewehî pîstîwalekewet wîgehîshî sînehemî kurdîstan. Tînanet nehewehî fîstîwaly behewîyehî kêm boonî fîlmî bashî salîkî behîrîyehî nehewehî bashîterehewehî nîzme behîrîyehî çoonî behewîyehî tîstî nîzme fîlmehîkân, çoonîkehewehî hewêlîgrî pîyehîmîkî grîngî wîsînehemîkaranî lehewehîrastîyehî tîdewêgî fîlmehîkânîyanî şîwîyehî behşdarî lehewîstîwaly nehewehî

و بوونه هۆکاری به‌پێوه نه‌چوونی. پێویسته هەر فێستیوالێک ئێستانداری تایبه‌تی هه‌بێ و به‌جۆری هه‌لبژارنی فیلمه‌کان و به‌خشینی خه‌لات په‌یامی خۆی ده‌ربهرێ و سینه‌ماکارن تیگه‌ییانی ده‌بێ له‌ چ ئاستیک فیلم به‌ره‌م بێن. ئێستا پرسیار ئه‌وه‌یه، (ف ک ل) ئێستانداره‌کانی چیین؟ یا، تا ئێستا په‌یامه‌کانی بۆ سینه‌ماکارانی کورد چی بووه؟ ئه‌و بابته‌یه‌ کجار گرینگه‌ و پێویستی به‌ بریارێکی دیار و پروونه له‌ لایان به‌پێوه‌رانی فێستیواله‌وه. ئه‌و گرینگیه‌، وه‌ک ئاماژه‌ کرا له‌ به‌خشینی خه‌لاته‌کانیش دا ده‌بێ له‌به‌ر چاو بگیرێت. نزیك کردنه‌وه‌ی سینه‌مای کوردستان له‌ ئێستانداره‌ جیهانییه‌کان ئه‌رکی سه‌ر شانی فێستیواله‌کانی وه‌ک (ف ک ل) و ئه‌وانی تره‌.

هه‌روه‌ها، به‌پێوه‌ چوونی (ف ک ل) له‌ نه‌نده‌ن ده‌رفه‌تیکه‌ بۆ گرنگی دان به‌ به‌شی بازاری فیلمی فێستیوال، به‌ مه‌به‌ستی ناساندنی فیلم و سینه‌ماکارانی کوردستان به‌ فێستیواله‌ جیهانییه‌کان و هه‌روه‌ها کۆمپانیا و که‌سانی پرۆفیشینالی جیهانی. ئه‌وه‌ش ئه‌رکیکی تری فێستیواله‌کانه‌. ئه‌و بابته‌ ده‌توانی تایبه‌تمه‌ندیکی گرنگی (ف ک ل) بێت. هیوادرم پۆژیک بێ و (ف ک ل) یه‌ک له‌ فێستیواله‌ په‌سند کراوه‌کانی ئاکادیمیای ئۆسکار بێت.



**Abdulsittar Ozmen**  
asettarozmen@hotmail.com

Festîval ew cejn in ku di demên diyar da tên sazkinin. Festîvalên filman carinan bo xelatekê, bo pêşkêşkirina fîlmên welatekî, carinan li ser temayeke wekî fîlmên derbarê karkeran, jinan û hwd. tên sazkinin. Di van festîvalan da mirov wê fersendê bi dest dixê ku gelek fîlman li ser hev temaşê bike bi gelek mirovan ra bê cem hev, derbarê filman nêrînên xwe bîne zimên, nîqaşan bike û bi vî awayî asoya xwe fireh bike. Bo fîlmên kurdî festîval girîngtir in lewra gelek fîlmên kurdî li salonan cih nabînin ku bîne temaşekirin. Divê em Festivala Fîlmên Kurdî ya Global jî bi vî awayî binirxînin. Ji çar aliyên welêt û cîhanê -nû an kevin- bi dehan fîlm hatin ber destê me ku heta niha derfet nebû em temaşê bikin. Hinek fîlm bo Tirkiyeyê astengkirî bûn lê helbet rêyên temaşekirinê hebûn. Hêvîdar im festîvalên wisa rengîn, dewlemend li bajarên me jî bîne sazkinin û em fîlmên xwe di salonên sînemayê da jî temaşê bikin.



**Rengin Aydın**  
Renginaydin@gmail.com

Sînema jî weke televîzyon û înternetê xwedî bandoreke mezin e. Ji bo xwegihandina mirovan amûreke bi kêrhatî ye. Ji aliyekî din ve jî bo derbirîna hîs û raman û afirandina hûnerê, rêyeke xwedî alternatîf e.

Berhemên sînemayê ji dîmen, wêne û mijar, ronahî liv û tevgerê pêk tînin û ev dike mirov bi awayekî hêsan lê serboriyê bişopîne. Ev taybetmendiya sînemayê jî bo pêşkêşîna ji gelek aliyên ve fersendan dide me.

Xebatên festîvalên hunerî yê bi vî rengî dike ku zimanekî hevpar pêk were. Herçiqasî kurd bi awayekî çalak, çend zaraveyan bi kar bînin jî ziman li gelek qad û mijarên cuda tînin bikaranîn û asoyên nû li ber ziman vedibin. Ev di zimanê hişî da pêşketinê pêk tîne û hem jî dike ku mirovên endamê neteweyekê di bin heman sîwanê da bi awayekî pihêt bicivin û bîreke çandî pêk tînin ku sînemaya kurdî bi pêş dikeve. Lê gelek caran ji ber rewşa welêt ya dîstopîk û bi ser da jî ji ber pandemiya li seranserê cîhanê belav bûye, xwegihandina berheman ne hêsan e. Min li ser înternetê li hinek fîlmên Festivala Fîlmên Kurdî ya Global temaşê kir û bêguman ev cihê şanaziyê ye.

Festîvala Fîlmên Kurdî ya Global hişt ku em sînoren di hişê xwe da hilweşînin û zêdetir hevdu hembêz bikin û haya me kurdan ji hevdu çêbibe.

Ji ber ku berhemên sînemayê dişibin xeyalên mirovan Ilya Ehrenburg (1931) têgeha “febrîqeya xeyalan” bi kar aniyê. Li gorî vê kamera, weke çavên mirovan ji dêvla wan ve xewnan dibîne. Tarîbûna li nava salona sînemayê ji mirovên xwedî xewna ra zemînekê çêdike. Sînemaya ku xewnan diafirîne ji bo berhemek derkeve holê, gelek hêmayan li hevdu dicivîne.(1)

Ji bo em ji vê rewşa dîstopîk rizgar bibin û utopyaya me û xewna me pêk were dibe ku xebatên mîna Festîvala Fîlmên Kurdî ya Global di vê reya dîvdirêj da gavek be.

Em kurd bi xwe û neteweyên din yê li vê cihanê bi hevdu ra bi derd û kul û daxwaz û hawarên xwe dihisin. Ez hêvî dikim ku rojên xweştir dê li ber me bin. Ez dixwazim bibêjim ku ev li me hemûyan pîroz be! Ez gelek spasîyan dikim ji mirovên ku ev mîhrîcan li dar xistine û malavahiya wan dixwazim.

(1)Di Çarçoveya Sînema û Psîkoanalîzê da Dahûrîna Fîlmê Melankolî yê Lars Von Trier, Bilal Korkut, Psychology Kurdî, Hej:12, 2021



**Murad Dildar**  
muraddildar@gmail.com

12emîn Festîvala Fîlmên Kurdan ya Londonê ji ber pandemiyê, wekî sala par îsal jî online hat lidarxistin. Pandemiyê, gelek nûjenî û guhertinan xist nav jiyana me. Ji van guherînan yek jî, girtina salonên sînemayê bûn. Bi saya(!) pandemiyê, min jî wekî gelek kesan derfet bi dest xist ku ji mala xwe beşdarî festîvalê bibim û li fîlman temase bikim. Festîvalê 12 roj dewam kir û bi Festîvalên Fîlmên Kurdî ya Amed , Moskova, Barselona, Hambûrg, Mezopotamya û hwd. ra wekî karekî hevpar derket pêşberî me.

Ez festîvalên bi vî şiklî, bi taybetî jî Festîvala Londonê ji bo me kurdan ji sê hêlan ve erênî dibînim. Ya yekem, nasandina sînemaya kurdî ye. Bi vê festîvalê, xebatên li ser sînemaya kurdî tên kirin jî ji aliyê dinyayê ve tên nasîn. Ez bawer dikim li welatên cuda, fîlmên festîvalê ji aliyê gelek kesan ve tên temasekirin û bi vî awayî di hişên wan da li ser sînemaya kurdî întîbayeke erênî çêdibe. Welatên cuda li aliyekî, em kurd jî bi vî awayî derfet dibînin ku hunermend û derhênerên xwe nas bikin û xebatên wan bişopînin. Herçiqas bi saya internetê em bikaribin xebatên li ser sînemaya kurdî bişopînin jî

mixabin ne mumkun e, em ji hemû xebatan agahdar bibin. Bawer dikim gelek kesan jî wekî min bi vê festîvalê, navên gelek derhêner û filman cara ewilî dîtin û li arşîva xwe zêde kirin.

Ya duyem motîvasyon e. Em dizanin êdî li gelek welatên cuda kurd hene û li ser hunera kurdî xebatên hêja dikin. Festîvalên bi vî şiklî ji xebatên hevpar pêk tên, îmkan dide ku têkiliyê manevî di navbera me û mirovên li welatên cuda yê li ser hunera kurdî dixebitin ra çêbe. Ev têkilî ji bo hunera kurdî mirovan motîve dîke û dixê nav tevgerekê. Ev tevger jî ji bo hilberîna berhemên nû xwediyê girîngiyê mezî e.

Ya sêyem jî çêbûna arşîvê ye. Bi Festîvala Londonê em dibînin ku li ser sînemaya kurdî gelek xebat hene. Lê zêdebûna hejmara fîlman bi xwe ra pirsgerêkekê jî derdê holê. Di jiyana dijîtal da mixabin gelek berhem bêyî ku baş bînin nasandî tî jî bînkirin yan jî ji aliyê gelek kesan ve nayên bihîstin. Û em dizanin ku gelek fîlm, mixabin ji ber bêderfêtbûnê nikarin xwe bigihînin temasevanan û tî jî bînkirin. Bi saya vê festîvalê, arşîveke mezî û hêja çêdibe. Fîlmên di festîvalê da tî nasandî, wekî nav di arşîva festîvalê da cih digirin. Ez bawerim, ev arşîv wê di sîberojê da ji bo xebatên li ser sînemaya kurdî bibe alîkar û çavkaniyê mezî.

Sala bê wê rewş çawa be nizanim. Belkî pandemî bi dawî bibe û salonên sînemayê vebin, belkî jî rewş wisa bidome yan xerabtir bibe û em dîsa fîlman online temase bikin. Lê îsal gava min li fîlman temase dikir, pîrsek ket hişê min. Min got, gelo niha di heman dem û saetê da li bajarên me yê din yan jî li welatên dîr çend kes bi min ra li heman fîlmî temase dikin? Belkî wekî xeyalek be lê hêvî

dikim ku di siberojê da Festîvala Londonê li salonên bajarên me yên wekî Diyarbekir, Wan, Qamişlo, Silêmanî, Hewlêr, Mahabad, Efrîn û hwd. jî fîlmên xwe belav bike û em li van bajarên xwe di heman dem û saetê da bi hev ra li heman filman teşe bikin.

Wekî ku di hemû festîvalan da dibe di vê festîvalê da jî ji ber ku mirov nikare li hemû filman teşe bike, hinek xemgîn dibe. Lê ev qedera hemû teşevanên hemû festîvalan e. Hêvî dikim ku fîlmên me ji bo teşekirina wan wext nedît dilê xwe ji me negirin û deng û rengê xwe ji me kêm nekin. Lewra ew bi afîşên xwe, bi navên xwe di hiş û defterên me da cihê xwe girtin û wê teqez rojek bîna teşe kirin. Her kesê ku keda wî di vê festîvala hêja da hebe ji dil û can pîroz dikim ji bo festîvalên siberojê ji niha ve serkeftinê dixwazim.



**Zeynep Yaş**  
zeynepyash@gmail.com

Festîvala fîlmên kurdî, hewildaneke navdewletî ya nasandin û berçavkirina jîyan, bîrdank û rewşa welatê kurdan bixwe ye. Di vê serdema teknolojiyê da ku dinya biçûk bûye, teşhîr û tenzîma hizr û hişmendîya civakî encax bi van hewildanan bêtir ber çav bibin û rewşê bidin nas kirin.

Mixabin heta vê gavê jî qenale-

ke kurdan ya fîlm û sînemayê tune û bi sedan fîlmên li ser jîyan û rewşa kurdan hew li van festîvalan bîna nîşandan. Ji ber wê çendê gelek giring e ku huner û rewşenbîriya kurdan bi xêra van festîvalan bêtir zindî û çalak bimîne.



**Hatice Kamer**  
haticekamer@gmail.com

Di pandemiyê da tiştê ku ket nava jîyana me, platformên online yên internetê bîna yanî jîyan bûye online. Ev jî zimanekî nû ye gerdûnî ye ku encama karesata Covid-19yê ye. Helbet jîyana online dibe bingeha hin derfetên nû weke fikra Festîvala Fîlmên Kurdî ya Global. 'Bi xêra pandemiyê' peyvek îronîk e lê em dibînin ku karesatek kir ku festîvalên kurdî hêza xwe bikin yek û festîvalek tîr û tije ya online lidarbixin. Aqûbet li serê sîyaseta Kurdan jî

Derfeta her mirovên ku ji sînemayê hez dikin nîne ku biçin li bajarên festîvalan, filman teşe bikin. Lê bi rêya onlinê, kî li ku bû, li ciyê xwe dikaribû filman teşe bike. 10 festîval û 100 fîlm, ev bi serê xwe serkeftineke mezin e. Ger rojek em ji koronayê xelas bibin jî ez bawer dikim weşana online dê bibe beşek girîng ya festîvalan.

Divê Festîvala Global bi vê şeweyê yekbûna xwe bidomîne.

Gelek spas ji bo hemû kesên

ku keda wan di vî karî da heye.



**Shilan Saadi**  
shilan.saadi59@gmail.com

bi guman yek le he nêgawê hêrê be nêrxê kan, le kurdistan û dêrêwê, wêrîxstnî fîstîwaly fîlmî kurdîyê, bû mîlê tîkî ke sîne mayê kî sêrê bexû û hêrêwê bîne rî xûmaly fîlmî nîyê. êwê dê tawî dêrêfê tîkî bash bî bo pêrê pîdanî êwê û kltorê û zîatr nâsandanî sîne mayê bê gêl. yek le kêntrî fîstîwaly kan, fîstîwaly fîlmî kurdî le dênê ke dê bî dêst xûşî lew ke sanê bîkên wîst sâl bêrî dêstîyan bê xêbatê kurd û hîdî hîdî hêngawîyan nâ bû gêstn be sîne mayê nêwêyî. hêlêt pash êwêzmonî çênd sâlê dê kurdî û dê bî pîdâ çowêwêyê bê sêrê pêt û çûnîyê tî û namanjê kânî fîstîwaly bîkî, wêk zûrêy fîstîwaly kânî jîhan. nâkî namanjî fîstîwaly bû hê mîshê tê nîa nîshan dâny fîlm û dâbêsh kurdî xêlê kan bîmî. dê kurdî plâtfôrîmîk bît bû bêrêwê pîshê bîrdnî sîne mayê û gêshê pîkurdnî le kurdistan û rî xûşê kurdn bû êwê dêrêhêrê nêy le sêrê tîy rîgê yan, bû êwê tawîyan bîy wêk kurdîk bê zmanî sîne mayê basî kîshê kânî xêlêkê kîyan



بکەن. ئەوەش بە بردنە سەری ئاستی ئمانجەکانی فستیوال دەکری.

چونکە هەرۆک دەزانیین فستیوالەکان جیگایەکن بۆ خەسارەناسی و لیکدانەوهی ئەو بابەتەکانی پێویستن. هەر وەها پێداچوونەوهیەکی بە سەر یەک سالی حەولی سینەما لە ولاتیک. جا لەپەنای ئەوانە بینەریش سەرگەرم دەبن. هەلبەت لە پالی ئەو ئاگادار دەکرێتەوه کە لە دەردۆریان چی روودەدا، ئەویش بە زمانی سینەما. هیوادرم فستیوالە کوردییەکان بتوانن رێگا خۆش بکەن بۆ ئەوێ تێمەیش بینە خاوەن سینەمایی نەتەوهی بەهێز بە تەواوی تاییەتمەندییەکانی پێویستی ئەو جۆرە لە سینەما.



**Cano Rojbeyanî (Jano Rosebiai)**  
mail@evinifilms.com

Ji bo pêşxistina sînemaya kurdî yek ji qadên pêwîst "Festîvalên Fîlmên Kurd" e. Festîvalên Fîlmên Kurd divê li dîyasporayê bibin alîkar ku fîlmên kurdî pêş bixin û digel vê çanda kurd pêş bixin û li ser pirsgrîrêkên kurdan yê siyasî cîhanê rûşen bikin. Ji ber ku cihên fîlmên kurdî kêm in yan tune ne, festîvalên kurdî di nav Kurdistanê, bajarên kurdan da bi heman radeyê girîng in, derfetê bidin ku fîlm ji alîyê kurdan ve werin teşşe kirin. Bo mînak di sînemayên Kurdistana

Başûr da kêm caran fîlmên kurdî nîşan didin ji ber ku li wir wisa tê dîtin ku bazara fîlmên kurdî tune ye. Hêj televîzyonên kurdî jî fîlm heya ji wan ra belaş neyê dayîn filman naweşînin. Mixabin di televîzyonên kurdî da dramayên tirkên serdest in.

Festîvala Fîlmên Kurdî ya Global bînpêkirinek bû, wek alîkarê ku fîlmên kurdî bigihîjin her çar alîyê cîhanê. Digel kampanyayêke guncav, dikare danasînekî herî baş bo civaka cîhanê ji sînemaya kurdî ya ciwan ra bike.

Di gel kêmasîyan, mixabin hem li welat hem jî li dîyasporayê festîvalan ji bo hevkarîyê û ji bo alîkarîya pêşvebirina medyaya giştî, nekarîne fîlmçêkerên çalak kom bike, panel û nîqaşên li ser rîyên pêşxistina sînemaya kurdî pêk bîne.



**Zana Hama Gheryb**  
malicinema4@gmail.com


فستیوالی فیلمی کوردی لەندەن یەکیەک لەو فستیوالانەیه کە لەماوهی تەمەنی خۆیدا خزمەتێکی گەورە بەرهۆتی فیلمسازی کوردی کردوووە و توانیویەتی سەکۆیەکی بێت بۆ ناساندانی ئاریشە و چیرۆک و شوناسی نەتەوهی کورد لەرێگە نیشاندانی فیلمی سینەماکارانی کورد لە هەرچوار پارچەیی کوردستان بە بینەرانی

بێگانه لەولاتی بەریتانیا بەتایبەت ئەمە جگە لەوهی کۆکەرەوهی فیلمسازی کورد لە هەرچوار پارچەیی کوردستان و ولاتانی رۆژئاوا.

سالی ۲۰۲۱ بەتایبەت بەهۆکاری کۆرۆنا بێرکردنەوه بەرێوەبەراییەتی فستیوال بەوهی فستیوال بکەنە گلوبال بێرۆکەیهکی زۆر باش بوو، وەتوانی تارادەیهکی زۆر سەرکەوتن بەدەست بهینیت بەتایبەت ئەمسال زۆرتیرین بینەر لەرێگە ئە خولەیی فستیوالەوه فیلمیان بینی، وەپەیره و کردنی ئەم سیاسەت و ستراتیژە بەبروای من هەنگاویکی باشە و پێویستە بەرەوهوامی پێ بدریت، سوپاس بۆ بەرێوەبەراییەتی فستیوال، سوپاس بۆ فیلمسازی کورد.

زانا حەمە غەریب

رۆژنامەنووس و پرۆدیوسەر



**Sener Ozmen**  
senerozmen@gmail.com


Destpêkê, lijneya helbijêr piroz dikim wekî di van şertên giran da vê mîhrîcanê li dar xistine û deng û rengên kurdên "bêdewlet" û "bêtiyaq" ragihandine cîhanê. Hêvî ew e ku wekî girîngtirîn hunera li darê dinyayê, sînema hiş û hişmendî û bîr û boçûnên li ser yekîtiya kurdan ji van rojên ku kurd di her qadeke jiyana da qîç li hevûdin beş dikin, bi tevayî

ji holê rake. Daxwaza herî mezin ku di hêla perspektîfa dîtbariyê da derdikeve pêş ew e ku LKFF cîh bide film û vîdeoyên ji Hunera Hevçax (Contemporary Art) jî yên ku ji destpêka salên 2000an û vir ve hatine li dar xistin.




**Halima İlter**  
h.ilter@gmx.de

Min bi rastî jî ji vê festîvala delal hez kir û zewq jê wergirt. Sînema perçeyekî ji çanda me ye, ger em ji bo pêşxistina sinemaya kurdî bergehên xwe firehtir bikin çanda me qet namire. Ev tiştê ku ez ji Almanyayê fêr bûm; “Çand tune be, welat jî tune ye”. Ji ber vê jî ji bo em şanoyên kurdî li cîhanê bidin nasandin, çî ji destê me bihê divê em bikin. Şano ji bo min nola mifteyekî ye ku meriv dikare pê dakeve dinyayê. Ka em ji bo kurdan mifteyek hêja biafirînin. Hûn jixwe dest bi vê rêwîtiya nûwaze dikin û ev yek jî min kêfxweş dîke û hêvîyê dide min. Wek lîstîkvaneke ev yek bo min gelek watedar e, lewra wexta sînemayên kurdan mezin bibin, bo min fersenda daketina cîhana çîrokên jî zêde bibin, ez dikarim bibim perçeyekê vê. Spas dikim û tu carî dev jê bernedin da ku cîhan bizane ka em çi qas mezin in! Baştir in.





**Berri Shemdîn**  
[berrishemdîn@yahoo.com](mailto:berrishemdîn@yahoo.com)



**Ekrem Yıldız**  
[ekremekoyıldız@gmail.com](mailto:ekremekoyıldız@gmail.com)



**Erdal Kaya**  
[kayaerdal87@gmail.com](mailto:kayaerdal87@gmail.com)



**Mewlûd Oguz**  
[oguzmevlut@gmail.com](mailto:oguzmevlut@gmail.com)



**Tofan Sunbul**  
[tofansunbul1@gmail.com](mailto:tofansunbul1@gmail.com)



**Înan Eroglu**  
[inan.eroxlu@gmail.com](mailto:inan.eroxlu@gmail.com)

# PIRS Û BERSIV



**Ji bo arşîveke fîlmên kurdî platformeke online ya bi vî awayî ku li her dereke cîhanê hebe, mirov bikare fîlman temaşê bike, dê çawa be? Tu vê meselê çawa dinirxînî?**

**Mewlûd Oguz:** Bi pandemiyê ra hema bêje tevahiya perwerdehî, çalakî û civînên me online têne kirin. Dema me ya li ber ekranekê zehf zêde bûye û loma jî dikarim bibêjim ku şexsen ji vê rewşê kerixîm û herhal ji ber vê ye ku li gorî berê, kêmtir li tiştinan temaşê dikim. Ji ber vê yekê ye, min li kêmtir festîvalê temaşê kirin. Bersivên min jî li gorî vê ne, eger min zêdetir tişt temaşê kiribûna, dibe ku bersivên min bihata guhertin... Li gorî min, hebûna platformeke online ya fîlmên kurdî da pir baş be û wê ji bo temaşevanan bibê derfeteke mezin. Eger digel fîlmên festîvalê ev platform dem bi dem were nûkirin yan jî taybet ji bo platformê hinek naverok bêne kişandin û ji bo fîlmên cîhanî jêrenivîs bîn danîn yan jî dublaja wan ya bi kurdî bê kirin, bi bawerîya min, da teqez bi ser bikeve lewra diyar e ku di vî warî da valahiyeke mezin heye. Xaleke din ya girîng jî ew e ku eger aplîkasyoneke baş ya mobîl bête çêkirin û bihayê endamtiya premium maqul be wê demê bi texmîna min platform da teqez bi ser bikeve û qezenc jî bike.

**Tofan Sunbul:** Ger platformeke bi vî awayî hebe da hem ji bo kurdên li çar aliyê dinyayê hem jî ji bo wan kesên dixwazin kurdan baştir nas bikin da baş bibê. Roja me ya îro her ku diçe zêdetir dijitalîze dibe, divê em jî xwe ji vê yekê bêpar nehêlin.

**Erdal Kaya:** Ji bo fîlmen kurdî platformeke online wê gelek baş çêbibe. Lê hewce ye ku her yek ji temaşevanan endamtî û abonetiya platformê çêbike, ji ber ku her fîlmên li ser vê platformê da bîn temaşekirin, heqê xwe jî bistînin.

**Înan Eroglu:** Bêguman hewce ye, bes ne îro, hewcehiyeke wisa her ji berê da hebû. Ne tenê arşîveke fîlmên kurdî, yên dûblajî û binnivîsî jî tê de, arşîveke fîlmên dinyayê bi kurdî. Daxwaz tenê aliyekî vê meseleyê ye, aliyên wê yên din heye ku hîn zehmettir bin.

**Ekrem Yıldız:** Festîvala Fîlmên Kurdî ya Londonê, ku êdî global e, bi renekî ron û aşkere nîşanî bîner û derhênerên kurd da ku hebûna platformeka dijital bo fîlmên kurdî, pêdiviyeka heyatî ye. Çimkî ji ber sebebên polîtîk û tarîxî, halê heyî rê nade ku cemawereka yekpare ya bînerên fîlmên kurdî durist bibê. Lewma hebûna platformeka dijital, dikare rêxweşker be bo duristbûna pirekê di navbera bînerên kurd û fîlmên kurdî da. Her dîsa berdestbûna fîlmên kurdî dikare bibê, wesîleya nivîsîna nivîsarên rexneyî li ser fîlmên kurdî ku me ev yek di henga birêveçûna FFKLê da -kêm jî be- dît. Kêşe û berbesteka din ya vê meydanê jî ew e ku bîner û lêkolerên sînemaya kurdî her car nikarin xwe bi rihetî bigehînine fîlmên kurdî û derhênerên van fîlman. Bes derbarê vê pêdiviyê da hewildaneka piçûk ya wekî Mezolinxê heye.

**Berri Shemdîn:** Ew ê gelek xweş be ji bo sînemaya kurdî ku bê nasîn û bipêşkeve.



## Di vê festîvalê da fîlmê ku herî bala te kişand û li xweşiya te çû kîjan bû? Çima?

**Mewlûd Oguz:** Radio Kobanî – Rêber Doskî... Hem bi navê xwe û hem bi lehenga xwe û hem jî bi diyalogên xwe yên ji dil û rasteqîn, belgefilma Rêber Doskî ya bi navê “Radio Kobanî” bala min kişand. Bi min yek ji fîlmê serkeftî yê festîvalê bû. Ez bêjim Dilovan Kîko bûye berdevkê hemû xelkê Kobaniyê, ne tene yê Kobaniyê, herweha bûye berdevkê hemû kurdên Rojava dê ne şaş be. Dilovan û Radio Kobanî dike ku mirov baweriyê bi jiyaneke din bîne, bi jiyaneke xweştir û aramtir.

**Tofan Sunbul:** Fîlmê herî zêde bala min kişand “Evîn di Rûyê Qirkirinê de” bû. Fîlm hem ola Êzdayetiyê nîşanî me dide hem jî kokên muzîka dengbêjîya ya kevin bi dîroka kurdan ve girê dide. Belgefilmeke ne xwerû li ser pirs û bersivan ango klîşeyan bû, mirov hem fêrî jiyana Êzidîyan, komkujîyên hatî serê wan û hem jî fêrî muzîka wan dibe. Kêşanên wê, axaftin û kilamên tê da hatî gotin, gelek kêfa min anî. Lewma vê belgefilmê bala min ji yên din hemûyan bêhtir kişand.

**Erdal Kaya:** Kurtefilma “Hazirîyek Bo Derengmayînê” gelek bala min kişand. Hem listikvanê wê hem çîrok gelek serkeftî bû.

**Înan Eroglu:** Min 42 fîlm temase kirin. Kick Off Kirkuk ji dirêjefîlman: Şewket Emîn Korkî bi çîrokeke besît ya nav jiyane bîyî gotinên qelew rewşeke di bin şer û malwêranyê da nîşan daye. The World’s Last House ji kurtefilman: Emîr Xulamî hem çîrokeke derveyî fîlmên kurdî danîbû hem karakterên serkeftî afirandibûn hem dîmen hem pevxistina wî, ez ecêbmayî hiştibûm.

**Ekrem Yıldız:** Ji ber hejmara zêde ya filman, mumkûn nebû mirov hemî filman temase bike û her fîlm hêjayî hûrbîniyeka kûrtir bû. Bêguman gelek fîlm hebûn ku hêjayî behskirinê ne; Hewno Bêreng (Mehmet Ali Konar), Quarantine (Muhammedreza Erdelan) û The World’s Last House (Emîr Xulamî) destebijarên min ên vê festîvalê bûn. Bi giştî sansûr û berbestiya li pêşiya fîlmên kurdî yên rojhilat reng û ciyawaziyekê bexşî vegêrana van filman dike. Lewma nisbet bi fîlmên kurdî yên din ev fîlm bo min gelekî cudatir bûn.

**Berri Shemdîn:** Love in the Face of Genocide: Terza fîlmê tam li gor dengbêjîyê bû, him alîyê çîrokbêjîyê him jî bi muzîkê...



## Di vê festîvalê da sê derhênerên ku herî bala te kişand kîjan bûn?

### **Mewlûd Oguz:**

Şewket Emîn Korkî, Rêber Doskî, Muhammedreza Erdelan

### **Tofan Sunbul:**

Shero Hindê, Mehmet Alî Konar, Shawkat Amîn Korkî

### **Erdal Kaya:**

Bahman Gobadî, Kazim Oz, Aram Dildar

### **Înan Eroglu:**

Şewket Emîn Korkî, Emîr Xulamî, Rehîm Ahmedzade.

### **Ekrem Yıldız:**

Muhammedreza Erdelan, Emîr Xulamî, Rêber Doskî

### **Berri Shemdîn:**

Taha Kerimi, Ferman Narin, Samko Brothers



## Di vê festîvalê da fovorîya te kîjan lîstikvan bû ku performansa wê/î di asteke bilind da bû?

**Mewlûd Oguz:** Rugeş Kirici (Berû)

**Tofan Sunbul:** Favorî lîstikvanê min yê filma Hewno Bêreng da bi performanseke bilind, xweş leyîstî û min ecibandî Civan Goney Tunç bû, hem bi 'emrê xwe yê biçûk hem jî di filmekê wiha "giran" da lîstikvanîyekê têra xwe serkeftî derxistîye. Stres û motîvasyona rola sereke her tim ji bo lîstikvanan zêde ye, ji bo lîstikvanekî zarok du qat zêde ye, lewma jî bi min lîstikvanîya Civan Goney di asteke baş da bû.


**Erdal Kaya:** Serdar Bîçîmlî di *Hazîryek bo Derengmayîne* da roleke biçûk leyîst lê gelek serkeftî bû û bala min kişand.

**Înan Eroglu:** Feredûn Ensarî. Performansa wî ya biind di du filman da: *The World's Last House*, *The Stain*.


**Ekrem Yıldız:** Ferîdûn Ensarî (*The World's Last House* - Emîr Xulamî)

**Berri Shemdîn:** Ferîdûn Ensarî

**Bi te Festivala Filmên Kurdî ya Global di çi astê da bû?**



**Bi te sînemagerên kurd ji kîjan hêlê ve serkeftî ne?**







**NÊRÎNÊN  
HEVKAR ÊN VÊ  
FESTÎVALÊ**

## Festîvala Fîlmên Kurdî ya Hamburgê

Yasîr Irmak

Yasar.irmak@yahoo.de

Em jî wek festîvalên din tevî Festîvala Fîlmên Kurdî ya Global bûn. Deh hevkar, ji deh bajêran. Wekî hûn jî dizanin pandemîya koronayê bi awayekî online hat çêkirin. Sedan bêhtir fîlm hebûn. Bi rastî jî serkeftî bû. Îmkan hebû ku fîlmên kevin û yên nû bîn temaşekirin. Em dikarin bêjin weke arşîveke biçûk ya sînemaya kurdî bû. Ji her çar parçeyê Kurdîstan û dîasporayê fîlm hebûn. Derfeteke gelekî baş bû. Lê mixabin wext kêr bû. Di neh rojan de ne mimkin bû ku her yek wan hemû filman temaşê bike. Ew jî ji ber derfetên ku çêker an jî derhêner lîsans dida, kêr bû. Ew jî mafdar bûn ku fîlmên xwe bo mehekê vekirî nehêlin. Ew pirsgirêk hebû lê belê dîsa jî festîval baş bû. Me jî wek Festîvala Fîlmên Kurdî ya Hamburgê online çêkir. Ya LKFFê jî online çêbû. Heger ku derfet hebin belkî êdî ew platform bibe arşîveke fîlmên kurdî. Wekî Netflixê. Ew fîlmên ku hêj neketine vîzyonê û di heman demê da fîlmên kevin jî hebûn tê da. Mirov dikare weke platformeke online çêbike. Yanî yên ku dixwazin dikarin bi pere filman li ser wê platformê bikire an jî temaşê bike. Yanî belkî weke Amazon Prime an jî weke Netflixê çêbibe. Ku tiştek wisa çêbibe dê gelekî baş be. Yanî festîval ne lê arşîv bibe online. Global, dikare bi wî awayî berdewam bike. Piştî pandemîyê her festîval dikare rûbirû festîvalên xwe li dar bixe. Ew alîkarî dê berdewam bibe. Bi rexne, bi piştgirî dê alîkarî bo Global bê kirin. Dê bibe platformeke festîvala fîlmên Kurdî. Di pêşerojê da ew platform dê mezin bibe. Wekî çêker, derhêner, lîstikvan, lêkolîner jî tê da hene. Hêvî dikim platformeke wisa bibe. Hêvîya me ew e ku em piştî pandemîyê, festîvalên xwe rûbirû çêbikin. Lê helbet em bi online jî dikarin bîn cem hevdu. Ji bo xebatên we pîr spas dikim û bi têkiliya we ra kêfxweş im. Spas bo hemû kedbaran.

## Festîvala Fîlman ya Mezopotamyayê

Taner Tan

mezopotamycinema@gmail.com

Em, wek Festîvala Fîlman ya Mezopotamyayê serbilind in ku em dibin beşek ji festîvalek filman ya wiha mezin. Nîqaşên li ser "sînemaya kurdî" bi awayek domdar li ser pîrsa "sînemaya kurdî çi ye" encam dide. Pîrseke zehmet e li dumedarê filmçêker, hilberîner, belavker û pêşengerên kurd de digere. Piştî demeke dirêj Festîvala Fîlmên Kurdî ya Global derîyek bo bersiva vê pîrsê vekir. Di derbarê vê yekê da, lêgerîna online çawa û çima gelek girîng bû? Li dorhêla sînemaya kurdî, ev pîrs balê dikşîne li ser xetê gelek girîng. Berî her tiştî, wexta ku em peydanebûna holên sînemayê û girseya bînerên kurdî li Tirkîyeyê bînin ber çavên xwe, Festîvala Fîlmên Kurdî ya Global; li Tirkîyeyê, perçeyên Kurdîstanê yên din û li dinyayê, di afirandina fikra bînerên neteweyî de pêngavek xurt bû. Ya duyemîn jî fîlm ji çar aliyê cîhanê, nemaze ji çar perçeyên Kurdîstanê, hatin Festîvala Fîlmên Kurdî ya Global. Ev hevpiştî û piştgîrîya civakî jî yekîtiya navbera filmçêkerên kurd, hilberîner û organîzatorên festîvalê; bi vî rengî jî yekîtiya kurdan sembolîze dike. Festîvalên Sînemayê yên kurdî ji ber ku hewil didin bînerên xwe yên neteweyî biafirînin, yekîti û hevpiştî ya di nav kurdan de xurt dikin û taybetmendiyên neteweyî yên kurdan di sînemayê de pêş ve dixin; wexta em van şîrove bikin bi min pêşeroja sînemaya kurdî li ser milê Festîvalên Fîlmên Kurdî geş dibe. Festîvala Fîlmên Kurdî ya Global careke din nîşan da ku eger em, wek kurdên li deverên cuda yên cîhanê dijîn, bixwazin di warê sînemayê de pêş ve biçin, divê em zêdetir bîn ba hev. Divê em festîvalan bi tenê wek cihê pîrozbahîyan nefikirin, divê em wan wek ciheke ku torên cihêreng tene cem hev û li wir têkilîyên curbicur di nav hev da datînin, bifikirin.

## Festîvala Fîlmên Kurdî ya Moskowê

Zînê Broyar  
info@moscowkff.ru

Festîvala Fîlmên Kurdî ya Moskowê bi hevkarîya Festîvala Fîlmên Kurdî ya Global gelek kêfxweş û serbilind e. Ev projeya ku ji hêla Festîvala Fîlmên Kurdî ya Londonê ve hatî afirandin, sînemaya kurdî digehîne asteke nû ya navneteweyî û nîşan dide ku gelê me hevçaxê vê demê ye. Hevkarên festîvalê bi rengê dostane û bi awayekê profesyonel hevkarî kirin da ku alîkarîya pêşvebirina sînemaya kurdî bikin. Em ji ber bersivên mirovan gelek kêfxweş in, ji pêşbinîyên me zêdetir nêrîn hebûn li ser vê festîvalê, ev yek jî bêguman behsa serkeftina festîvalê dike. Formata çapa online (serxet) karî bigihîje girseyekê mezintir û ji bo pêşveçûna pîşesazîyê, platformek nuwaze bû. Em hêvî dikin ku proje di pêşerojê de jî bidome.

## Festîvala Fîlmên Kurdî ya Slêmaniyê


Mîhraban Abdullah  
mihraban@slemanifest.com

سلأو له ئامادەکار و خوینەرانی ئەم گوڤاره هونەری و سینەماییه، به هیوای بەردەوامیتان. فێستیفالی فیلمی نێودەولەتی سلێمانی خوشحال بوو به هاوکاری کردنی فێستیفالی فیلمی کوردی لەندەن و هاوبەشی کردن له بەرێوچوونی بەکەمین خولی فێستیفالی فیلمی کوردی جیهانی به شیوهی ئۆنلاین. ئەم فێستیفالە بەرھەمی ھەماھەنگی فێستیفالە کوردییەکان بوو له سەرئاسەری دنیا بۆیە کارێکی تەواو پرۆفیشنال و سەرکەوتوو بوو، بوو جێگای رەزامەندی بینەرانی و سەردانی کەسانی پلاتفۆرمەکە، گەشبینم بە داھاتووی ئەم فێستیفالە کە تەرخانکراوە بۆ فیلمی کوردی، بە ھەبوونی ستافیکی کارامە لە پشت ئەم کارەو بۆ بەردەوامی دان بەم پلاتفۆرمە و بەکارھێنانی بەمەبەستی پالێشتی کردنی فیلمی کوردی و پیشەسازی فیلمی کوردی بە رێگای جۆراوجۆر، دەبێتە ھۆی دروستکردنی کاریگەری نێرینی زۆر باش و بەردەوام، کە لەم بارەدا بەرێوچوونی فێستیفالەکە بە شیوهی ئۆنلاین یارمەتیدەر دەبێت و فێستیفالەکە بەر دەست دەبێت بۆ ھەموون لە گشت شوێن و کاتیکیدا.

## Festîvala Çand û Fîlmên Kurdî ya New Yorkê

Xeyal Qertel  
kurdishfestivalny@gmail.com

Sînemaya kurdî li seranserê cîhanê, kurdan dike yek; yekîtiya hestiyarî di mabeyna Festîvala Fîlmên Kurdî ya Global da veguhezî xebata kolektîf. Ev ji bo me hemûyan ceribandineke dewlemend û xwedî ezmûn bû. Em ê li ser projeyan bixebitin ku hevgirtina me bihêztir bike û da ev festîvala cîhanî xurttir bibe.



## Bilavkirina Fîlman ya Rêtaw

Zanyar Mihemmedînikû

Sînemaya Kurdîstanê; Sînemaya Serbixwe...

Dema em behsa sînemaya welatekî dikin bo mînak sînemaya Îtalya, sînemaya Japonya, sînemaya Firansa û hwd. em pergala û sistemeke sînemayî berçav digirin ku her sal bi dehan fîlm û rêzefîlm çê dibe ku tê da ziman, cilûberg, muzîk û çandêke wê kiyana siyasî ku wekî welatê destnîşan kirin, nîşan dide.

Li vir rastiyeke tal heye ku ji rûyê dîrokî û siyasî heta roja îro, welatek bi navê Kurdistanê ser negirtiye, çî bigîje wê hindê ku sînemayek bi navê "sînemaya Kurdistanê" bê dameziran-din ku her sal bi dehan fîlm û rêzefîlman çê bike, ev wê hindê nîşan dide ku nebûna welatê wekî kiyaneke siyasî dikare karîgeriyeke çiqas nerênî hebe.


Her bi vê sebebê gelek sînemakarên kurd çî li nav an deveyî Kurdistanê (ji rûyê erdnîgarî ve), bi şêweyeke serbixwe dixebitin û ev yek jî diyardeyeke neşîrîn lê derdikeve; bo nimûne wek xaleke nerênî, em gelek caran dibînin ku sînemakarên kurd ji ber ku xwe bide pêş û bêne nav cergeya sînemayê, xwe dêxine jêr pergala sînemaya yek ji wan çend welatên zordar yan bi şêweyeke din fîlmên dijî kurd çê dikin yan her nebe bi neçarî bo neteweyeke din û bi zimanê wan fîlman çê dikin.

Li aliyêke din jî sînema hogir û hevrêya herî nêzîk ya abûrê ye ku wek du hêlên jêkneveqetandî ne bi vê hindê ku eger abûr baş nebe hilweşîn û binketina sînemayê jî heye yanî heta asteke berçav serxwebûna sînemakarên kurd, guşar xistiye ser peykerê sînemaya Kurdistanê jî, îca êre da giringiya hebûna mêhrîcanên fîlmên kurdî gelek pêdiwî ye ku bi vê yekê, em dikarin pareke van zextan bêxine ser milên xwe û bi palpiştîkirin li sînemakarên kurd heta radeyekê wê pirsgerîkê lawaz bikin.

Reng e hijmara mêhrîcanên fîlmên kurdî gelek kêmbin lê dîsa jî dikarin karîgeriyeke erênî hebin û bi duruşmên baş û armancdar bibine sebebê civandina sînemakarên kurd ku dora hev kom bibin da ku ji bo peyîtandin û yekrêziya nav mala sînemaya kurdî roleke wan ya cemawerî hebe.

Ji aliyêke din jî dibê ku arşîveke kêrhatî ji fîlmên kurdî bête çêkirin daku di demeke guncaw da karên lêkolînî û xisarnasî li ser sînemaya Kurdistanê bêne kirin daku encamê xebata wan bigîje akamekê.

Li ser evqas mijar û babetên ku me bas kirî, her sal bi dehan fîlm û rêzefîlmên televîzyonî yê kurdî jî li Kurdistanê tên çêkirin, dibê ku gelek jî nebin lê dîsa jî dilxweşker in û em dikarin paşerojeke geş bo "sînemaya Kurdistanê" pêşbînî bikin.







# FESTIVAL






# FÎLMÊN FESTÎVALÊ










## FÎLMÊN KAZIM OZ










## FÎLMÊN YILMAZ GÜNEY



# FÎLMÊN KLASÎK












# FÎLMÊN NÛ




## BELGEFÎLM








## HONAKFÎLM



# KURTE BELGEFÎLM



# KURTE HONAKFÎLM



## FÎLMÊN NÛ

### Documentary

- 1-Bîr
- 2-Blue Girl
- 3-Casimê Celîl
- 4-Dialogue
- 5-Evîn bi Rûyê Qirkirinê
- 6-Her Mal Dibistanek
- 7-Nanê Pîroz
- 8-Sidiq û Piling
- 9-Terrorists

### Short Fiction

- 1-Beru
- 2-Decay
- 3-Dream in the Depths
- 4-Kerwan
- 5-Pirabok
- 6-Quarantine
- 7- Rotation
- 8-Şîn
- 9- Stain
- 10-Synthesis
- 11-The Kites
- 12-The Other
- 13-The Word's last
- 14-Xala Hevpar
- 15-Yadê
- 16-The Word's Last House

### Fiction

- 1-Di navberê da
- 2-Gold Runner
- 3-Hewno Bêreng
- 4-Momê
- 5-Sister Apart
- 6-Sister in Arms
- 7-Sacrifice
- 8-Passed By Censor
- 9-Believe

### Short Documentary

- 1-How Far is Home
- 2-HELL
- 3-Birîndar im
- 4- Massacre
- 5-Bavani
- 6-The Whimper and Existence
- 7-Sjaelsmark Camp Limbo for Refugees
- 8-Bu da mı gol değil
- 9-Sfumato

## BEST OF DIRECTOR

### Kazim Oz

- 1-Hebû Tunebû
- 2-Dûr
- 3-Zer
- 4-Bahoz

### Yilmaz Guney

- 1-Yol
- 2-Suru
- 3-Umut
- 4-Seyyîtxan

## FÎLMÊN KLASÎK

- 1-Hêvî
- 2-Were Dengê Min
- 3-Resitance is Life
- 4-Press
- 5-All My Mothers
- 6-Mandoo
- 7-The Guerilla Son
- 8-Mara
- 9-1001 Sêv
- 10-14 Tîrmeh
- 11-Ververoz
- 12-Min Dît
- 13-Der Imker
- 14-Klama Dayîka Min
- 15-Dayîka Berfo
- 16-Faîlî Dewlet
- 17-Nûjîn
- 18-Halabja
- 19-My Paradise
- 20-Meş

- 21-Traces: People of the Peacock
- 22-No Friends but the Montains
- 23-Return to Kirkuk: A Year in the Fire
- 24-Radio Kobane
- 25-Black Horse Memories
- 26-Wishper With The Wind
- 27-Leyla Zana
- 28-Forgetten Chords
- 29-Turbulence
- 30-Bakur
- 31-38
- 32-Rêç
- 33-Black Crow
- 34-Jani Gal
- 35-Zagros
- 36-Kick Off
- 37-Crossing The Dust
- 38-House Without Roof
- 39-Narcissus Blossom
- 40-A Time For Drunken Horses
- 41-Turtles Can Fly
- 42- The Word's Last House

# MEET OUR KURDISH FILM FESTIVAL PARTNERS

12 LKFF PRESENTS

**GLOBAL  
KURDISH  
FILM  
FESTIVAL**

16 - 27 APRIL 2021

ONLINE EDITION

SWIPE TO MEET OUR GLOBAL TEAM  
COLLABORATING UNDER ONE **UNITED** EDITION



12 LKFF PRESENTS  
**GLOBAL KURDISH FILM FESTIVAL**  
 16 - 27 APRIL 2021  
 ONLINE EDITION



 **SLEMANI**

The **Sleman International Film Festival** is one of the most prominent film festivals in the Middle East, held in the city of Slemani known as the capital of culture in Kurdistan. Consisting of International and Kurdish films, this festival usually takes place annually from 1-7 October annually since 2016. The 5th SIFF was sadly cancelled due to the global pandemic.

 **QAMISLO**

**Rojava International Film Festival** is held every year on November 13, in memory of the burning of the Amude cinema, causing the deaths of 298 children trapped inside. RIFF is organised by local film professionals and young volunteers who believe in the power of cinema and culture in rebuilding the Kurdish society. RIFF has achieved 4 editions so far.



**ROJAVA INTERNATIONAL FILM FESTIVAL**



12 LKFF PRESENTS  
**GLOBAL KURDISH FILM FESTIVAL**  
 16 - 27 APRIL 2021  
 ONLINE EDITION



 **MOSCOW**

**Moscow Kurdish Film Festival** will be hosting its first edition in the capital of Russia from 21-25 July 2021. MKFF aims to show films that reflect Kurdish culture and history, as well as the modern lives within the nation. MKFF promote the benefits of cultural exchange, mutual understanding between nations and cooperation between filmmakers from around the world.

 **LOS ANGELES**

The **Los Angeles Kurdish Film festival** is another newly established film festival preparing for its first edition. LAKFF aims to bring the stories from Kurdistan and Kurdish communities in the diaspora by creating more visibility and accessibility for Kurdish cinema in the Los Angeles film community in USA.



12 LKFF PRESENTS  
**GLOBAL  
 KURDISH  
 FILM  
 FESTIVAL**  
 16 - 27 APRIL 2021  
 ONLINE EDITION



 **NEW YORK**

Based in New York, the **NYKFCF** is an ever-growing film and cultural festival founded and directed by Xeyal Qertel. Established in 2017, this platform has achieved 4 editions so far with the aim to give a platform and voice to the forty million or so Kurds whose ancient cultural heritage is still not widely known.

 **HAMBURG**

**Hamburg Kurdish Film Festival** was first established in 2005 by a group of Kurdish and German friends who organised their first edition after the Turkish Embassy had openly urged all cinemas to ban any showcase of Kurdish films. The small but powerful HKFF persevered receiving the support of Kino 3001 who continuously hosted HKFF, with 11 successful editions so far.



12 LKFF PRESENTS  
**GLOBAL  
 KURDISH  
 FILM  
 FESTIVAL**  
 16 - 27 APRIL 2021  
 ONLINE EDITION



 **MUKIRYAN**

**Rêtaw Film Distribution** / Bilav Kariya Filman Ya Rêtaw / بِلَاوَكَارِي فِيلْمِي رِيَتَاو is a distribution group made up with a team from Bokan, Xanê (Pîranşar) and Şino. Their aim is to strengthen Kurdish cinema within Rojhilati Kurdistan (East Kurdistan) with a strong mission to distribute Kurdish films from all of Kurdistan and the diaspora to worldwide film festivals.

 **BARCELONA**

The **Barcelona Kurdish Film Festival** aims to ease the access to Kurdish stories and films created by Kurdish directors about Kurdistan, its people and their way of life. MCKB consider cinema as a powerful weapon that will shine a light on Kurdistan and its resistance against capitalism, globalization and fascism.



12 LKFF PRESENTS  
**GLOBAL  
KURDISH  
FILM  
FESTIVAL**  
16 - 27 APRIL 2021  
ONLINE EDITION



**MEZOPOTAMYA  
FİLM  
FESTİVALİ**



**ISTANBUL**

The **Mesopotamia Film Collective / Mezopotamya Film Festivali** is the proud organisers of the first-ever **Istanbul Kurdish Film Festival**, established recently in 2019. Faced with extreme difficulties, censorship and bans, this festival work hard to persevere. They aim to bring Kurdish films to the Kurdish audiences of Istanbul.



**AMED**

The **Middle East Cinema Academy** is a platform that serves as a film academy and agency, handling production and distribution. They are the proud organisers of the **Amed Kurdish Film Festival**, having just completed its 7th edition. Their aim is to highlight artistic independent films and provide educational tools to up-and-coming filmmakers.

**KOMALEYA AKADEMIYA  
SİNEMAYÊ YA ROJHILATA NAVÛN**

12 LKFF PRESENTS  
**GLOBAL  
KURDISH  
FILM  
FESTIVAL**  
16 - 27 APRIL 2021  
ONLINE EDITION



**LONDON  
KURDISH  
FILM  
FESTIVAL**



**LONDON**

Launched in 2001, the London Kurdish Film Festival (LKFF) is the biggest film festival of its kind, bringing together films from Kurdistan and the rest of the world to film audiences in London. LKFF is managed and produced by a team of volunteers, with 11 successful editions so far, each growing in magnitude and significance.

LKFF believe cinema is a powerful and influential form of artistic expression and one which carries great importance for Kurds, who have, like all oppressed nations, transformed cinema into a tool for emancipation and self-expression. LKFF provides a platform for Kurdish and non-Kurdish filmmakers to showcase films of any style, topic and genre that highlight the untold stories and experiences of the Kurdish people around the world.

*Komeleya Akademiya Sînemayê ya Rejhilata Navîn*

*Festîvala Filmên Kurdî ya Hamburgê*

*Festîvala Filmên Kurdî ya Los Angelesê*

*Festîvala Filmên Kurdî ya Moskovê*

*Mostra de Cinema Kurd de Barcelona*

*Festîvala Cand û Filmên Kurdî ya New Yorkê*

*Festîvala Filman ya Mezopotamyayê*


*Bilavkirina Filman ya Rêtaû*

*Festîvala Filmên Neveteweyî ya Rojavayê*








*Festîvala Filmên Neveteweyî ya Slêmanî*



# MASTERCLASSÊN FESTÎVALÊ



# BEŞA PIRS Û BERSIVAN



# PARTNERÎ, SPONSORÎ Û SPASDARÎ

## PARTNERÊN FESTÎVALÊ

THE NATIONAL LOTTERY-FAN

KURDISTAN REGIONAL GOVERNMENT

NAVENDA DEMOKRATIK A KURDÊN BRITANYAYÊ-NADEK

## SPONSORÊN FESTÎVALÊ

PIYA ACCOUNTANCY

FOOD ART

ORGANIC

BCC CAR LEASING

MIYA SOLICITORS

NICE ICE FACTORY

ALKO DESING AND BUILD LTD.

CAFÉ Z STOKEY

VILIAGE GROCER

KURDISH HOUSE LONDON

## SPASDARIYA FESTÎVALÊ

HALKEVI

RIO CINEMA



WINNER OF THE  
THIRD AUDIENCE  
CHOICE AWARD

## ALL MY MOTHERS

DIRECTED BY EBRAHIM SAEEDI & ZAHAWI SANJAWI

K  
GLOBAL  
HUMANISM  
& FILM FESTIVAL



WINNER OF THE  
BEST ACTOR AWARD

## FEREYDOON ANSARI

FOR THE ROLE IN THE WORLD'S LAST HOUSE

K  
GLOBAL  
HUMANISM  
& FILM FESTIVAL



JURY  
SPECIAL MENTION

## QUARANTINE

DIRECTED BY BYMOHAMMAD REZA ARDALAN

K  
GLOBAL  
HUMANISM  
& FILM FESTIVAL



WINNER OF THE  
BEST ACTRESS AWARD

## ARINA MIRZAI

FOR THE ROLE OF ROZHIN IN BELIEVE

K  
GLOBAL  
HUMANISM  
& FILM FESTIVAL




WINNER OF THE  
TAHA KARIMI BEST SHORT  
DOCUMENTARY FILM AWARD

## HELL

DIRECTED BY BORHAN AHMAEI

K  
GLOBAL  
HUMANISM  
& FILM FESTIVAL




WINNER OF THE  
LKFF HONORARY  
FILM AWARD

## THE BEEKEEPER

DIRECTED BY MANO KHALIL

K  
GLOBAL  
HUMANISM  
& FILM FESTIVAL



WINNER OF THE  
SECOND AUDIENCE  
CHOICE AWARD

## BAKUR

DIRECTED BY ÇAYAN DEMIREL & ERTUGRUL MAVIOGLU

K  
GLOBAL  
HUMANISM  
& FILM FESTIVAL



# AWARD CEREMONY



WINNER OF THE  
YILMAZ GUNEY  
BEST SHORT FICTION  
FILM AWARD

## THE OTHER

DIRECTED BY AKO ZANDKARIMI & SAMAN HOSSEINPOUR

K  
GLOBAL  
HUMANISM  
& FILM FESTIVAL



WINNER OF THE  
ROJA ZER  
BEST FEATURE FICTION  
FILM AWARD

## COLOURLESS DREAMS

DIRECTED BY MEHMET ALI KONAR

K  
GLOBAL  
HUMANISM  
& FILM FESTIVAL



WINNER OF THE  
MEHMET AKSOY  
BEST FEATURE DOCUMENTARY  
FILM AWARD

## HOLY BREAD

DIRECTED BY RAHIM ZABIHI

K  
GLOBAL  
HUMANISM  
& FILM FESTIVAL



JURY SPECIAL  
MENTION

## THE WHIMPER AND EXISTENCE

DIRECTED BY HOSSEIN ALLAHYARI

K  
GLOBAL  
HUMANISM  
& FILM FESTIVAL



JURY SPECIAL MENTION  
BEST ANIMATED FILM

## DREAMS IN THE DEPTHS

DIRECTED BY REZA MOHAMMADI

K  
GLOBAL  
HUMANISM  
& FILM FESTIVAL



WINNER OF THE  
LKFF SPECIAL MENTION  
MOST WATCHED FILM

## LOVE IN THE FACE OF GENOCIDE

DIRECTED BY ŞERO HINDÉ

K  
GLOBAL  
HUMANISM  
& FILM FESTIVAL



WINNER OF THE  
FIRST AUDIENCE  
CHOICE AWARD

## ZER

DIRECTED BY KAZIM ÖZ

K  
GLOBAL  
HUMANISM  
& FILM FESTIVAL

